## ABORÎ



### Li Diyarbekirê cotkariya pembû zêde dibe

**DEMA** meriv behsa cotkariyê dike cure cure mehsûl tên hişê meriv. Yek jî van mehsûlan pembû ye. Pembû di şert û mercên taybet de digihêje û ji loma tenê li hin bajaran tê avêtin û yek ji van bajaran Diyarbekir e. Cotkar dibêjin her ku diçe pembû li Diyarbekirê ji ber derfetên avdanî û makîneyên dûrîtinê zêde tê avêtin. **RÛPEL 09**


## KIRMANCKÎ



### Îslamîyet de Hişmendîya Sîyasetî

**ÇEKUYA** sîyasetî, çekuyêna erebkî ya û çekuya seyîsî ra virazeyaya. Manaya sîyasetî ya verên terbîyekerdişê estoran bo zî, manaya ci ya ke ewro ma zanê, hunerê dîzaynkerdişê karanê dewlet o. Çekuya hişmendî, zanayişê çîyê ke dormeyê kesî de benê, fehmkerdiş, ferqkerdiş û zanayişêno pêroyî îfade kena. **RÛPEL 10**

## EDEBIYAT



### Hevnasîna Kurdan û Sînemayê

**KURDÊN** ku li Mezopotamyayê li ser çiya dijîn kamera kengî nas kirin? Di kîjan kêliya dîrokê de Kurdan xwe di nav sînemayê de dîtin û bi sînemayê re ketin tekiliyê. Sînematografî di kîjan demê de û li kîjan devera Kurdistanê girtiye nava xwe? Kurdan sînema çawa nas kirin? **RÛPEL 13**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 39
23- 29 COTMEH 2017
www.basnews.com




‘QUDS’A KURDAN RADESTÎ DIJMIN KIRIN R2

# ÎXANETA MEZIN; KERKÛK HAT DAGIRKIRIN

**> BASKEKÎ YNKê KERKÛK RADESTÎ RÊXISTINA PARAMÎLÎTER KIR**

Roja 16ê Cotmehê Heşdî Şabî ku rêxistineke paramîlîter a Îranê ye û bi tawanên şer tê zanîn bi piştevaniya Îranê û Artêşa Îraqê êrişeke berfireh bir ser ‘Qûds’a Kurdan.  Pêşmergeyên Kurdistanê li hember her êriş û planan amade bûn û xelkê Kurdistanê jî ji bo piştevaniyê li qadan bûn. Lêbelê mixabin dîroka Kurdan careke din li xwe vegeriya û beşek ji berpirsên YNKê Kerkûka ku weke dilê Kurdistanê tê zanîn radestî Îranê kirin.

**> LI DÎROKA KURDISTANÊ RÛPELEKE REŞ A DIN ZÊDE BÛ**

Li dîroka Kurdistanê rûpeleke reş a din zêde bû. Axa Kurdistanê ku bihost bi bihost bi xwîna şehîdan hatibû avdan û rizgarkirin bi destê xayînan radestî dijmin hat kirin. Piştî ku beşeke ji serkirdeyên YNKê axa Kurdistanê ku bi xwîna şehîdan hatibû rizgarkirin firotin Îraq û Îranê, hêzên paramîlîter ên Îranî ku pêşengiya wan fermandarê Îranî Qasim Silêmanî dike ketin nav Kerkûkê û dest bi talankirin, şewitandin û teqandina mal, cih û warên Kurdan kirin.

İbrahim Varlı:

## Heşdî Şabî wê Tirkiye û Îranê bîne hemberî hev



R03

Nivîskarê polîtîkayên derve yê Rojnameya BirGünê İbrahim Varlı ji Heftenameya Basê re rûdanên vê dawiyê li Herêma Kurdistanê, dagirkirina Kerkûkê, nêzîkbûna Tirkiye-Îran- Îraqê nirxand. Varlı diyar dike ku Heşda Şabî dibe ku di navbera Îran û Tirkiyeyê de pirsgirêkan derxîne û wiha didomîne: “Eger Trump, Îranê tevlî Îraqê bike û berê wê bide Hewlêrê, dibe ku êrîşî Îranê bike. Eger wisa bibe dê DYA li Îranê bixe û tiştekî mezintir bide Hewlêrê.”



**EKREM ÖNEN** >04

Geopolîtîka: Çi projeyên veşartî li pişt bûyerên Kerkûkê hene?



**HOŞENG OSÊ** >03

Kerkûk û Facebook?



**FIRAT CEWERÎ** >07

Hêvî


ROJEV R04



### ‘Divê Kurd yekîtiya xwe xurt bikin, serkeftin a Kurdan e’

Milîsên Heşdî Şabî ku girêdayî Îranê ne û bi kiryarên xwe yên hov tên zanîn û artêşa Îraqê bi piştevaniya dewletên herêmî êrişî Kerkûk û deverên Kurdistanî yên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê kirin û ligel hevkariya beşeke ji YNKê, Kerkûk û ev dever hatin dagirkirin. Serokên partiyên Kurd ji Heftenameya Basê re axivîn.

CÎHAN R08



### Bi çekên DYA êrişî Kurdan kirin

Haşdî Şabî ku li herêmê weke DAIŞ a Şîe tê qebûlkirin dema êrîşî Kerkûkê kir trimbêlên leşkerî yên DYAyê, tankên Abrams û Humveesan bikaranîn. Wezareta Pêşmerge jî di derbarê mijarê de daxûyaniyeke nivîskî belav kir û got, DYA ev çek ji bo di şerê li hember DAIŞê de bê bikaranîn dabûn Îraqê lê niha ev çek ji bo êrîşa li hember Pêşmerge tên bikaranîn.

ROJHILAT R05



### “Em ê heta dawîn welatê xwe biparêzin”

Rojnameger û Endamê Polîtbûroya Partiya Demokrata Kurdistana Îranê (PDKÎ) Selîm Zencîrî li ser kiryar û tevgera çekdarên girêdayî Îranê li axa Kurdistanê û egera êrişa li ser partiyên Rojhilat û helwesta PDKÎyê ji Heftenameya Basê re axivî. Zencîrî dibêje ew ê heta dawîn Kurdistanê biparêzin.

# Kerkûk di encama îxaneteke mezin de hat dagirkirin

■ MURAT ÖZDEMIR

Li dîroka Kurdistanê rûpeleke reş a din zêde bû. Axa Kurdistanê ku bihost bi bihost bi xwîna şehîdan hatibû avdan û rizgarkirin bi destê xayînan radestî dijmin hat kirin. Miletê Kurd û welatê wan Kurdistan ku ji aliyê çar dewlet û hevkarên wan ên navdewletî ve hatiye dagirkirin bi sedsalan e li ber xwe dide û tu carî serî li ber dijmin netewandiye. Lêbelê xayiniya hin kes, kom û partiyan her tim pişta Kurdan şikandiye û temenê dagirkeran li ser axa Kurdistanê dirêj kiriye. Dema ku li dîroka Kurdistanê tê nêrîn ev rastî bi zelalî tê dîtin. Li Başûrê Kurdistanê ku xwedî rêveberî, hikûmet, parlamento, dîplomasî û siyaseteke xurt e, ev heyameke dirêj e ji bo xeyala sedsalî û rûmet û serbilindiya miletê Kurd, serxwebûn rojeva sereke bû. Lêbelê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û miletê Kurd ji bo diyarkirina çarenivîsa xwe banga riyên aştiyane kirin û di vê çarçoveyê de roja 25 Îlonê ji bo serxwebûnê referandûm pêk hat û miletê Kurd ji hemû cîhanê re eşkere kir ku ew serxwebûnê dixwazin. Helbet riya diçe bo serxwebûnê ne hêsan bû. Ji xwe bi dîtina rijdbûna Kurdan û pêkanîna referandûmê dagirkerên Kurdistanê ketin nav hewldanan û dîplomasiya dijminatiya Kurd û Kurdistanê dîsa bi awayekî xurt xwe da der. Helbet çi tirsa Pêşmergeyên Kurdistanê û serokatiya Kurdistanê ji dagirkeran nebû ji xwe eger tirseke wiha li holê hebûya referandûm pêk nedihat. Lêbelê tiştek kêm hatibû hesabkirin an jî îxtîmal pê nehatibû dayîn; 'Îxanet, bêbextî, xayînî...'

**Îxanetê rê da dagirkeran**

Hikûmeta Îraqê ku di bin hûkmê Îranê de ye û mîlîsên bi navê Heşdî Şabî ku bi awayekî yekser û zelal bi Îranê ve girêdayî ne û ji hêzên Îranî yên li herêmê ye, bi encamdana referandûma serxwebûnê ji bilî ambargoyê li dijî Herêma Kurdistanê ketin nav hewldaneke leşkerî. Lêbelê wan jî dizanî ku Pêşmergeyên qehreman ku rêxistineke mîna DAIŞê têk birine û bi xwîna xwe axa xwe parastine rê nadin wan ku metroyekê jî bikevin nav xaka bav û kalan. Ji ber wê yekê ev hêzên paramîlîter li hin aliyan geriyan ku xiyanet û bêbextiyê li welat û gelê xwe bikin.

Di vê çarçoveyê de roja 16ê Cotmehê Heşdî Şabî ku rêxistineke paramîlîter a Îranê ye û bi tawanên şer tê zanîn bi piştevaniya Îranê û Artêşa Îraqê êrîşeke berfireh bir ser 'Qûds'a Kurdan. Pêşmergeyên Kurdistanê li hember her êrîş û planan amade bûn û xelkê Kurdistanê jî ji bo piştevaniyê li qadan bûn. Lêbelê mixabin dîroka Kurdan careke din li xwe vegeriya û beşek ji serkirdeyên YNKê li gel fermandarê Îranî Qasim Silêmanî li ser dagirkirina Kerkûkê bûn. Lêbelê wan ji destê Kurdan..., li ser dagirkirina... 

Îxanetê rê da... 

Hikûmeta...

**Îxaneta berbirsên YNK û firotina Kerkûkê**

Berî êrîşa hêzên girêdayî Îranê û artêşa Îraqê 15ê Cotmehê PDK û YNK li gel hev civiyan û ji bo parastina Kerkûkê li hev kirin. Lêbelê piştî civîna herdu aliyan beşek ji YNKê bi planeke qirêj û mezin li gel Fermandarê Îranî civiyan. Di vê civînê de ku serkêşiya wê Kurê Celal Talebanî yê mezin Bavil Talebanî, diya wî Hêro Îbrahîm Ehmed, Cîgirê Îstîxbarata YNKê Lahor Şêx Cengî, Endamê Polîtbûroya YNKê Aso Mamend, Endama parlamentoyê ya fraksiyona YNKê Ala Talebanî dikirin ji bo radestkirina Kerkûk û deverên din ên Kurdistanî li hev kirin. Dema ku êrîşa Heşdî Şabî dest pê kir beşeke Pêşmergeyên Kurdistanê demeke dirêj li ber xwe dan, lêbelê ew kesên navborî û hêzên girêdayî wan rê dan ku hêzên Îranî û Îraqî bikevin Kerkûkê û bajêr dagir bikin. Piştî ku hat dîtin Kurdistan bi talûkeke mezin re rû bi rû ye û armanc ew e ku him birakûjiyê bixin navbera Kurdan û him jî seranserê Herêma Kurdistanê bikin qada şer, hêzên pêşmergeyên Kurdistanê peş ve vekişiyan deverên ku berî operasyona Mûsilê li ser rêkeftinekî hatibû kirin û li vê derê xeteke bihêz avakirin.

**Dema ku di destê Kurdan de bû pêkvejiyan hebû**

Piştî ku beşeke ji serkirdeyên YNKê îxanet û bêbextiyeke mezin li birayên xwe, welatê û şehîdên Kurdistanê kirin, hêzên paramîlîter ên Îranî ku pêşengiya wan fermandarê Îranî Qasim Silêmanî dike ketin nav Kerkûkê û dest bi talankirin, şewitandin û teqandina mal, cih û warên Kurdan kirin. Li Kerkûka dilê Kurdistanê di wê heyama ku di destê Pêşmerge de bû aramî û pêkvejiyaneke mezin hebû. Hemû pêkhateyên bajêr bi hev re di nava aşitiyê de dijiyan û di nav ewlehiyê de bûn. Lêbelê piştî ku di encama îxaneteke mezin de ku li dîrok û eniya wan kesan cihê xwe girt, bi deh hezaran Kurdan her tiştê xwe bicî hiştin û xwe gihandin Hewlêr û deverên din ên Kurdistanê. Li bajêr ji destdirêjiyê heta dizî û talankirinê çekdarê Heşdî Şabî ketin nav kiryarên rûreş. Jibilî Kerkûkê deverên din ên Kurdistanê ku weke deverên 'nakok' tên zanîn û deverên Kurdistanî ne, ji aliyê beşeke YNKê ve radestî Heşdî Şabî hatin kirin. Nemaze jî li Xaneqînê çekdarên Heşdî Şabî zilm û zordariyeke mezin bi ser Kurdan de anî, mal û dikanên Kurdan hatin şewitandin û Kurd hatin koçkirin.



Wan jî dizanî ku Pêşmergeyên qehreman ku rêxistineke mîna DAIŞê têk birine û bi xwîna xwe axa xwe parastine rê nadin wan ku metroyekê jî bikevin nav xaka bav û kalan. Ji ber wê yekê ev hêzên paramîlîter li hin aliyan geriyan ku xiyanet û bêbextiyê li welat û gelê xwe bikin.

**"Baskekî YNKê nebûya me nedikarîn bikevin Kerkûkê"**

Piştî ku Kerkûk bi hevkariya baskekî YNKê ji aliyê hêzên Îraqî û Îranî ve hat dagirkirin, serkerdeyên Heşdî Şabî û berpirsên Îraqî destxweşî û spasî li wan kesên ku li xelk û welatê xwe xayînbûn kirin. Herwiha jibilî wê yekê Serokwezîrê Berê yê Îraqê Nûrî Malîkî ku bi neyartiya xwe ya li dijî Kurdistanê tê nasîn, bi zelalî eşkere kir ku eger alîkariya baskekî YNKê nebûya wan nedikarin bikevin Kerkûkê. Malîkî ji medya Îraqî re wiha got: "Eger hevkariya aliyekî YNKê, Qasim Silêmanî û Îranê nebûya me qet nedikarîn bikevin Kerkûkê. Têkiliya di navbera YNK û Îranê de xwedî raboriyeke kevn e. Eger alîkariya YNKê û hevkariya Qasim Silêmanî nebûya me qet nedikarîn bikevin Kerkûkê û rewş wiha nedibû."

**"Kerkûk hat firotin belge di destê me de ne"**

Parlamenterê Kurd û Endamê Ewlekarî û Berevaniyê yê Parlamentoya Iraqê Şaxewan Ebdullah li ser dagirkirina Kerkûkê û îxaneta aliyekî YNKê axivî. Şaxewan Ebdullah eşkere kir ku hin berpirsên YNKê li hember petrolê, Kerkûk firotin û belge jî di destê wan de hene. Ebdullah wiha got; "Serok Barzanî, Kosret Resûl û Cefer Şêx Mistefa ji parastina Kerkûkê şêwirîn û xeteke berevaniyê danîn. Piştî ku Heşdî Şabî nikarî vê xetê derbas bike, Fermandarê Supaya Qudsê ya Îranê Qasim Silêmanî 48 demjimêr mawe da YNKê ku rêyeke nû ji bo wan vekin da ku Heşdî Şebî bikeve nava Kerkûkê. Amerîkayê gotibû kîjan alî dest bi şer bike em ê lê bidin. Ji lewre nedikarîn bi şer bikevin nava Kerkûkê. Jixwe hatin xwe ceribandin û pêşmerge nehişt bikevin Kerkûkê. Lewma hêzên Fewca 2 û 3 ya ser bi Bavil Talebenî û Lahûr Şêx Cengî ji eniya Til Werd re rêyek ji bo Heşdî Şebî vekirin û ew anîn nava Kerkûkê. Dagirkirina Kerkûkê di encama plangeriyeke mezin de pêk hat."

**"Ji bo berjewendiyên şexsî bûn hevkarên dagirkeran"**

Cîgirê Yekemîn ê Yekîtiya Nîştîmaniya Kurdistanê (YNK) Kosret Resûl jî li ser dagirkirina Kerkûkê daxuyaniyek belav kir û wiha got: "Rûdanên Kerkûkê encamên lîstikeke navdewletî bûn, lê ya birîna me xedar dike ew e ku çend kesekî ji derveyî rêbaza YNKê bêyî ji serkirdetiya partiya xwe bipirsin, ji bo hinek destkeftiyên xwe yên demkî û şexsî bûne hevkar û desteberê dagirkeran. Wan bi vê karê xwe yê rûreşî, bi sernizmî xwe xistine nava rûpelên reş ên dîroka gelê me. Şikest mezin e û berpirsiyariya wê dikeve ser milê hin korfêmên nav YNKê lê ev yek ne dawiya rê ye û hemû tişt bidawî nebûye. Bicîh hiştina gelê me bi tenê li hember êrîşên mîlîsên Heşdî Şebî û Artêşa Îraqê, bûyerên li Kerkûk û navçeyên din, komkujiya li hember hemwelatiyên Kurd li navçeya Xurmatû û cihên din, şewitandina malên wan, talankirina serwet û samanên wan, destpêkirina Enfaleke nû ye."

**"Her sê welat li ser Kerkûkê rêkeftin"**

Berdevkê Yekîtiya Nîştîmaniya Kurdistanê (YNK) Sedî Ehmed Pîre li Hewlêrê di civîneke çapemeniyê de axivî. Pîre got, hikûmeta Îraqê û dewletên herêmî daxwaza radestkirina Kerkûk, navçeyên nakok û bîrên petrolê kirine û got: "Hikûmeta Îraqê 48 demjimêr dem da û daxwaza vekişandina pêşmerge kir. Serokkomarê Îraqê Fûad Mehsûm hat û di civîna Dokanê de ev yek hate gotûbêjkirin. Paşê bi hêzeke mezin ve hatin ser Kerkûkê. Diyar e hinek biraderên nav YNKê nexwestin Kerkûk jî mîna Mûsilê, Reqa û Helebê wêran bibe. Ji bo mirovên mezlûm nemirin rêkeftineke meydanî kirine. Ma peywendiyên kîjan partiyê Kurdistanê li gel Serdar Qasim Silêmanî nîne? Kes heye wî nas neke? Îran, Îraq û Tirkiye bi hevre li ser Kerkûkê rêkeftin. Nûnerê Îranê di wê komîsyona sê alî de Qasim Silêmanî ye. Nûnerê Îraqê general Falih Feyaz û nûnerê Tirkiyê jî kesekî din bû, ku dibe ji aliyê Hakan Fîdan ve hatibe destnîşankirin. Eger me li gel wan bişêwiriya û neşêwiriya jî wan biryar dabûn van navçeyan bigirin. Biryar dabûn hemû bîrên petrolê kontrol bikin. Hinek berpirsên meydanî nedikariyan pêşiya hatina vê hêzê bigirin. Lê diviya hinek agahdariyên zêdetir bidana hemû aliyan."

Berdevkê YNKê eşkere kir ku derbarê rewşa Kerkûkê de agahî nedane Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û Kosret Resûl lewre giliyên wan rast in diviyabû di derbarê rêkeftina Kerkûkê de ew bihatana agahdarkirin.

**"Ez YNKê terk dikim"**

Berpirsê Desteya Kargeriya Polîtboruya YNKê Mela Bextiyar jî li ser rûdanên Kerkûkê daxuyaniyeke nivîskî belav kir. Bextiyar ragihand: "Ez YNKê terk dikim bo kesên herz û pûçên di nava YNKê de û beşdariyê di tu civînan de nakim heta ku rewatî venegere bo nav YNKê. Rewşa Kurdistanê gihîştiye qonaxeke hestiyar û metirsiyeke mezin li ser Herêma Kurdistanê heye. Du îdareyî û cudabûna nava YNKê, yan cudabûna nava YNKê û du îdareyî di wê rewşa niha ya piştî karesata Kerkûkê, pêwendiyeke tund bi hev re hene. Nabe ti kesek û ti malbatek bikare li cihê organ û rêkxistinên YNKê biryarê bide."

**"Bavil û Hêro Ehmed li gel Qasim Silêmanî rêkeftin"**

Parêzgarê Kerkûkê Necmedîn Kerîm jî ragiand ku beriya 16ê Cotmehê Bavil Talebanî û Qasim Silêmanî di derbarê hemû tiştekî de li hev kiribûn. Kerîm di axaftina xwe ya li gel ajansa Blombergê re got: "Roja 15ê Cotmehê Qasim Silêmanî li gel Hêro Îbrahîm Ehmed û biraziyên Celal Talebanî rêkeftinek pêkanîn"

Derbarê vê yekê de Necmedîn Kerîm dibêje: "Rêkeftin kiribûn ku dema hêzên Îraqî bêne nav Kerkûkê fermandarên pêşmerge tevlî şer nebin. Rojek beriya êrîşê Bavil Talebanî kurê mezin ê Celal Talebanî û herdu biraziyên Talebanî, Lahûr û Aras Şêx Cengî hatin Kerkûkê, li gel Qasim Silêmanî civiyan û li ser radestkirina bajêr li hev kirin. Hinek pêşmergeyan şer kirin. Lê paşve vekişandina yekîneyên sereke hişt ku Artêşa Îraqê û Heşdî Şabî bi hêsanî bikeve Kerkûkê. Mîlîsên şie bi ser taxên Kurdan de girtine û zilmê li xelkê sivîl dikin, ji ber vê yekê jî bi hezaran kes li bajêr bicîh hiştine." Kerîm herwiha diyar kir, rojek wê were ku ew ê vegere Kerkûkê.

**Divê Bexda mûçeyên Bavil û Lahûr bide**

Şandeyeke Yekîtiya Nîştîmaniya Kurdistanê (YNK) bi serokatiya Ala Talebanî piştî dagirkirina Kerkûkê 19ê Cotmehê serdana bajarê Necefa Îraqê kirin li gel berpirsê grûba Esaîbî Ehlê Heq ê Heşda Şeibî Qeys Xezelî hevdîtinek pêk anîn. Dagirkirina Kerkûkê mijara civîna herdu aliyan bû.

Berpirsê grûba Esaîbî Ehlê Heq ê Heşda Şeibî Qeys Xezelî bi dijayetiya xwe ya li dijî Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî û miletê Kurd tê nasîn. Xezelî di vê civînê de ji Bexdayê daxwaza piştgiriya wan kesên ku Kerkûk firotine wan kir. Herwiha daxwaz ji Ebadî jî kir ku mûçeyên van kesan û hêzên wan bide.

**"Divê ew kes bên dadgehkirin"**

Serokê Encûmena Parêzgeha Kerkûkê Rêbuwar Talebanî li Hewlêrê di civîneke çapemeniyê de axivî. Rêbûwar Talebanî diyar kir ku pêwîst e ew kesên li gel dijmin li hev kirin û bajar radestî wan kirin bên pêşberî dadgehê. Herwiha got: "Mixabin di nav bajarê Kerkûkê de malên xelkê hatin şewitandin. Ev êrîş malbat, binemale û civaka Kerkûkê aloz kir û di xelkê de tirs pêkaniye. Ez serokê encûmena parêzgeha Kerkûkê me, daxwaza vegerê li min dikin lê mala min ji aliyê Heşdî Şabî ve hatiye dagirkirin. Hemû pêkhateyên netewî li Kerkûkê red kirine ku Dr. Necmedîn Kerîm ji erkê parêzgariyê bê dûrxistin. Pêngavên hikûmeta Îraqê yên dijî bajarê Kerkûkê ne destûrî ne. Encûmen xwedî desthilata herî mezin ê Kerkûkê ye, biryara referandûmê û bilindkirina Ala Kurdistanê bi biryara wê encûmenê hatin girtin û tu hêzeke din xwedî desthilata hilweşandina wê biryarê nîne."

**"Bexda nikare Kosret Resûl bigire"**

Encûmena Bilind a Dadwerî ya Îraqê, di derbarê Cîgirê Yekemîn ê Sekreterê Giştî yê YNKê û Cîgirê Serokê Herêma Kurdistanê Kosret Resûl de, biryara girtinê da. Dadgeha Îraqî gotinên Resûl ên di derbarê dagirkeran de weke hincet bo xwe digire. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî li ser vê mijarê ragihand ku desthilatdariya Bexdayê çi biryarê dide bila bide lê nikare kesekî weke Cîgirê Giştî yê Sekreterê Yekîtiya YNKê Kosret Resûl bigire.



**Karîkator — Dijwar Ibrahim**




## Rêkeftina îxanetê ji van xalan pêk tê

Hat zanîn ku di civîna di navbera Bavil Talebanî, serokê Tugayên Bedîr ku girêdayî Heşdî Şabî ye Hadî Amîrî, Heyder Ebadî û fermandarê Hêza Qûds a Îranê Qasim Silêmanî, li ser hin xalan rêkeftinek pêk hatiye.

Di vê civîna ku di encamê de Kerkûk hat dagirkirin, li ser van xalan rêkeftin pêk hatiye;

- Kerkûk wê ji aliyê rêveberiyeke hevbeş ve were îdarekirin. 15 tax ji aliyê Kurdan, 25 tax ji aliyê pêkhateyên din ve.
- Balafirgeha Kerkûkê, bîrên petrolê û deverên stratejîk wê ji aliyê Îraqê ve werin kontrolkirin.
- Balafirgeha Silêmaniyê wê were vekirin.
- Mûçeyên berpirs û karmendên Silêmaniyê û Kerkûkê wê ji aliyê Bexdayê ve were dayîn.
- Mûçeyên hêzên girêdayî Bavil wê were dayîn. Avakirina herêmên Silêmaniyê - Kerkûk - Helebceyê.
- Pêkanîna hikûmeteke nû bo van herêman.

Ev peyman ji aliyê Bavel Talebanî û Hadî Amîrî ve hat îmzekirin. Di encama vê peymanê de hêzên ser bi Lahûr Şêx Cengî û Bavil Talebanî bêyî ku şer bikin Kerkûk radestî Heşdî Şebî kirin û îxaneteke mezin li miletê Kurd û Kurdistanê kirin.

# Heşdî Şabî wê Tirkiye û Îranê bîne hemberî hev

■ **CESIM İLHAN**

Nivîskarê polîtîkayên derve yê Rojnameya BirGünê İbrahim Varlı ji Heftenameya Basê re rûdanên vê dawiyê li Herêma Kurdistanê, êrîşa Kerkûkê, nêzîkbûna Tirkiye-Îran-Îraqê nirxand. Varlı diyar dike ku Heşda Şabî dibe ku di navbera Îran û Tirkiyeyê de pirsgirêkan derxîne û wiha didomîne: “Eger Trump, Îranê tevlî Îraqê bike û berê wê bide Hewlêrê, dibe ku êrîşî Îranê bike. Eger wisa bibe dê DYA li Îranê bixe û tiştekî mezintir bide Hewlêrê.”

Piştî referandûmê herêmên di bin nakokiyê de rastî êrîşa Heşda Şebî hatin ku bi piştgiriya Îran û Îraqê tevdigere. Te di nivîsên xwe de ev tişt ji berê de jî nivîsandibûn.

Bi rastî proseyê xwe dabû dest ku dê ev tişt rû bidin. DYA ku têkiliyên wê li gel Kurdan baş bûn jî di nav de hêzên gerdûnî û welatên cîran daxwaza qet nebe paşxistinê kiribûn. Di nameya ku wezîrê derve yê DYAyê ji Barzanî re şand de tiştên maqûl hebûn. Bi taybetî jî li Kerkûk û herêmên nakokî, îstîkrar pêk nehatibû. Hikûmeta Îraqê jî digot: “Binêre min Amerîka daye pey xwe ez wan deveran ji te re nahêlim.” Beriya referandûmê ev hişyarî hatin paşguhkirin, di encamê de referandûm pêkhat û pişt re jî Artêşa Îraqê êrîş bir ser Kerkûkê. Ne tenê Kerkûk, heta Şingalê ku herêmên nakokî hebûn ketin bin serweriya Hikûmeta Îraqê. Ji bo dîtina vê, hewce nake mirov pirsbor be. Ji ber ku Tirkiye–Îran û Îraqê çembereke sêalî ava kiribûn. Rojava jî li hember vê tifaqê bê deng ma. Welatekî weke Almanya jî digot referandûmê niha pêk neynin û paş ve bixin. Hikûmeta Kurdistanê ev yek baş nedît. Halbûkî erdnîgariya ku em qala wê dikin Rojhilata Navîn e. Her wext her tişt rû dide û her wext her tişt tê firotin. Di vî erdnîgariyê de di rojekê de tifaq tên kirin. Herêma Kurdistanê hesab dikir ku wê aloziyek derkeve lê pê dernexist wê ewçend mezin be.

**Serok Barzanî çima paşve venekişî?**

DAIŞ têk diçe, li herêmê nexşeyeke din ava dibe, atmosfera li herêmê û ya cîhanê li gel Kurdan e, sempatî ji Kurdan re heye. Bi taybetî jî di şerê li hember DAIŞê de pir derketin pêş. Barzanî jî xwest ku ji rewşa ku li herêmê heye feyde bistîne. Li aliyê din jî bêyî yekgirtina navxweyî pêk bîne referandûm pêkanî.

**Xala sereke ya şikestinê çi bû?**

Xala sereke ya şikestinê ji soza xwe vegera DYA û Rojava ye. Ji ber ku wan got ku: “Referandûmê niha pêk neyîne, paş bixe.” Barzanî guh neda wan, ew jî li hember operasyona Kerkûkê bê deng man. Heta DYA destûr neda ne pêkan bû artêşa Îraqê êrîşî Kurdan bikira. Ji ber ku Îraq DYA bixwe ye. Hikûmeta Bexdayê bi DYAyê re li hev kir û got, “Em ê operasyoneke biçûk bikin û herêmên nakokî bistînin.” Ibadî got: “Ez di biharê de diçim hilbijartinan. Ne wisa be wê nifûsa Îranê zêdetir bibe.” DYA jî ji bo ku Ibadî li hember Îranê winda neke xwest wî bikişîne gel xwe. Xala şikestinê jî nestandina Herêma Kurdistanê ya piştgiriya rojava ye.

**Lê belê Îran li hember DYAyê jî li herêmê bihêz dibe...**

Her kesek vê operasyonê li ser Îranê dinirxîne, lê di rastiyê de divê mirov di ser DYAyê de binirxîne. Em Îranê li ser Heşda Şabî dinirxînin, dibe ku têkiliya wan hebe, hêza Îranê li ser wan zaf e, lê Heşda Şabî di rastiyê de hêza leşkerî ya Îraqê ye. Ji xwe DYA û Îran li Îraqê şerekî mezin ji bo deshilatdariya xwe didin. Îran li hember DYAyê li Îraqê xwedî hêzekê ye. Du rê li ber DYA hene. An wê Îraqê bi tevahî bide Îranê an jî wê Îranê ji tevahiya Îraqê derxîne. Ibadî weke Malikî ne angajeyî Îranê ye. Îraq ne Îran e. Bi operasyona Kerkûkê Ibadî hilbijartinên meha Adarê misoger kir.

**Piştî êrîşa Kerkûkê, dibêjin “Amerîka wê li ser Heşda Şabî re li Îranê bide” Gelo DYA dixwaze Îranê bixe kemînê?**

Ew hate bîra min jî. Ji ber ku Trump tim dibêje ez ê li Îranê bixim û dixwaze wî welatî bixe quncik. Gelo DYA dixwaze Îranê di ser Heşdî Şabî de bikişîne nav faqeke wisa? Ev jî tê bîra mirov. Lê belê Îran jî ewçend ne kor e ku vê yekê nebîne. Dikare vê gavê bibîne. Xwendina mijara Kerkûkê tenê li ser Qasim Suleymanî xelet e. Suleymanî li Sûriyeyê jî heye. Îran dizane ku wê Trump lê bixe li Sûriyeyê û Îraqê ji belayên wisa direve. DYA ji bo Kerkûkê êrîşî Îranê nake. Wê Îranê bikişîne nav mijarên mezintir. Dibe ku wisa bibe: “Piştevaniya Saddam kirin berê wî dan Quweytê, paşê Îraq jî jê standin. Dibe ku Trump, Îranê tevlî Îraqê bike û berê wê bide Hewlêrê, dibe ku êrîşî Îranê bike. Eger wisa bibe dê DYA li Îranê bixe û tiştekî mezintir bide Hewlêrê.”

**Nêrîna Kurdan di derheqê Serok Barzanî de pêşiya operasyona Kerkûkê û piştî wê cuda ye...**

Niha di nav Kurdan de aciziyek li hember Barzanî heye lê ev hêrs wê raweste. Dema Kurd bibînin ku Tirkiye, Îran, Îraq û Rojava li hember Barzanî xeletî kirine wê dîsa xwedî lê derkevin bi ya min.

**Lihevkirina YNKê bi Îranê re û vekirina rê ji bo hatina Kerkûkê wê bibe sedema şerê navxweyî di nav Kurdan de?**

Belê! Niha di navbera Barzaniyan û Talebaniyan de şerek heye. Ev şer ne fizîkî be jî siyasî ye û bi gotinan dest pê kiriye. Ev şer di heman demê de wê yekîtiya netewî ya Kurdan jî têk bibe.





Kerkûka ku Ereb, Tirkmen û gelên din ên cîhanê tê de dijîn, warê Kurdan e. Kerkûk beşek ji erdê Kurdistanê ye. Kurd dikarin Kerkûkê dîsa bistînin.

## Bi ya te, pêvajoyeke çawa li benda Kurdan e?

Gengaz e ku di nav sînorê xwe yê bingehîn de yê berî niha 4-5 salan de bimînin. Yanî wê di nav sînorê xwe yê berî DAÎŞ hatî de jiyana xwe bikin. Ku petrola Kerkûkê û ya çend cihên din jî dest wan derkeve, ew ê bi awayê aboriyê bandorê li wan bike. Dê hêjarî çêbibe. Ku Îran jî sînorê xwe bigire, rojên zehmet li benda Kurdan e. Dibe ku ev bibe sedema pirsgirêkan di navbera Kurdan de. Ji ber bûyerên dawî, Desthilatdariya Navendî ya Îraqê destkeftî derket. Him ax bi bidest xist, him jî petrol. Bi awayê siyasî jî bihêztir bû. Wekî din, ji ber ku têgihaneke wek ti lîstikên ku Îran nexwaze li rojhelata navîn nameşe ava bûye, Îran jî bi ser dikeve. Her çiqas gelekî tevlî nebûbe jî, Tirkiyeyê jî digot “Em serxwebûnê ji we re nakine yar” û talî gotina wan pêk hat. Hêvî dikim ku bûyerên Kerkûkê bibin sedema xurttirkirina avakirina artêşeke neteweyî. Êrîşa Kerkûkê nîşan kir ku ji Kurdan re artêşeke birêkûpêk şert e.

**Ev bûyerên dawî wê di navbera Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê de bibin sedema pêşveçûneke çawa?**

Li Tirkiyeyê dê di 2019an de giştpirsî çêbibe. Erdogan dê li ser neteweperestiyê misêwa pelika xwe ya Kurd bilîze. Dê deriyê sînoran bigire û bibêje “Binêrin, ez Kurdan ceza dikim” ji bo ku dengê neteweperestan bistîne.

**Ji ber Kerkûkê, wê di navbera Tirkiye û Îranê de pirsgirêk derkevin?**

Dê derkevin. Ji niha ve nîşanên wê xuya dikin. Wa ye dibêjin “Heşdî Şabî hat; Erebên sunne û Tirkmenan dixeniqînin”. Li wê derê ji ber inyatkirineke herî biçûk jî wê di nav tirkmenên sunne û şîîyan de pirsgirêk derkevin, wê Tirkiye jî Îran jî tevlî bibe. Tirkiye li wir li ser Tirkmenên sunne û Erebên sunne polîtîkayan dike, Îran jî li ser Tirkmenên şiî û Ereb polîtîkayan dimeşîne. Tişta ku em dizanin, bo demeke dirêj aramî wê neye van deran.

**Piştî giştpirsiyê Îraq, Tirkiye û Îran bûne yek. Piştî mijara Kerkûkê ev tifaq dê bidome?**

Dê ji bo demekê bidome. Lê ew ê ne gelekî aramîdar be. Ji ber ku li gorî herêmê, Îran û Tirkiye du welatên li hemberî hev in. Him siyasî, him mezhebî û him jî bi awayê çandê; ne ew welat in ku werin ba hev. Bi têketina Heşdî Şabî ya Kerkûkê re, di nav hêla desthilatdariyê de gengêşiyên wek “Gelo Kurdên sunne an Haşdî Şabiyên şiî? Me piştgirî da yên ku berra Kurdan dan û me ji wan re çepikan xist, cîranekî Kurd baştir e an tevgereke şiî ku hemberî me yê berê ye?” derketin. Nivîskar û xêzkarên desthilatdariyê, aqilmendên wan di nav xwe de nîqaşa vê dikin. Ji ber vê yekê, siberojekê Heşdî Şabî yê ji bo sînorê başûrê Tirkiyeyê bibe sedemeke gefê. Ev ê jî bike ku pirsgirêk di navbera her du welatan de derkeve. Her du welat di derbarê mijara Sûriyê de li du hêlên cûda cih digirin.

**Sedema bingehîn a ku van her du welatên hemberî hev ên berê tîne cem hev, tenê Kurd in?**

Sûrî, Îraq, Îran û Tirkiye hemberê Kurdan ên berê ne. Ev welat tu carî nayin ba hev, tenê ko mijar bû Kurd, li hev dicivin. Li hincetan digerin ku bi hev re şer bikin. Û ev ê her wiha be. Di demeke nêz de Tirkiye û Îran dê dîsa li hemberî hev rawestin.

**Hewlêrê bi awayekî erênî li banga axaftinê ya Bexdayê nihêrî. Li vir dê xwestekên kê pêk werin?**

Vêga, piştî giştpirsiyê destê Kurdan li ser masê xurttir bû. Lê piştî êrîşa Kerkûkê pêşwendî kete destê Îraqê. Rêvebiriya Bexdayê wê li ser masê xurttir rûne. Lê ev naye wê wateyê ku Kurdan her tiştên xwe winda kirine. Helbet daxwaza Kurdan a serbixwebûnê dê her di berîka wan de bimîne, û ev ji Kurdan re hê jî pêşwendiyek e.

**Li gorî nêrîna te, piştî niha wê çi were axaftin?**

Dibe ku Putîn, bi alîkariya hêzên global û bi teşwîqa wan, ji bo axaftina avayiya konfederatîf a di navbera Kurdan û Îraqê de, bikeve navbera wan.

**Çima tu bi vî awayî difikirî?**

Daxwaza Kurdan a serxwebûnê wê qet neqede. Li rojava, li herêmê, li cîhanê û jiyanê bi xwe serxwebûn ji Kurdan re ferz kiriye. Federasyon ji xwe heye. Kes wê dest nede vê yekê. Ha te federasyon ji dest Kurdan derxist, ha te hemû Rojhilata Navîn ji nû ve ava kir. Hêza artêşa Îraqê nîn e ku bigihe heta bi Hewlêrê. Wekî din him di rastiya global û him jî di ya herêmê de, destûr nîn e. DYA dê destûrê nede ji bo vê. Îsraîl jî dê destûrê nede. Ji ber mercên niha, dibe ku avayiya konfederatîf dînin ber Kurdan.

**Gelo dibe ku ev ji bo bargirên Şiî re bibe paşwendî?**

Dibe! Ha wext e ji bin kontrolê derkevin. Ji ber ku bi pere ne an jî dildar in, ji texrîfan re vekirî ne. Bi temamî wek bombeya demjimêr in. Her wiha ji bo Tirkiyeyê jî talûke ne.

**Piştî niha, mimkin e ku giştpirsî betal bibe?**

Na, tu dê çawa betal bikî? Her çiqas Îraq nepejirîne jî Kurd çûne dengdanê û giştpirsî pêk anîn. Giştpirsî tenê ji bo ku daxwazên gel pêk were hate çêkirin. Nexwa ku giştpirsî nekiribûna jî dikarîbûn serxwebûnê ragihînin.

**Tu difikirî ku li hemberî Kurdan hevpeymaneke navneteweyî hatibe kirin?**

Ne tenê hêzên navneteweyî Kurd jî di navbera hev de di nav rikberiyê de ne û di bin sîwana Îranê de li hember hev rêkeftinan dikin. Tê zanîn ku malbata Talabanî bi Îranê re peymanek çêkiriye.

## “Kerkûk warê Kurdan e!”

**Gelo mijara Kerkûkê li herêmê nîşana şerekî nû ye?**

Rojhilata Navîn li ser pişteke şemitok e. Di mijareke hêsan de dibe ku şerekî mezin dest pê bike. Lê ez bawer nakim ku di demeke nêz de şerek rû bide, an ku heta pirsgirêka DAÎŞê çareser nebe. Hêzên global destûra vê yekê nadin. Li Îraq û Sûriyê şerekî mezin ê parkirinê heye. Bo mînak, li Kerkûkê jî şerê parkirinê kirin. Ha wext e dîsa lê vegerin, Kurd dikarin Kerkûkê dîsa bistînin. An jî bi awayekî dikarin bistînin.

**üKerkûk warê kê ye?**

Kerkûka ku ereb, tirkmen û gelên din ên cîhanê tê de dijîn, warê Kurdan e. Kerkûk beşek ji erdê Kurdistanê ye.

**Êrîşa Kerkûkê û operasyona Reqqayê di heman heftiyê de pêk hat, mirov dikare çawa lê binêre?**

Bi ya min, hemû bûyerên li Rojhilata Navîn pêk tên têkildarê hev in. Kurdên li Rojava û yên li Herêma Kurdistanê dijberî hev têne xuyakirin lê ez wiha difikirim ku wê Kurdistaneke yekpar were avakirin. Ez wiha difikirim ku hêzên li qadê wê Kurdan ne di bin banê du avahiyan de lê di bin yekê de bigihînin hev. Ew ê helwesteke nerm di navbera her du herêman de ava bikin. Helbet divê li bendê were sekinandin, wext divê. Berî wê dê li Rojava federasyon were îlankirin, dê li Herêma Kurdistanê jî rewş aram bibe.

Ji ber ku li gorî herêmê, Îran û Tirkiye du welatên li hemberî hev in. Him siyasî, him mezhebî û him jî bi awayê çandê; ne ew welat in ku werin ba hev.

---

**HOŞENG OSÊ**

### Kerkûk û Facebook?



Piştî dagirkirina parêzgeha Kerkûkê û derûdorên wê ji aliyên hêzên Îran-Iraqê “Heşd Elşabî” ve, ne tenê kurdên başûr, lê kurdên her çar perçeyên Kurdistanê dijwartirîn û şikestirîn û bêhêvîtirîna 48 saet jiyan. Ji ber ku kesekî bawer nedikir beşek ji rêxistineke kurdan, bihêsanî û erzanî, destên xwe têxe destên dijminên kurdan û rê li pêşiya dagirkirina Kekûkê û deverê din veke.

Li gorî nêrîna min YNKê, nemaze baskê Hîro Îbrahîm Ehmed û alîgirên wê, xapandineke mezin bi serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî kirin. Ji ber ku dema YNKê biryara tevlîbûna rêferandûmê da û festîvaleke mezin û cemawerî ji Barzanî re li parêzgeha Sileymaniyê çêkir, êdî guman ne tenê li cem Barzanî, lê li cem gelek kesan neman ku dê YNKê paşve bikşe û xiyanetê bike û bawerî li cem Barzanî û hemû kurdan peyda bû ku rûpelê nakokiyên dijminatiyê di navbera hêzên başûrê Kurdistanê de neman û YNK jî di referandûmê de cidî û semîmiye. Vê baweriyê hişt ku Mesud Barzanî pilan û tedbîrên tekûz û gelek xurt li Kerkûkê nestîne. Rast e pilan û komplo mezin bû û rast e Amerîka jî çavên xwe ji dagirkirina Kerkûkê re girt û eger Amerîka çira kesk ji “Heşid Elşebî” re vênexistibana, Tehran û Bexdayê ne dikarîn Kerkûkê dagir bikin, ev hemû rast in, lê rastiyeke din jî heye divê mirov wê jî bêje; ku serkirdatiya Kurdistanê derbarê rewşa li Kerkûkê rûda, ew jî berpirsyar e. Ev rastî çiqas tahl û dijwar be jî, divê mirov li xwe mikur bê û bêje.

Di şeva 18ê vê mehê de hinek hêvî dîsa geş bûn ku serhildan heye û gel li Xaneqîn, Kerkûk û Şîngalê raperîne û li hemberî “Heşid Elşabî” serî hildane. Gelek nûçeyên lezgîn dihatin û eniyên şer li ser medya civakî “facebook û twitter” ji eniyên şer li ser erdê li Kurdistanê germtir bûn. Her kelîk nûçeyên vegera pêşmergeyan li Kerkûkê, Xaneqîn û Şîngalê dihatin û “Heşid Elşabî” reviyan... hwd. û wisa xuya bû ku Kerkûk û gelek herêmên din li ser facebookê hatine rizgarkirin! Birastî jî, rewşeke wisa peyda bû ku şerê li facebookê çêbû, dikarî 10 Kerkûkan rizgar bike!

Gelek aktîvîst, siyasetmedar û hinek nivîskar jî di nav de, bi ta û nexweşiya facebookê ketine û tu dibêjî qey hema li benda bûyerekê ne da ku xwe bikin çavdêr, şîrovekar, lêkolîner, rojnamevan...hwd, da ku nûçe û şîroveyan belav bikin! Yan jî li benda mirina kesayetiyekî payebilind û navdar in, da ku behsa xwe û bîranînê xwe bi vî kesî re bikin ku qaşo behsa êş û xemgîniya xwe tînin ziman, lê di eslê xwe de, ev kes li ser facebookê bazirganiyê bi vî kesî dikin. Dibe ku ne tenê kurd wisa bin û miletên din jî di war û şêweyê bikaranîna medya civakî û facebookê de, ew jî wisa bin. Lê xuya dike û ya kurdan piçek zêdebûna ser kezebê heye.

Kurd amadene li ser facebook ji hev re xweş bikin, ji hev re mizdin, pesnê hev bidin, hev bifirînin ber peren esmanan û amadene bavê hev jî bişewitînin, koka hev bînin, hev bikin xayînên mezin û xwe bikin qehreman û welatperwerên mezin û bê hempa! Kurd li ser facebookê dikarin 100 Kurdistanî rizgar bikin û xerabikin! Dema mirov li rewşa kurdan û facebookê dinêre, mirov dikare ji xwe pirs bike; yawo qey em miletekî facebookî ne?

Ka em facebookê deynin aliyekî û vegerin mijara Kerkûkê. Ne ku hêvî nemane û ez gelek reşbîniyê belav dikim, lê bêbextiya Amerîka sînor jê re nîne, lewma divê kurd ji seneryoya Kurdistana bê Kerkûkê jî amade bikin. Ji xwe di nivîseke xwe ya berê jî, bi sernivîsa “Gelo serxwebûna Kurdistanê bê Kerkûk çê dibe?” Ku di Basnewsê de belavbibû, min bal kişandibû ser vê mijarê. Lewma ez naxwazim tiştên ku min di wê nivîsê de gotibûn, dîsa dubar bikim. (http://www.basnews.com/index.php/kr/opinion/38061).

Ne hertim tiştên bi hesanî diçin, bi hesanî jî vedigerin. Mixabin, ji me hebû di terazû û hesabên Amerîka de em bûne hejmareke mezin, dijwar û xurt. Lê heta niha, di nava berjwendiyên xelkê de, em hîna alav in û tên bikaranîn. Pirsa girîng ew ku kurd dê karibin berjwendiyên xwe yên netewî bikin beşek ji berjwendiyên navnetewî? Ya nêzîkî rastiye, li gorî min ew e ku serkirdatiya Kurdistanê pilaneke wisa peyda bike ku ne serxwebûna Kurdistanê bike qurbana Kerkûkê, ne jî Kerkûkê bike qurbana serxwebûna Kurdistanê. Ev pilan û pilansazî dê çawa be? Ne ez zanim, ne facebook dizane.



**EKREM ÖNEN**

**Geopolîtîka: Çi projeyên veşartî li pişt bûyerên Kerkûkê hene?**

Beriya her tişti heta pirsa başûrê Kurdistanê çareser nebe wê Kerkûk her pirsgirêk be. Weke tê zanîn di vê hefta borî de alaya artêşa Iraqê a bi navê 'alaya zêrîn' û milîsê ku şîa bi navê 'Heşdî el Şabî ' ku bi ser Îranê ve ne êrîş anîn ser bajarên Kurdistanê Kerkûk, Şingal, Xaneqîn û Tuzxurmatû û be ku astengî ji wan re derkeve derbasî nav van bajarên Kurdistanê bûn. Gelo çima li hember vê êrîşa artêşa Iraqê û Heşdî el Şabî li ser Kurdistanê, DYA û hêzên hevpeymanê bê deng man? Ji bo pirs baş bê fam kirin em ne li demek dirêj li van şapatên dawî tenê binêrin emê bighin hinek encaman. Weke tê zanin beriya referandûma serxwebûna Kurdistanê DYA û welatên rojava ji kurdan xwestin referandûmê nekin, serokatiya Herêma Kurdistanê bi serokatiya birêz Mesud Barzanî ev pêşniyara Brîtanya û DYA red kir û referandûm çêkir û bi ya min rast kir. Piştî referandûmê Iraq, Îran û Tirkiyê gef li kurdan xwarin, kurd bi ambargoyê tehdît kirin. Ingilîzan bi DYA, Iraq, Îran û Tirkiyê re projeyek amade kirin û ji kurda re pêşkeş kirin. Ku kurd ji van herêmên ku lazim e li gor madeye 140î bêne çareser kirin vekişin hudûdên xwe yên beriya 2014an. Piştî çend guftûgoyan civîna pêşin li Dokan çêbû hemû alî ketin vê civînê. Di vê civînê de birêz Barzanî vekirî dijberiya xwe li hember vê projeya ingilîz diyar kir û da fam kirin ku ew bi tu awayî vê projeyê qebul nakin. Paşê careke din berpirsê DYA Mc Gurk bi birêz Barzanî re civiya xwest wî qanii bike birêz Barzanî cardin dijberiya xwe da diyar kirin ku bi tu awayî vê projê qebûl nakin. Piştî ingilîzan fam kir birêz Barzanî projeya wan qebûl nake, ji vir û şûn de ingilîz bi DYA, Iraq, Îran û Tirkiyê re dest bi projeyeke nû kirin. Projeya wan ev bû ku bi hinek aliyên kurd re bi dizî li hev bikin ku bê astengî artêşa Iraqê û Heşdî el Şabî derbasî nav van bajarên kurd bibin. Ingilîza vê rola ku hinek aliyên kurd qanii bikin da Îranê. Berpirsên Îranê bi hinek aliyên nav Yekîtiya Niştimanî Kurdistan re bi taybetî bi berpirsê asayîşa YNKê re bi dizî li hev kirin. Ku vê projeya Ingilîza bibin serî û ev proje divê hefta borî de pêk hat artêşa Iraqê bi Heşdî el Şabî re derbasî nav Kerkûkê û bajarên kurdan yên din bûn dema derbas bûn hêzên pêşmerge yên bi ser YNKê de bûn xwe dan alî û rê ji artêşa Iraq û Heşdî el Şabî re vebû bê asteng ketin nava Kerkûkê û bajarên din. Hêjayî gotinêye li nava Kerkûkê zêdeyî 10 hezar pêşmergeyê yekîtî û dor 2000 pêşmergeyê Partî hebûn. Pirsek di cih de heye dibên çima pêşmergê PDK şer ne kirin? Biya min yek ji armanca vê projeya ingilîzan ku kurd şerê hev bikin. Durbîna birêz Barzanî ev konetiya vê projê dît û fam kir ku pêşmergê Partî şer bikin wê ew û pêşmergê Yekîtî hev bikujin ji ber wê jî pêşmergê PDK şer nekirin. Em dikarin bêjin emrwakî li ser pêşmergê Partî ferz bû ya hûn şer nekin an jî hûn şer bikin hûnê şerê pêşmergê Yekîtî bikin. Bi ya min li vir jî birêz Barzanî helwesteke milî û durbîn wergirt ku plana ingilîzan neçe serî. Li vir pirsek dikare bê kirin çawa ingilîz, DYA, Iraq, Îran û Tirkiyê dikarin li ser kurdan li hev bikin? Li vir her yek ji van dewletan li hember kurdan hesabekî wan hebû. Iraq, Îran û Tirkiyê hesabê wan esasî rê li ber avakirina dewleteke kurd bigirin. Ingilîz û DYA çend hesabên wan bi hev re hene. 1- DAIŞ niha xelas dibe, ji bo ingilîz û DYA hinekî ku li şûna DAIŞê herêma rojhilata nêzîk û navîn tevlihev bikin lazim e ji bo projeya xwe ya rojhilata nêzîk û navîn bibin serî di vir de hesabê ingilîz û DYA li ser kurdan bû ku kurd rolek weha bilizîn. Bes birêz Barzanî pir aşkereye wê rolek weha negire ser xwe û rolek weha ku berjewendiyên milî yên kurdan nebe nelîze ji ber wê birêz Barzanî ji projeya Brîtanya û DYA re asteng bû xwestin bi vê projeya Kerkûkê Barzanî zeîf bikin da dev ji siyasetê berde.
2- Nehêlin nufûsa Rûsya li herêma rojhilata nêzîk û navîn fireh bibe. 3- Ingilîz ji zemanê Împaratoriya Osmanî hesab û planên wan yên li ser Kerkûkê bi serkevin. Hêjayî gotinêye ku beriya 2014an hemû petrola Kerkûkê di destê şîrketên Brîtanya yên weke BP û yên din debûn. Piştî Kerkûk kete destê kurdan ji dest ingilîzan derket. Niha diyare dîsa dikeve destê ingilîzan. Ev çend roja Mesud Barzanî ji raya giştî ya Kurdistanê re napeyive sebebê wê ew e ku weke ingilîz dixwazin nayê hesabê wî weke ew dixwaze ji ber zora ingilîzan û DYA li ser wî nikare hêjaye kurd bi karibin wî fam bikin. Barzanî planê ingilîz, DYA, Iraq, Îran û Tirkiyê ku li ser kurdan li hev kiribûn puç derxist. Li herêmê niha hevalbendî û balansên nû çê dibin. Ev projeya ne di berjewendiyên Rûsya û Îsrailê de bû her weha ne di berjewendiyên Misir û Siûdiyê de bû. Heger DYA û Îran bibin hevalbend ne xerîbe dema ku niha Îsraîl û Siûdî xwe nêzî Rûsya dikin û Rûsya niha dixebite karta kurd ji destê DYA derxe. Kurd divê xwe ji guhertina re hazir bikin. Nêzîk ev krîza niha heye derbas dibe.

# 'Divê Kurd yekîtiya xwe xurt bikin, serkeftin a Kurdan e'

**■ NEFEL ARARAT**

Milîsên Heşdî Şabî ku girêdayî Îranê ne û bi kiryarên xwe yên hov tên zanîn û artêşa Îraqê bi piştevaniya dewletên herêmî êrişî Kerkûk û deverên Kurdistanî yên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê kirin û ligel hevkariya beşeke ji YNKê û paşvekişandina peşmergeyan, Kerkûk û ev dever hatin dagirkirin.

Serokê Partiya Azadî û Sosyalîzm( ÖSP) Sinan Çiftyürek, Serokê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) Mustafa Özçelik, Cigîrê Serokê Giştî yê HAK-PARê Abdulmenaf Kıran û Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê(PSK) Mesut Tek li ser dagirkirina axa Kurdistanê ji aliyê milîsên Heşdî Şabî ve ji Heftenameya Basê re axivîn.



Artêşa Iraq û rêxistina Heşdî Şabî êrişî Kerkûk, Şengal û deverên din ên Herêma Kurdistanê kirin. Sîyasetmedarên Kurd destnîşan dikin ku Kurd li ser axa xwe ne û wê serbikevin.

**"Di referandûmê de gelên Kerkûkê biryara xwe dan"**

Serokê ÖSPê Sinan Çiftyürek li ser mesela êrişkirin û dagirkirina bajarê Kerkûkê de wiha axivî, "Gelê me xemgîn e, em jî xemgîn in lê ev rewş dê wisa berdewam neke. Bila dijminên me jî ji ber vê rewşê şa nebin. Ev kilam li vir naqede. Kerkûk sêsed û çarsed sal e bajarê Kurdan e. Di 25 îlonê de gelên Kerkûkî biryara xwe dan û gotin Kerkûk bajarê Kurdistanê ye. Kes rewşa Kerkûkê ya niha qebûl nake ev yek. Ya duduyan hemû cîhan dizane ku ev plan plana Îranê ye û hemû dagirkeran jî piştgirî dane Îranê. Îran eger bi xwe êrîş bibira ser Kurdistan û Kerkûkê dizanîbû ku hemû Kurd dê bibûna yek. Hemû partî, rêxistin û şexs dê bibûna yek. Ji ber vê sedemê wek siyaset 'em çi bikin Kurdan ji hev bixin û di navbera van de şerê naxweyî derxin' yanî ev plan dan ber xwe. Wekî din dixwazin derbekê çêkin û parêzgera bajarê Kerkûkê bigûhêrînin da ku ji meclisa Kerkûkê biryarekê derxin ku 'bila Kerkûk bêje ez beşdarî referandûma serxwebûnê nabim.' Lê belê ev plana Îranê hat xira kirin. Lê Îran di 16 Cotmeha 2017an de bi destê hin kadroyên YNKê ve derbeyeke din kir. Îranê dixwest bi kevirekî du çûkan bixe. Yekem dixwest Kerkûkê bixe ya duduyan jî PDK û YNKê li hev bixe. Erê rast e îro Kerkûk ket lê plana duyemîn ya PDK û YNKê pêk nehat. Em kêfxweş in ku heta îro ev pêk nehat dîsa hêvî dikin ku ji vir şûn de jî pêk neyê. Ev plan şikest."

**" Helwesta Amerîkayê demkî ye "**

Çiftyürek tîne ziman ku helwesta Amerîka ya bo êrîşên Kerkûkê demkî ne û axaftina xwe wiha didomîne, "Qeneata me helwesta Amerîka û hêzên Rojava girîng e. Amerîka çawa bi destê xwe rê da ku Îran li ser Kerkûk, li ser Kurdistan û li ser Iraqê be? Bi ya min ev biryareke demkî ye. Amerîka çima qirareke wisa da? Sedema yekemîn, îro li Suriyê mesele safi nebûne. Li Kurdistana Rojava û Îraqê mesele safî nebûne. Heta ku li Suriyê mesele safî nebe li gor vê yekê jî naxwazin li Îraqê gavên dawî bên avêtin. Ya duduyan Amerîka di dema referandûmê de digot ne wexta referandûmê ye. Hikûmeta Kurdistanê -li gor me baş kir- guh neda Amerîkayê. Xuya ye Amerîka li ser mesela referandûmê êşiya ye. Ya sisiyan jî berjewendiyên Amerîka û hêzên -dewletên rojava hene. Di tereziya van de di aliyekî de Kurd-Kurdistan di aliyê din de jî Îraq, Îran, hemû dewletên Ereb û Tirkiye hene. Berjewendiya wan ne aliyê Kurdan aliyê din de xwe xuya dike. Tu van her sêyan bidî ser hev hewla Amerîka û dewletên Rojava diyar dibe."

**Di vê pêvajoyê de divê Kurd mil bidin hev**

Sinan Çiftyürek di derbarê hewldanên Îranê de jî van agahiyan dide,"Îran niha Kurdan bi êrîşa Habur, Hewlêrê tehdît dike ku bila Kurd xwe amade nekin da ku neçin li ser Kerkûk û cî û deverên din. Ev taqtîqa Îranê ye. Divê siyaseta me başûr vê baş bizanibin, ez bawer im baş jî dizanin. Ez bawer im siyasetmedarên me yên başûr wê vê taqtîqê têk bibin. Divê em her sê perçe li pişta başûrê Kurdistanê bisekinin. Em dibêjin bila YNK ixaneta xwe ya hûndir paqij bike lê em dibêjin bila PDKê jî di nav xwe de têkiliyên qirej ên ku li ser berjewendiyê çêbûnê paqij bike. Di serî de YNK û KDP bibin yek li gel vê bila hemû partî û rêxistinên me jî bibin yek her wisa divê em giş jî mil bidin wan. Wekî din em nabêjin pêşmerge tirsonek e. Pêşmerge, bi kêmasî û bi qehremaniya xwe pêşmergeyê me ye."

**"Raperîna Kerkûk, Xaneqîn û Şingal bîrîna me hinekî pêça"**

Serokê PAKê Mustafa Özçelik jî li ser êrîşên Kerkûk û deverên din ji Heftenameya Basê re wiha axivî, "Êrîşa ku hatiye ser Kerkûkê di esasê xwe de ji bo şikandina îredeya serxwebûna başûrê Kurdistanê ye. Planeke kur û berfireh e. Helbet dema referandûma serxwebûnê tirsek ket nav wan çi rejima Bexdayê, çi rejima Îranê, çi Tirkiye, çi hindek hêzên din... Ji ber vê planeke kûr û dûr e. Mixabin, hinek kêmasî, zeaf û îxaneta navxweyî jî ji wan re xizmet kir. Kerkûk careke din hat dagirkirin. Lê piştî ku li Kerkûk, Xaneqîn û Şingalê xelkê mebi awayekî welatperwer rabûn ser piyan, Heşdi Şabi vekişiya. Ev birîna ku di dilê Kurdistanê de vebibû hinek din hat pêçandin. Eşkere ye planên gelek mezin li ser başûrê Kurdistanê hene. Amerîka û dewletên mezin heta radeyekê çavên xwe girtin, yan ji rê dan vê êrişê, ev jî rastiyeke din e."

**" Ferqa Malikî û Ebadî ji Sedam Huseyîn tune ye"**

Mustafa Özçelik berdewamiya axaftina xwe de van agahiyan dide, "Daxwaz û pêkanîna referandûma serxwebûnê ne tiştekî vala bû û ne derew bû. Li başûrê Kurdistanê, siyaseta Bexdayê eşkere bû ku ne Malîkî, ne Ebadî tu ferqek di navbera van û Sedam Huseyîn de tune ye. Her ku diçin her xurt dibin, dixwazin destkeftiyên Kurdan ji Kurdan bîstînin. Wekî din tiştek derdive holê dê bi her awayî êrişî Kerkûkê bikirana. Ev deverên ku di nav madeyen 140. de wê dagirbikirana. Ev ne meseleya referandûmê ye lê piştî referandûmê êrişên xwe hê bi leztir kirin. Em wek Partiya Azadiya Kurdistanê dibêjin ji roja ewil de em pişgiriya îradeya xwîşk û birayên xwe yên başûrê Kurdistanê dikin. Em dibêjin wê miheqeq gav bi gav ev îradeya serxwebûnê li başûrê Kurdistanê rê li ber xwe veke. Ciyên ku hatine dagirkirin ji destê dijmin derkeve Kurdistan dê serxwebûna xwe îlan bike."

**"Kurd wê dîsa serbikevin..."**

Cigîrê Serokê Giştî yê HAK-PARê Abdulmenaf Kıran jî li ser bûyer êrîşên Herêma Kurdistanê wiha axivî, "Kurd li welatê xwe ne. Heşdi Şaibi carekê li Kerkûk, carekê li Şingal an jî li Hêwlerê be lê Kurd her li ser vê axê ne. Çimkî ev erdê Kurdan e. Ne Heşdi Şabi, ne artêşa Îraq, ne Îran, ne artêşa Tirkiye nikarin li ber Kurdan şer bikin ev ne pêkan e lê ji vê yekê re wext lazim e divê bi qirarbin. Miletê me yê başûr ji 2003-2004an vir de hînî azadiyê bûne û Kerkûk di destê Kurdan de bû. Wek tê zanîn herkes azad bû, serbixwe bû, dilê wan rehet bû û ewlehî hebû. Îro artêşa Îraqê destê xwe diavêje canê wan malê wan. Dest diavêje azadiya wan. Miletê ku hînî azadiyê bûyî zû bi zû bindestiyê qebûl nake. Dibe ku di serî de alozî hebe lê dema bi awayekî aram û rehet vê meseleyê bifikirin, dê dîsa têkoşîna xwe bikin. Kurd dê dîsa bi serkevin heta serê salê, Kurdistana serbixwe dê ava bibe. Nêrîna min ew e ku Kurdistan dê berî serê salê li hemû cîhanê re serxwebûna xwe ragihîne."

**"Divê hemû Kurd bi her awayî piştgirî bidin Başûr"**

Kıran axaftina wiha didomîne, "Wekî din yekitiya Îraq, Îran, Tirkiye û Suriyeyê ne mumkun e çêbibe. Pirsgirêk an jî nakokiyên van dewletan zêde ne û li hev nakin. Bi kurtî bibêjim van her sê rojên çûyî ne encama bûyeran e, hê têkoşîn berdevam dike. Her Kurdekî li cihê ku lê ye divê piştgiriyê bide vê têkoşînê. Niha divê hemû Kurd bi her awayî piştgiriyê bidin başûr. Yên dikarin şer bikin bila biçin şer bikin, yên ku dikarin bila piştgiriya aboriyê bidin, bila dîasporaya Kurdan jî baş bixebite. Divê hemû Kurd nîqaşên navxweyî deynin cihekî, bila yekîtiya xwe xurt bikin."











## "Kerkûk ji destê Kurdan derneketiye"

Serokê PSKê Mesut Tek jî li ser êrîşên Kerkûk û deverên din wiha axivî, "Tiştê ku qewimî dilê me êşand lê axiriya dinyayê nîne. Kerkûk ji destê Kurdan derneketiye. Pêşmerge derdorê Kerkûkê ne. Divê em ji vê meseleyê dersan derxin. Em hemû Kurd lê bi taybetî Serokatiya Herêma Kurdistanê noqteyên lawaz tespît bikin û wan bo yekitiyê û hevkariya Kurdan bi hêztir bikin. Emê ji aliyê xwe lawaz bibînin û van bi hêztir bikin. Ev bûyera dawî nîşan da ku ger pêşmerge nebe artêşeke netewî, wê demê bûyerên bi vî rengî dê her biqewimin. Her wisa divê yekîtiya sazî, dezgeh û siyaseta Kurdan a derve jî yek deng bibe."

**"Kurdan eşkere kirine ku dewleteke serbixwe dixwazin"**

Mesut tek berdewamiya axaftina xwe de wiha axivî, "Ev bûyer ne ya yekemin e, Kurd gelek caran rastî tiştên wisa hatine. Ketiye, dilşikestî bûye, morala wê xira bûye lê dîsa rabûye ser piyan xebatên xwe domandiye. Vê carê jî dê wisa be. Kurdan di referandûmê de jî diyar kirin ku dewleteke serbixwe dixwazin. Lê pêvajoyek e, karê rojek an du rojan nîne. Di vê pêvajoyê de rabûn û ketin gelek in. Ya giring ew e ku em bi qirar bin û doza xwe bernedin. Ger em wisa bikin ên derdorê Kurdan jî dê rêzê biryara referandûmê bigirin. Ji sedî 94 serxwebûnê dixwazin, kî dikare li hember vê îradeyê bisekine."

# “Em ê heta dawîn Kurdistanê biparêzin”

RÊZAN KARWAN

Heta ku hêza me hebe em ê berevaniya xaka Kurdistanê bikin. Xelkê Rojhilat jî bêdeng namîne. Heta niha ji bo ku em hincetan nedin Îranê em di rewşeke pasîf de man ku niha hatine ber difna me. Eger hêj bi pêş de werin ev dever ne navçeyeke nakok e û em ê heta dawîn li ber xwe bidin. Em bang li hemû rêxistinên navdewletî dikin ku bizanin Îranê li Kurdistanê êdî ne cihê veşartinê ye.

Piştî ku Kerkûk û deverên Kurdistanî yên derveyî îdareya Kurdistanê ku ev çend sal e di bin kontrola hêzên Pêşmerge de bûn, bi îxanet û komployeke mezin radestî çekdarên Heşdî Şabî û çekdarên Îraqî hatin kirin, rêxistina paramîlîter a Îranê Heşdî Şabî sînorên derveyî deverên nakok jî binpê kir û êrişî Pêşmerge kir. Li Pirdê dîsa çekdarên Heşdî Şabî xwastin ku pêş ve werin lêbelê Pêşnmergeyên Kurdistanê derbekî giran li wan da û êrişên Heşdî Şabî têk birin. Dema ku çekdarên vê rêxistinê nekarîn bi wê riyê werin îcar berê xwe guherandin û berê xwe dan navçeya Teqteqê ku girêdayî Hewlêra paytext e ku bîrên petrolê lê hene. Li nêzî vê navçeya Kurdistanê li Koyê baregehên partiyên Rojhilatê Kurdistanê hene ku yek ji wan partiyan PDKÎ ye.

**“2 armancên wan hene”**

Rojnameger û Endamê Polîtbûroya Partiya Demokrata Kurdistana Îranê (PDKÎ) Selîm Zencîrî li ser kiryar û tevgera çekdarên girêdayî Îranê li axa Kurdistanê û egera êrişa li ser partiyên Rojhilat û helwesta PDKÎyê ji Heftenameya Basê re axivî. Zencîrî got; “Li jêrî baregehên bajarokê Teqteq heye û hêzên Îranî heta wê derê hatin. 2 armancên wan hebûn; Yek li wê derê bîreke neftê heye û armanca din jî em bûn ku baregehên me nêzîkî wê derê ne. Egera êrişê zêde ye. Ji bo wan binpêkirina axa Kurdistanê ne girîng e.”

**“Pasdarên Îranê axa Kurdistanê dagir dikin”**

Selîm Zencîrî dibêje, li devera ku baregehên me lê hene, hêzên YNK hene û axaftina xwe wiha didomîne: “Bajarok  Teqteqê ne di nav deverên nakok de ye. Ev bajarok girêdayî Hewlêrê ye. Niha pasdarên Îranê û hêzên Îraqî tu sînoran nas nakin û axa Kurdan dagir dikin.”

Endamê PDKÎyê Zencîrî li ser şerê li Pirdê ku Heşdî Şabî hatibû têk birin jî diaxive û dibêje: “Eger li Pirdê rêgirî nehatibe kirin wê hêzên wan gelek bi pêş de bihatana. Li Şerê li Pirdê dengvedaneke mezin û girîng pêkanî. Şerê li Pirdê hevkêşe guhert.”

## “Em ê li ber xwe bidin”

Selîm Zencîrî di dewama axatina xwe de dibêje; “Em Kurd li qada şer bidest dixin û li ser masê jî ji dest didin. Divê em ji vê rewşa heyî  dersan derxînin û wiha pê de dice: “Heta ku hêza me hebe em ê berevaniya xaka Kurdistanê bikin. Xelkê Rojhilat jî bêdeng namîne. Heta niha ji bo ku em hincetan nedin Îranê em di rewşeke pasîf de man ku niha hatine ber difna me. Eger hêj bi pêş de werin ev dever ne navçeyeke nakok e û em ê heta dawîn li ber xwe bidin. Em bang li hemû rêxistinên navdewletî dikin ku bizanin Îranê li Kurdistanê êdî ne cihê veşartinê ye. Divê herkes bizanibe. Niha opozîsyona herî xurt li Rojhilat li dijî Îranê niha partiya me ye û niha ji ber wê yekê jî ew jî êrişî me dikin. Em ê heta dawîn li ber xwe bidin.



## Metirsî li ser kampên me heye

Endamê polîtburoya PDKÎ Mihemed Nezîf Qadirî jî ji Basê re got; “komeke çekdarên Heşda Şebî û pasdarên Îranê bi çekên giran nêzîkî navçeya Teqteq ya bajarê Koye bicîh bûne, em ji vê yekê nîgeran in. Ew çekdar û pasdar derbasî nav gundê “Şîwesûr” yê Teqteqê bûne. Ew jî metirsî ye li ser kampên me yên li kêleka bajarê Koye.” Qadîrî eşkere kir ku ew amade ne bersiva her êrişekî bidin û got, “Em daxwaz ji DYA û NY dikin mudaxele bikin.

# Girtina sînoran nanê kolberan birî



Kolber û kasibkarên sînor ji Basê re eşkere kirin ku li sînorê Hacî Omeran û Pîranşar li Rojhilatê Kurdistanê zêdetir ji 4 hezar kolber ji aliyê Îranê ve karta karkirinê ji wan re hatiye dayîn, lê bi hezaran kolberên din jî li wî sînorî û sînorên wek wî yên din ku karê kolberî dikir.

Cîranên Kurdistanê bi taybet jî Komara ‘Îslamî’ ya Îranê piştî 25ê Îlonê li dijî Herêma Kurdistanê ket  nav hewl û plangeriyên tarî û destbi ambargodanîna ser Kurdistanê kir. Jibilî bi hevkariya baskekî YNKê dagirkirina Kerkûk û axa Kurdistanê ji aliyê Heşda Şabî ve ku girêdayî Îranê ye, Îranê deriyên sînorî yên li gel Kurdistanê jî girtin ku ji herdu aliyan bi milyonan kesan debara xwe li ser wan deriyan pêk tîna.

Yek ji wan deriyên hatiye girtin jî Hacî Omeran e. Hat ragihandin ku ji ber girtina vî derî, bandor li ser kasibkarên wî sînorî pêk aniye û nanê bi hezaran kolberan hatiye birîn û bêkar mane.


**Zirara yekem li kolber û kasibkarên sînor bûye**

Li ser vê mijarê rêveberê bajarokê Hacî Omeran Ferzing Ehmed ji Bas re eşkere kir ku mixabin li gel daxistina sînorê navnetewî ya Hacî Omeran  ji aliyê Îranê ve, gelek kasibkar rastî bêkarî hatine û wiha pê de çû: “Diyar e zerermendê yekem kolber û kasibkarên sînor in ku berê rojane bi hezaran kolber ji wan sînoran tiştên xwe bi piştê tînan herêma Kurdistanê û ji Herêma - Kurdistanê ve jî herwisa ji bo Rojhilatê Kurdistanê dibirin. Lê mixabin niha nanê wan hate birîn û bêkar bûn û nikarin wek berê karê kolberiyê bikin.”

## Ji 12 salî heta 70 salî; zêdetirî 4 hezar kolber

Kolber û kasibkarên sînor ji Basê re eşkere kirin ku li sînorê Hacî Omeran û Pîranşar li Rojhilatê Kurdistanê zêdetir ji 4 hezar kolber ji aliyê Îranê ve karta karkirinê ji wan re hatiye dayîn, lê bi hezaran kolberên din jî li wî sînorî û sînorên wek wî yên din ku karê kolberî dikir ku temenê wan 12 heta 70 salî de ne û berdewam jî hejmara wan kolberên sînor li zêdebûn de ye, lê ji ber daxistina sînorê Hacî Omeran astengî bo wan ava bûye û bêkar mane.”

# “Bijî Kerkûk Bijî Kurdistan”



Heftiya derbasbûyî îxaneteke mezin li miletê Kurd û Kurdistanê hat kirin. Baskekî YNK bi peymaneke nehênî li gel Îran û Îraqê rêkeftin û Kerkûk radestî Heşdî Şabî hat kirin ku rêxistineke paramîlîter e û girêdayî îranê ye. Piştî ku Kerkûk û deverên din yên Kurdistanê hatin dagirkirin Kurdên Rojhilatê Kurdistanê jî bi çalakiyên cur be cur ev dagirkirin şermezar kir û hêrsa xwe anîn ziman.

Kurdên Rojhilat li dijî dagirkirina Kerkûkê hêrsa xwe anîn ziman

Kurdên Rojhilatê Kurdistanê bi çalakiyên cur bi cur dagîrkirina Kerkûkê ji aliyê çekdarên Heşda Şebî û pasdarên Îranê ve, şermezar dikin û hêrsa xwe tînin ziman.

Dagîrkirina Kerkûkê ji aliyê rêxistina paramîlîter Heşda Şebî û pasdarên Îranê ve û hevkariya beşek ji rayedarên YNKê bi wan re, rastî hêrs û nerazîbûna Kurdên Rojhilatê Kurdistanê jî hat. Li bajarê Kirmaşanê, welatiyan navê pasdaran li ser dîwaran reş kirin û li şûna wan dirûşmên mîna “Bijî Kerkûk Bijî Kurdistan” nivîsîn.

Piştî referandûmê jî rojhilatî daketibûn qadan

Piştî ku li Herêma Kurdistanê 25ê Îlonê referandûma serxwebûnê pêk hat û miletê Kurdistanê bi dengekî bilind daxwaza serxwebûnê kir, Kurdên Rojhilatê Kurdistanê li hemû bajaran daketibûn qadan û kêfxweşiya xwe anîbûn ziman.



MURAD CIWAN

## Darbeya welatfiroş

Roja geş a nîvê rojê ya Kurdistana Başûr ji nişka ve temirî, şevereşekê seranserê wê vegirt. Di du rojan de mezintirîn destkeftiyên di tarîxa modern a Kurdistanê de, firiyan çûn. Kurdistan heta berî çend rojan jî xwedan girîngiyeka global a stratejîk bû ku stêrka wê li esmanê navneteweyî diçirûsî. Lê ji nişka ve ji sedî çilê axa xwe, girîngtirîn beşa çavkaniyên  enerjiya petrol-gaz û avê yên stratejîk ji dest dan, ji alî aborî, siyasî, eskerî û derûnî tûşî wendakirineka neditî bû.

Trajediya mestir, ev felaket, ne di encama şikesteka liberxwedana li hember êrîşeka çekdarî, bi riya darbeyeka hin navendên serxwebûnxwaz yên nav aliyekî siyasî yê Kurdistanê, li hemberî serxwebûnxwazên welat hat.

Darbekar ketin nav komployeka reş a navneteweyî ya dirinde ya ji Bexdayê, Tehranê û Anqerê pêkhatî. Diyar e, komployê bi rêvekirina Amerîkayê û hevpeymanan destpêkir. Ji bo misogerkirina yekpareyiya axa Iraqê, pêre jî  rûnedana şerekî dûrûdirêj ê navxweyî, wan proses seranser xist bin kontrola xwe. Amerîkayê, serokê Kurdistanê, hikumet û YNKyî jî tê de cezakirina serxwebûnxwazan esas girt.

Daxwiyaniyên berpirsên eskerî û siyasî yên YNKê derdixin ku serkêşê vê darbeyê beşek ji endamên malbateka xwedan roleka girîng in, biryara planeka darêştî ya gavbigav a yek li pey yekê, berî rapirsiyê darijiyaye, li gor şertan hatiye guhertin û nuhkirin.

Berî rapirsiyê, serokê Herêmê û serxwebûnxwazên nav YNKê hatin tehdîdkirin, teşebbusa darbeyekê li hember berpirsên Kerkûkê bû. Piştî rapirsiyê, daxwaza hilweşandina wê û radestkirina deverên 140ê bo Bexdayê hat kirin. Van tu encam neda. Tek çare, navendên hevkar xistin bizavê. Berpirsên Kerkûkê tehdîd kirin da ew îdareyê bide dest wan. Nebû. Ya dawîn plana şernekirin û vekişiyana pêşmerge bi biryara fermandeyên eskerî yên YNKyî ket gerrê.

Mixabin ku fermandeyên meydanî tawaneka giran kir, bê haya serokê Herêmê û fermandeyê giştî yê pêşmerge, ya berpirsê YNKê û cîgirê serok, biryara vekişiyana bêşer da û Kerkûk tê de deverên binavkirî pêşkêşî Heşda Şaabî, orduya Iraqê û polîsê federal kirin.

Vê tawanê, ne tenê beşeka girîng a welat xist bin destê dijminan, bû wek kevjalekê, hişk bi serxwebûnxwazan veda, ew tevizandin. Yan diviya wan şerekî navxwe û yê li gel Bexdayê destpê bikira, yan jî xwe radestî hevkarên vê mihwera dirinde bikira. Wiha bû ku, deverên PDKê û hêzên YNKê ên serxwebûnxwaz jî mecbûr bûn vekişin.

Seranser deverên piştî 2014ê yên ku bi hatina DAIŞê pêşmerge ew rizgar kirin, careka din ketin destê Bexdayê. Şertên cîbicîkirina îradeya rapirsiyê û bikaranîna wê wek hêzekê di gotûbêjên li gel Bexdayê de neman. Bexda di pozîsyoneka xurt de bangî gotûbêjan kir, hikumeta Herêmê bi erêyî bersiva wê da.

Rewş ê bi ku ve biçe ne diyar e. Hê ji niha ve Bexda soza ku dabû hevpeymanan da êrîş neçin ser xelkê sivîl bicî nayne. Heşda Şaabî ket nav bajaran. Êrîş û talanên ser kurdan ji hedê der in. Kurd malên xwe dihêlin, penaber bi Hewlêr û Silêmaniyê ve dibin.

Piştî du rojên zor û zilmê, li Xaneqînê û li hin taxên Kerkûkê xelkê serîhilda. Behsa vekişiyana Heşda Şaabî ya ji bajaran hat kirin, lê diyar e ne rast e. Siyasiyan piştgirî neda serîhilderan. Bexda bi armanc e di 1-2 salan de bi siyaseta maliştineka etnîkî, nifûsa kurdan a ji deverên 140ê ber bi Hewlêrê û Silêmaniyê ve biqewirîne, ebediyen van deveran tevî yên erebên şîe bike.

Çend zû Kurdistan rabe ser xwe û ji bo vegerandina hin deveran, bi taybetî Kerkûk û derûdora Mûsilê, Şingalê, Xaneqînê û deverên din ew qas baş e.

Çi dibe bila bibe, divê şerê navxweyî derneyê, yekîdareyiya heyî neyê hilweşandin.

Ji bo tekûzkirina yekrêziya neteweyî, mekanizmaya herî lêhatî, bilezûbez avakirina îdareyeka li ser esasê federaliyeka Kurdistanî ye ku li jêr du hikumetên federe yên deverî bin, yek navenda wê Silêmanî ya din Soran be. Parlamentoyên deverî ava bibin. Rêveberiya deverî tenê bi xizmetên rojane yên welatiyan mijûl bin, ji pirsgirêkên neteweyî yên giştî, dîplomasiya li gel derva, parastina neteweyî û pirsên wek van dûr bin.

Li jor van herdu îdareyan, li Hewlêrê hikumet û parlamentoyeka federalî a Kurdistanê ya li ser esasê serokatiyê ava bibe ku xwe nexe nav xizmetên deverî ên jiyana rojane, tenê barê siyaseta îdarekirin, parastin û dîplomasiya giştî ya neteweyî hilde ser milê xwe. Hêzên 70 û 80 ji nav pêşmerge bên vekişandin, reorganîzeyî ji bo ewleyiya herdu deveran bibin. Zanyarî û Parastin têkevin nav sîstema deverî. Pêşmerge, îstîxbarat û hêzeka taybet a nuh li ser esasê dewleteka modern a şefaf a ser bi hikumeta federal ya tenê ji bo parastina li hember derva bên avakirin.

Ev hemû bi lihevkirina hemû aliyên siyasî bên kirin. Li ser vî esasî, hilbijaritnên serokayetiyê, parlamentoyên deverî û federali bibin, hersê hikumet bên danîn.

Lê lazim e bilez hin guhertin û nûbûn, strateji û taktîkên nipînûh bên cîbicîkirin. Ji bo vê, di asta parlamentoyê û navendên ciddî yên zanistî yên neteweyî û navneteweyî de lêkolîn li ser sedemê rewşa rûdayî bên kirin, encam bên derxistin, li gor wan reform bibin.

Eger hin rûreşan ev welatfiroşî kir, derket, sîstema Kurdistanê ya rêveberiya siyasî, eskerî, îstîxbaratî, burokrasî jî ne di wê ast, bikêrhatin û dûrbîniyê de ye ku karibe rê li ber navendeka ew qas bixeter ya bi serkêşiya çend kesan bigire. Rêveberiya Kurdistanê, di mesela rapirsiyê de, di tesbîtkirina dost, dijmin û piştgiran de hesabên şaş kirin, li hember mewqif-guhertinan di wextê de pozîsyonên xwe nuh nekirin. Helbet ev kêmasî û şaşî hemî ne ji gavên dema dawîn in, hin rengvedana sîstemên qels, şaş û bêkêr, heta rêgirên bisala ne.

Em jibîr nekin di esasî de sîstema bêkêr rê da vê xesareta mezîn, wek berfa di nava destan de heliyayî destkeftiyên zêrîn berhewa bûn.



KADİR KARAGÖZ

Derûniya Kurdan û demên kenogirî


Şikestina xeyalan, fetsa heviyan, xwe bi xwe xwarin, xwe kêm dîtin, ji xwe acizî, dilgiranî, bê bawerî, mirin, xwezî û hestên tarîtir û tehltir, ne pir dûr çend roj berê hal û derûniya Kurdên birewer û xwedî xîret ev bû. Rojek tarîtirin ji rojên Kurdan bû, wextê girî bû, tam digotin emê bigirin xwe ji derdan vala bikin nedibû, hevî û şahiyên çend saet berê dihatin bîra wan dikeniyan, ew jî nedibû kelogirî dibûn ango kenogirî dibûn…

Ji te tire gel bûye yekdil, yekmejî û yekhest, hespê xwe diajon rêka xelasî û serbixwebûnê lê belê xençera qaşo birayan li piştê stuyê te ye, honikbûna xençerê rihê te dicemidîne, diqefilîne. Dixwazî bigirî, dibînî ku gel li hevî û benda te ye û dibêje: "Were Kaka were Kaka". Xweşhal dibî, kefxweş dibî tevlî xençera qaşo birayan ku ji pişta te de çikandî dikenî, digirî, kenogirî dibî…

Gelek tişt îro bêtir aşkere ne, ewê betir jî zelal bibin; bê doxa vê xençera xayin ji kijan dara îxanetê çêbûye û bê kî qatîlê heviya vî gelî ye ewê diyar bibe û bawer bikin ewê gelek xewar ji ji xewa sedansalane hişyar bibin. Ez îro ti analîz û texmînan nakim her tişt xuya ye. Bi îzn û misada we be ezê helbesteke xwe ya di şeveke kenogirî de hatiye nivîsandin li rûpela xwe rêz bikim:

Îro matem e
Îro matem e
Şev bi fîstanekî reş, reşeke mehrum ji namûs
Xwe dixemilîne
Ev fîstanê xetxunî bi hesirên qaşo şefaf û mehzunî
Diçirûsîne
Îro matem e
Şev bi wê fîstanê qetranî li ber çavên me
Fikrên bê diran dikerritîne
Îro matem e

Îro matem e
Mejîkûjên şevê fikrên birîndar
Di nava xwîna hestên mirî de digevizin
Îro matem e

Îro matem e
Hestkûjên şevê
Hestên dilovîn dipelixîne
Îro matem e

Îro matem e
Şeva nêr eqlê selîm
Hestên helîm
Ji me distîne
Îro matem e

Îro matem e
Şeva nêr mêjiyên beyar
Fikrên stewr dide me
Îro matem e

Îro matem e
Şeva reş ji doh bêtir
Ji sibê kêmtir
Ezab dide me
Îro matem e.

Gelî dostan ez bi xebera azad bûna nivîskar Mihemed Ronahî kêfxweş bum, pîroz dikim, çavên wî û malbata wî ronî be.

# Riya Efrîn –Helebê; riya revandinê…

Şerê navxweyî yê Sûriyê ev diçe nêzî 7 salan e berdewam dike û zirara herî mezin jî weke encama her şerî xelkê sivîl dibîne. Li Rojavayê Kurdistanê jî ku car caran pevçûn di navbera rêxistinên cur be cur û hêzên Kurdî de derdikevin rewşeke ji herêmên din cudatir heye. Efrîn ev bi salan e di bin dorpêçê de ye. Heta ku xelkê Efrînê xwe digihîne kelûpelên jiyanî jî gelek metirsiyan datîne ber xwe û bi wî awayî jiyana xwe didomîne. Xelkê Efrînê di vê heyama ku 6 salan li paş xwe dihêle de jiyaneke di bin dorpêç, tijî zehmet, astengî û tal de derbas dike.



**Efrîn xwedî erdnigariyeke dijwar e**

Cihê herêmê yê erdnîgarî mercên zehmet lê hatine sepandin, ji ber nebûna rê bi deverên din ên Kurdî re û ji ber nexşeya leşkerî li derdorê, ango ji şeş salan de di bin dorpêçeke giran de ye, vê yekê hişt ku bidestxistina pêdiviyan her ku diçe dijwartir bibe.

**Li derdora Efrînê kîjan alî hikûmran in?**

Tu dergehên sînorî li herêmê bi sînorê Tirkiyê re nîn in û neçar dibûn deriyên Bab El-hewa li Idlibê û Bab El-Selamê li Ezazê ji bo derbasbûna nav xaka Bakûr bikar bînin û hin caran bi qaçaxî derbasî Tirkiyê dibûn û rastî lêdan, îşkence û kuştinê dibûn ji aliyê leşkerên ser sînor ve.

Di dema niha de Artêşa Tirkiyê û hevbendên wê ji aliyên Ezaz (rohilat), Idlib (başûr) û Tirkiye (Bakûr) ve girtî ye û dorpêç li ser herêmê sepandiye, tenê li başûr-rojhilatê Efrînê deriyek maye û ew jî di bin kontrola milîsên rêjîma Sûriyê yên şîe de ye. Herwisa li wê derê çekdarên Hizbûllah Evxanî û Îranî jî tên dîtin.

**Riya revandinê; riya Nibil û Zehrayê…**

Ji bo gihiştina bajarê Helebê, xelkê Efrînê di herdu bajarokên Şîe Nibil û Zeharyê re derbas dibin û li wan deran bi dehan caran rastî revandin û desteserkirinan dibin, lewma ev rê li nav xelkê Efrînê bi navê (riya revandinê) tê naskirin. Li ser vê riyê bi dehan caran xelkên sîvîl bi hincetên cihêreng tên revandin û îxanetkirin.

## Dest danîn ser pereyên wan jî

Dildar teqez dike ku ew û 43 kesên din hemû Kurdên Efrînê bûn û temenê wan di navbera 40-65 salî bûn û dibêje; Em xistibûn odeyekê û derî û pace li ser me girtibûn û gelek fişarên derûnî li ser me didan meşandin. Di destpêkê de çekdaran hemû tişt ji me standin weke pere û kaxizên fermî, lê gava ku em berdan piraniya pereyên me li me venegerandin û kirin ber xerciya li me bûye!

**Rispî ketin navberê**

Piştî 15 rojan ji revandinê, bi destwerdana hin rîsipiyên malbata Şerbo ya şîe di 18ê Cotmehê de hemû hatin berdan tevî ku çekdarên Hizbûllah û Îranê jî destêwerdan kiribûn lê dawiyê malbata çekdaran li hev civiyan û biryar dan ku girtî serbest bên berdan û rêya di navbera Efrîn û Helebê de li ber tevgera sîvîl û bazirganiyê bê vekirin.

> Erdnigariya Efrînê mercên zehmet bi ser herêmê de disepîne, ji ber nebûna rê bi deverên din ên Kurdî re û ji ber nexşeya leşkerî li derdorê, ango ji şeş salan de di bin dorpêçeke giran de ye, vê yekê hişt ku bidestxistina pêdiviyan her ku diçe dijwartir bibe.

Di 5ê Çiriya Pêşîn de careke din milîsên şîe li nêzîkî gundê Mayêr 44 welatiyên Kurd ku berê wan li bajarê Helebê bû revandin û birin bajarokê Niblê û di xaniyekî de bicîkirin, piraniya wan karmend, xwendekar û kesên nexweş bûn û temenê wan jî 40-65 bû. Wan milîsan çend carên din jî dav vegirtin û welatiyên zêdetir revandin heya ku hejmara wan giha 154 kesan.

**Sedem çi ye?**

Di bin siya nebûna daxuyaniyên fermî ji hêla Rêveberiya Xweser ve, çarenivîsa welatiyên revandî ne diyar bû lê piştî çar rojan ji revandinê milîsan destûr dan sivîlên girtî ku bi riya telefonê têkiliyê bi malbatên xwe re deynin.

Milîsan ji wan dixwast malbatên xwe bixin bin fişarê da ku berê xwe bidin navendên ewlehiyê û jê bixwazin ku sê girtiyên wan ku li Efrînê bi tometa bazirganiya bi bûjenên jihişbirinê hatibûn girtin, berdin!

> Ji bo gihiştina bajarê Helebê, xelkê Efrînê di herdu bajarokên Şîe Nibil û Zeharyê re derbas dibe û li wan deran bi dehan caran rastî revandin û desteserkirinan tên, lewma ev rê li nav xelkên Efrînê bi navê (riya revandinê) tê naskirin.

Yanî armanc û daxwaza milîsan bi rehîngirtina xelkê sivîl ew bû ku ji bo berdana wan her sê kesên ku bi tometa bazirganiya madeyên hişber ji aliyê asayîşê ve hatibûn girtin bi wan xelkê hatiye desterserkirin bigûherînin.

**Danûstendin çawa pêk hatin?**

Dildar xortê 21 salî, xwendekarê zanîngeha Helebê dixwast ku vegere xwendina xwe bi serî bike, li ser rê hat girtin. Dildar ji Heftenameya Basê re axivî û got: 7ê Çirya Pêşîn ez diçûm Helebê û li nêzîkî gundê Mayêr, ji aliyê pênc çekdaran ve ez û du zilamên din hatin girtin berên me dan Niblê û li malekê li derdora bajarokî em bicî kirin.

# 'Paytext' jî hat kontrolkirin

> Şerê rizgarkirina Reqayê 134 rojan dom kir û di encama vî şerî de 650 şervanên HSDê jiyana xwe ji dest dan. Li hêla din 450 hezar sivîl jî ji destê DAIŞê hatin rizgarkirin.



## "Herî kêm 3 hezar û 250 kesan canê xwe ji dest dan"

Rewangeha Mafên Mirovan a Sûriyê ku nêzî opozîsyona Sûriyê ye, diyar kir ku di maweya 4 mehên rizgarkirina Reqayê de herî kêm 3 hezar û 250 kesan canê xwe ji dest dane. Li gor vê dezgeha ku navenda wê li Londonê ye, vê hejmarê 1130 kes sivîl in. Tê ragihandin ku di ancama vê operasyona ku di meha Hezîranê de destpê kir bi sedan kes jî winda bûne. Ku tê texmînkirin piraniya van kesan di bin avahiyên xerabûyî de mane."

## Di nav Kurdan de jî bûbû sedema niqaşê

Beriya destpêkirina operasyona kontrolkirina Reqayê di nav raya giştî ya Kurdan de jî niqaşeke xurt hat kirin û gelek alî û pisporan diyar dikir ku divê ciwanên Kurdan li derveyî axa Kurdistanê bo armancên cuda neyên kuştin û li dijî operasyonê bûn. Lêbelê aliyekî din jî radgihand ku biryara operasyonê ne di destê Kurdan de ye û kontrolkirina Reqayê wê destkeftên din ên Kurdan yên li herêmê jî zêdetir bike û ev operasyon ji neçarî jî be divê pêk were û bi vî awayî piştgirî didan operasyonê.

Bajarê Reqayê ku rêxistina DAIŞê weke 'paytext'a xwe bi nav dikir niha di bin kontrola hêzên Kurdî de ye. Heftiya borî roja Sêşemê Hêzên Sûriya Demokratîk ku serkêşiya wê YPG dike bi piştevaniya hevpeymaniya navdewletî ya li dijî DAIŞê xalên mayî yên li Reqayê ango ji Nexweşxaneya Niştimanî û Leyzgeha Beledî ji çekdarên DAIŞê paqij kirin û bajar ji destê vê rêxistinê derxist.

Şerê rizgarkirina Reqayê 134 rojan dom kir û di encama vî şerî de 650 şervanên HSDê jiyana xwe ji dest dan û Lêbelê di encama vê yekê de ya 450 hezar sivîl jî hatin rizgarkirin ji bin destê DAIŞê.

**Xelkê herêmê wê xwe birêve bibe**

Berdevkê HSDê Telal Silo 20ê vê mehê daxuyaniya kontrolkirina Reqayê li meydana El Neîm xwend ku li wê derê bi dehan xelkê sivîl ji aliyê wê rêxistinê ve hatibûn qetilkirin û darvekirin. Di daxuyaniyê de jibilî ragihandina rizgariya bajêr, soz hat dayîn ku Reqa ji gefên derve bê parastin. Herwiha hat gotin ku çarenivîsa vî bajarî wê di çarçoveya Sûriyeke nenavendî û demokratîk de were diyarkirin û xelkên li bajêr wê karûbarên xwe birêve bibin. Di daxuyaniyê de ev serkeftin diyarî hemû mirovahiyê û nemaze jî kesûkarên qurbaniyên terorê li Sûriyê û cîhanê hat kirin.

**Şêxên Êlên Reqayê red kirin**

Heyetek ji şêxên êlên Reqayê red kir ku li helkeftina tagihandina rizgarkirina bajarê Reqayê beşdar bûbin û bi taybetî piştî ku tibab xerabûna bajêr dîtin.

Malpera bi navê 'Reqa bi bêdengî tê serjêkirin' ku navdar e û di salên borî de gunehkarî û kiryarên rêxistina DAIŞê radixist ber çavan, îddîa kir ku Reqa careke din hatiye dagirkirin.

Malpera navborî ku jibîr dike û nabîne ku Kurdan ji bo rizgarkirina xelkê sivîl ji bin zilm û zordariya hikmê DAIŞê bi sedan qurbanî dane, îdîayên xwe berdewam kir; "Kurdan bi navê Hêzên Sûriya Demokratîk, bajarê Reqa dagir kirine, ji xerabûnê zêdetir tiştek ji bilî guhertina alên reş ên DAIŞê bi alên zer ên Kurd, nehatiye guhertin."

**Wêneyê Ocalan bû sedema krîzê**

Li hêla din piştî ku Reqa bi temamî ji destê DAIŞê hat derxistin, Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) ku beşdarî operasyonê bûbû, li navenda bajarê Reqayê daxuyaniyek belav kir. Di vê kombûnê de YPJ wêneyên rêberê PKK Abdullah Ocalan li ser dîwarê El Neîm bilind kir. Vê yekê dengvedaneke mezin pêk anî û di navbera hêzên herêmê û navdewletî de bû sedema qeyranekê. Serokwezîrê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan bertek nîşanî vê yekê da û got ku DYA wê vê rewşê çawa îzah bike. DYA jî eşkere kir ku xebata wan a li gel HSDê wê berdewam bike lê divê kiryarên wiha neyên kirin. Li hêla din Berdevkê HSDê Telal Silo jî li ser vê mijarê wiha axivî; "HSD ne girêdayî PKKê ye, lê YPJê bi vê çalakiyê xwast ronî û balê bikişîne ser çarenivîsa Ocalan."

**DAIŞ ji holê radibe**

Kontrolkirina 'paytext'a rêxistina DAIŞê û herwiha rizgarkirina bajarê Mûsilê ji aliyê Artêşa Îraqê û Pêşmergeyên Kurdistanê ve, hişt ku hilweşîn di nav rêzên vê rêxistina tundrew de pêk were û ji ber vê rûberên fireh li Îraq û Sûriyê ji dest dide û desthilatî û kontrola wê ji nav diçe.

Di dema niha de hebûna DAIŞê li Sûriyê tenê li çolên Şamî li nêzîkî bajarê Dêrezorê maye, ango ji gundewarê rojavayê Dêrezorê ji aliyê HSDê ve bi temamî hatiye derxistin û her diçe ber bi jiholêrakirinê ve diçe.



# " Her roj yek lîre bo miletê xwe biavêjin qumbereya xwe "

**GÖNÜL GÜN**

Mansur Pilatin di eslê xwe de ji Amedê ye û Awustralyayê dijî. Pilatin pêşengiya vê kampanyaya ' Her roj yek dolar an jî her roj yek lîre an euro ' di sala 2014an de kiribû. Kesên ku ewilî vê ya dibihîsin hinek difikirîn gelo ev yek çi ye? Pilatin dest nîşandike ku ev pênc sal e wek şexs her roj bo xizmet, xurtkirin û piştgiriya saziyên miletê Kurd yek dolar an jî yek lire diavêje qumbereya(peredankê) xwe. Lê Pilatin lazim dîtiye ku divê gelek kes xwedî vê feresatê derkevin ji loma di 2014an de kampanyayekî da dest pêkirin û ev kampanya ji aliyê gel ve hat ecibandin. Mansur Pilatin derbarê xebat û rewşa kampanyaya 'her roj yek dolar/ lîre/euro yê ' de ji Heftenameya Basê re axivî.




Kampanyaya her roj yek dolar çend sal berê di nav Kurdan de deng veda û balê kişandibû. Mansur Pilatinê ku pêşengiya vê kampanyayê dike dibêje, " Divê Kurd bo xurtkirin, piştgirî û xizmeta saziyên xwe bila her roj yek lîre, dolar an jî euroyek bavêjin qumbereyên xwe."

**"Her roj yek lîre bo miletê xwe"**

Mansur Pilatin diyardike ku ewilî wek şexs û niha jî û ev pênc sal e dema ku her serê sibê radibe bo xizmet, xurtkirin û piştgiriya saziyên Kurdan yek dolarek diavêje qumbera xwe û Pilatin wiha behsa, dest pêka vê kampanyayê dike, "Di sala 2014an de me dest pêkir. Min li facebookê bi navê 'her roj yek dolar 'rûpelek vekir. Hedî hedî fikr û ramana her roj yek dolar hat ecibandin û di demeke kin de hat qebûlkirin. "

Pilatin derheqê armanca her roj yek lîre/ dolarê de wiha diaxive," Motîvasyona vê fikrê wiha çêbû. Bi rastî, Kurd canê xwe didin malê xwe nadin! Divê her malbatek Kurd qumbereyek, deyne mala xwe her roj herî kêm yek lîre biavêje vê qumbereyê. Perê ku di qumberê de berhevbûye êdî bo xizmet, piştgirî û xurtkirinê bidin sazî û dezgehên Kurdan yanî ev pere bo saziyên Kurdan bê dayîn. Ev pere ne bo xêr û zikatê ye. Divê Kurd bêjin ku min îro bo miletê xwe çi kiriye? Qe ne be bila her roj yek lîreyek bo qumbareyê bê avêtin. Bi vî şiklî fem û feresata netewî çêbibe. Temam belkî her roj yek dolar kêm e lê belê ev yek di nav gel de belav bibe û girseyek zêde hebe wê demê dê baştir ev yek bê femkirin. Li ser meselê, ez bêjim serjimara bajarê Amedê îro mîlyon an jî du milyon e. Herî kêm her malbatek her roj yek lîre biavêje qumbereya xwe wê demê pereyek zêde berhevdibe. Vê perê bi sala ne hisap bikin pereyek zêdetir berhev dibe, bi vî pere ve bo Amedê gelek tişt dikarin bikin.Heta ne lazim e ku Kurd bibêjin dewlet bo me tiştek nake. Kurd miletekî dilxwaz e lê rê u rêbazan nizane we bo miletê xwe çi bike û çawa xizmetê bike. Her roj yek dolar dermanek e yanî divê ' ey Kurdno hûn qet tiştek nakin qe ne rojê lireyek biavêjin qumbereya xwe..."

**"Me bo zarok û mezinan pirtûkxaneyekî vekir"**

Pilatin destnîşandike piştê ku ev kampanya dest pêkir yekemîn xebata wan bo malbatekî Wanî ya di erhêjê de bê mal bûn, xaniyek kirine û wiha pê de diçe, " Di 2014an de em ji Awustrulyayê hatin bajarê Wanê. Me hinek pere berhevkiribû hinek jî li wir berhevkir bo malbatek xaniyek kirî. Ev xebata me ya yekemîn bû."Pilatin tîne ziman ku paşê li Amedê bi navê 'her roj yek dolar' komeleyek vekirin û xebatên baş pêk anîne û wiha qala xebatên din dike," Xebata me ya duyemîn jî ew bû ku me li navçeya Bîsmîla Amedê pirtûkxaneyek bo zarok û mezinan vekir. Navê vî pirtûkxaneyê jî El Cezerî ye û me 10-15 hezar pirtûk xiste vî pirtûkxaneyê. Niha biçin navçeya Bîsmîlê dikarin vê pirtûkxaneyê bibînin. Xebata me ya sêyemîn jî li Cizîrê bû. Li Cizîrê ji bo 40-50 zarokên sêwî me amûrên qirtasiyeyê kirî. Xebata çaremîn jî me bo malbatên Sûra Amedê alîkarî kir. Me vê alikariyê wek Komeleya Her roj yek dolar û bi hevkariya, Komeleya Halkların Köprüsü û Dezgeha Alîkar xebata alîkariyê kir. Me herî kêm di nav 5-6 hefteyan de, ji bo 3 hezar malbatên Surî alîkariya kinc û xwarinê kir."

**"Bo bi serketina miletekî xebat lazim in"**

Li ser pirsa' Gelo eleqeya Kurdan bo kampanyaya her roj yek lîre çawa bû û çawa ye?' Pilatin wiha bersivê dide," Ez dikarim vê ya bibêjim Kurd miletekî zû germ dibe zû jî sar dibe. Min qumbereyan da gelek kesan pere neavêtin qumbereyê. Yanî ji sedî yek incax avêtin an neavêtin. Yên ku avêtin jî qumbereya xwe neanîn. Miletekî wiha ye dibêje ez tv temaşe bikim û bikivime înternetê wê doza min biserkeve. Yanî gava ku Kurd dikevine platformên çapeniya civakî qey dibî tiştek dikin, a rast ev tişt xwe xapandin e. Ji bo ku miletekî xilas bibe lazim e ku tu xebatan bikî û berdêlekî bidî."

**"Ji ber zextên dewletê me komeleyê girt"**

Rewşa sîyasî a heyî û zextên dewletê bandor li ser xebatên Komeleya her roj yek dolarê jî kiriye û Pilatin derbarê vê mijarê de wiha diaxive," Mixabin dewlet dest da li ser hisabê me yê banqayê û hisabe me blogê kir. Me bloga xwe rakir heta ciza jî da. Lê belê me dit ku li ser me zext dê her hebe û wê demê pêvajo jî ne baş bû ji ber vê em mecbûr man komeleya ku me li Amedê vekiribû 5-6 meh berê girt. Xebata me niga sekiniye lê emê hisabên nû yên Awsturalya û Ewropayê vekin. Dema ku perek bo alikariyê were van hisaban êdî hikûmeta Tirk nikare destê xwe bide van hisaban. Ya rast bo me hisap ne girîng e a muhîm ew e ku feresata her roj yek dolar bikeve hiş û jiyana Kurdan û her berdewam bibe. Wekî din emê malperekî jî vekîn behsa vê ferasetê û xebatên xwe bikin."

**"Her meh kovarek Kurdî dikirin"**

Pilatin herî dawî derbarê her roj yek dolarê de, bo xwînerên Basnewsê wiha diaxive," Divê her malbatê Kurd fereseta her roj yek dolarê hînî zarokên xwe bike. Keç û kurên xwe re bila bibêjin dema her serê sibê radibin lîreyek biavêjin qumbereyê. Zeman zemanê aboriye ye. Ger aborî nebe tu nikarî tu tiştê bikî. Li ser meselê, niha li Ewropayê mîlyonek Kurd heye. Ger ev mîlyonek Kurd her roj yek euro biavêjin qumbereyên xwe dikarin di nav heft rojan de zanîngekî vekin."

Mansur Pilatin behsa xebatek dinê dike û dibêje me komek avakiriye her meh kovarek Kurdî dikirin. Ev jî wek felsefeya her roj yek dolarê yê û Pilatin wiha pê de diçe," Li bakur 25 mîlyon Kurd hene. Lê kovareke bi Kurdî a sê mehane hezar heb jî nayê firotin. Ev şermeke mezin e gava ku tu wek 25 mîlyon kes nikarî hezar lib kovar bikirî tu nikarî şer jî bikî nikarî tiştek din jî bikî. Em wek kom li ku dera dinyayê bin her mehê kovarekî dikirin."

# Li Diyarbekirê xebata mirovahiyê

**DARA PORXELEK**

Saziya Piştgiriya Mexdûrên Îşkence û Tundiyê ya SOHRAM'ê 17 sal in ku li Diyarbekirê ji bo kesên ketî û mexdûrê şer xizmeta piştgiriyê dide. Di van salên dawîn de serlêdanên ji bo vê saziyê tên kirin jî zaftirîn ji penaberan pêk tên. Vê saziyê di meha Îlonê de ji 400 penaberên Sûriyeyê re xizmeta aborî û civakî daye û heta niha jî ev xebat didomin. Li saziyê jinên Sûriyeyî perwerdehiya çêkirina çêniyan dibînin. Armanca vê qursê ew e ku li ser derûniya jinên ji ber şer penaber bûne bandoreke erênî bidest bixe ye.

Jinên koçber saya qursan debara xwe jî pêk tînin

Jinên koçber bi saya van qurs û perwerdehiyan dikarin veberhêneriyê bikin û debara xwe bikin. Ev yek jî him dike ku wan demên tarî ku di nav şer de derbas kirine jibîr bikin him jî dest bi jiyaneke nû bikin. Penaberên ji Îdlîp, Helep û Rojavayê Kurdistanê hatine Diyarbekir van mehên dawîn de di nav kelecanekê de ne. Ev penaber ku ji meha Îlonê ve di Saziya Piştgiriya Mexdûrên Îşkence û Tundiyê ya SOHRAMê de perwerdehiya çêkirina çêniyan didîtin niha berhemên xwe li sûkan û li bazaran difiroşin.

"SOHRAMê gelek piştgiriya me kir"

Penabereke ji Îdlîbê qala perwerdehiya xwe ya qursê dike û wiha dibêje: "Li Îdlibê jiyaneke me xweş hebû. Em 3 sal berê neçar man ku ji ber şer birevin. Koçberî û penaberî zehmet e. 4 zarokên min hene, hevjînê min li xwaringehekê dixebite. Saziya Piştgiriya Mexdûrên Îşkence û Tundiyê ya SOHRAMê jî gelek piştgiriya me ya aborî kiriye. Niha ez jî bo çêkirina van çêniyan bêrîkirina xwe ya ji ax û welatê xwe jibîr dikim. Ew demên şer ji bo me gelekî neyênî bûn û jixwe ji dûrketina axê hewce nake ez qala êşa wê bikim."



"Niha ez jî bi çêkirina van çêniyan bêrîkirina xwe ya ji ax û welatê xwe jibîr dikim. Ew demên şer ji bo me gelekî neyênî bûn û jixwe ji dûrketina axê hewce nake ez qala êşa wê bikim."

**Kurdên Rojava jî di van qursan de ne**

Herwiha penaberên ji Rojavayê Kurdistanê koç kirine û hatine Diyarbekirê jî bi saya van qurs û perwerdehiyan bêrîkirina gund û warên wan hinek kêm dibe. Ji ber penaberiyê û hejariyê Kurdên Rojava li Diyarbekirê xwe bêkes didîtin lê niha bi saya van mijûliyan ew dikarin li Diyarbekirê bi awayekî erênî jiyana xwe bidomînin.






**FIRAT CEWERÎ**

Hêvî

Hêvî yek ji gotinên pir bi mane ye û stûna jiyanê ye. Gava hêviya mirov dişikê, her tişt li ber çavên mirov reş dibe û jiyan ji nişkê ve maneya xwe wenda dike. Hêvî baweriya mirov xurt dike û mirov bi leztir ber bi armancê ve dibe. Gava hêviya mirov heye û xurt e, mirov bi çavekî erênî li jiyanê û li der û dora xwe dinêre. Lê gava hêvî diçilmise, jiyan reng diguhere û bi tenê reş xuya dike. Mirov hingî qet çirûskek ronahî jî nabîne. Hêvî bi qasî ku şexsî be, ewçend jî komî ye. Carina malbatek, eşîrek, bajarek an jî miletek an bi hêvî dibe, an jî hêviya xwe wenda dike. Gava endamê malbatekê, eşîrekê, bajarekî an miletekî tiştekî baş û bi serketî dike, tavilê hêviyek dadiwerive dilê mirov û mirov geş dibe. Lê gava tiştekî neyênî diqewime, mirov ber bi xemgîniyê ve tê kişandin, hêviya mirov diçilmise; rûyê mirov yê bi ken xemgîn dibe, baweriya mirov dişikê, gunehê mirov bi mirov tê û mirov xwe neqenc his dike. Bi gotineke din mirov bêhêvî dibe. Carina wek takekes mirov xurt û biserketî be jî, lê gava malbata mirov, an jî miletê mirov dikeve rewşeke xerab, mirov jî tavilê xwe ne baş his dike û dikeve hundirê bêhêvîtiyekê. Ji ber ku hêvî jiyan e û stûna herî qewîn ku mirov xwe dispêriyê hêvî ye. Heke em kêliyekê ji hêviya takekesî bi dûr bikevin û ya milî bi bîr bînin, em ê bibînin ku di pêvajoya dîrokê de kurd hem bi hêvî bûne, hem jî ketine pirika bêhêvîtiyê. Hêvî û bêhêvîtî, an jî xemgînî û dilşahî wek tarîtî û ronahiyê ye. Mirov carina bi hêvî, carina bêhêvî ye. Mîna ku mirov carina xemgîn, carina jî dilşa ye. Carina dinya li ber çavên mirov reş e, carina jî çirûskek pê dikeve û ew dinyaya reş rohnî dibe û hêviya mirov ya çilmisî geş dibe. Carina mirov bawer dike dinya hemû alîgirê mirov e, carina jî ji nişkê ve mirov xwe bi tenê dibîne û bawer dike dostê mirov yê herî nêzîk çiya ne. Gava mirov ne bi tenê bi dil, lê bi aqil jî bifikire, mirov ê bibîne ku dostê kurdan ne bi tenê çiyayên wan in. Ji bo ez ji gotina hêvî û bêhêvîtiyê bi dûr nekevim, ez ê zêde danekevim kûraniya dîrokê û tenê li van rojên dawî, an li vê meha dawî vegerim. Ez bi xwe mirovekî xweşbîn û piraniya caran bi hêvî me. Lê di warê milî û statuya milî de, dibe ku ez tu carî bi qasî vê meha dawî bi hêvî nebûbim. Ji bo ez şahidiya bûyereke dîrokî bikim û coşa gelê kurd bibînim, min di 25ê îlonê de hemû kar û mijûliyên xwe li dû xwe hiştin û berê xwe da Hewlêrê. Min dît bê gelê kurd bi rûyekî çawa geş û hêviyeke çawa xurt dibeziyan ser sindoqan û ji bo serxwebûna Kurdistanê dengê xwe didan. Min dît bê piştî dengdanê wan bi zar û zêçên xwe re çawa berê xwe didan kamerayan û wêneyên kêfxweşiyê digirtin. Min dît bê hêviya wan çiqasî xurt bûbû û ew bi çi dilşahiyê tevdigeriyan. Min hilbijartinên gelek welatan dîtine, lê bi qasî hilbjartina 25ê îlonê bi xweşî, aramî û bi hêvî nedîtiye. Min ji kê dipirsî, digot, hêviya me Kurdistanek serbixwe ye. Min dît bi hêviyê ew çi spehî kiribûn û ew çawa piştrast û serbilind dimeşiyan. Gava dengdan xelas bû û derengê êvarê hêdî hêdî encama hilbijartinê diyar bû, min dît bê hêviya wan û bi wan re hêviya me çawa bilind bû û tu nema bû serên me li esmanan biketa.

Gava bi şev kuçe û kolanê Kurdistanê tije jin û mêr, zar û zêç bûn û esmanek ji rengên kes û sor û zer hat avakirin, çawa hêviya me dawerivî dilşahiyê û me çawa ji kêfan hêsirên dilşahiyê barandin.

Piştî bi demeke kurt herçar dewletên ku hertim bi îdeolojiyên totalîter hatine birêvebirin û hertim hêviyên gelên xwe jî şikandine, çawa dest bi tehdîdê kirin û xwestin kêfxweşiya kurdan li şînê bigerînin, hêviya wan ya geş bitemirînin. Her çar dewletên li dijî hev, li ser serên kurdan hatin ser hev û bi carekê ve bûn yek. Bi dilşahiya kurdan xemgîn bûn, xwestin xewna kurdan ya sedsalan li wan biherimîne, wan di nav xemgînî û hiznê de bigerîne. Tehdît li ser tehdîtê anîn ser kurdan û bi hovîtî ajotin ser Kerkûka ku kurdan ji zebaniyên DAEŞê rizgar kiribûn û aramî û ahengiya ziman, dîn û kulturên cihê anîbûnê. Ew hêviya kurdan ya geş bi carekê ve çilmisî, xewa kurdan li wan herimî û ketin nav xemgîniyeke kûr. Bi carekê ve ewrekî reş xwe bi ser kurdan de girt. Hovan êrîşî malên wan kirin, şewitandin û dest bi serjêkirina mirovan kirin. Dinya ket hundirê bêdengiyekê. Gelo dîsa kurd bi tenê mabûn? Kurdên seranserî dinyayê di nav xemgîniyê de vegevizîn. Lê pir neajot ew ewrê reş ji hev feşkilî, ji pişt çiyan rojeke xweş bi narînî bilind bû, zarokên kurdan ên ku hînî azadiyê bûbûn serî hildan û neyarên har ji erda xwe qewirandin. Ew hêviya kurdan ya şikestibû, bi carekê ve geş bû. Aniha, rûyê piraniya kurdan geş, hêviya wan ya pêşerojê xurt e…

# Bi çekên DYA êrişî Kurdan kirin

JIYAN ZAGROS

Rêxistina Paramîlîter Haşdî Şabî ku bi piştgiriya Îranê tevdigere bi artêşa Îraqê re êriş bir ser Kerkûkê di dema êrîşan de trimbêlên leşkerî yên DYAyê bikaranî. Ev yek bala cîhanê jî kişand.

Haşdî Şabî ku li herêmê DAIŞa Şîe tê qebûlkirin dema êrîşî Kerkûkê kir trimbêlên leşkerî yên DYAyê tankên Abrams û Humveesan bikaranîn. Ev yek di dîmenan de jî hatin tomarkirin. Ev çek û tankên DYAyê ji aliyê rojnamegerên li herêmê dixebitin ve hatin dîtin û ji aliyê Konseya Ewlekariya Kurdistanê ve jî di hesabên medyaya civakî de weke dîmen hatin weşandin. Konseya Ewlekariya Kurdistanê di daxûyaniya xwe ya ser medyaya civakî de radigihîne ku: "Haşdî Şebî ya ku bi piştgiriya Îranê tevdigere li devera Mektep Xalid hêza leşkerî bicih dike. Ji bo êrîşî Kerkûkê bikin techîzatên leşkerî yên DYAyê bikar tînin."

Wezareta Pêşmerge jî di derbarê mijarê de daxûyaniyeke nivîskî belav kir û got, DYA ev çek ji bo di şerê li hember DAIŞê de bê bikaranîn dabûn Îranê lê niha ev çek ji bo êrîşa li hember Pêşmerge têne bikaranîn. Wezareta Pêşmerge di berdewamiya daxûyaniya xwe de wiha got: "Em ji hemû aliyan re radigihînin ku Haşda Şebî û Artêşa Îraqê bi tank û çekên DYA û Koalîsyona Hevmeymaniya DAIŞê dabû wan êrîşî Pêşmerge dikin. Di van êrîşan de tankên Abrams, tankên zirxî yên hevpeymanan tên bikaranîn. Di demekê ye de ku Pêşmerge li hember terorîstan şer dikir û di wî şerî de pêdiviya wî bi van çekan hebû lê nedan Pêşmerge û dane Îraqê. Em ji Pêşmergeyên rasteqîn û gelê xwebexş daxwaza bergiriyê û ji bo şikestina van êrîşan daxwaza berxwedanê dikin. Hikûmeta Ibadî yekem berpirsyarê êrîşa li ser gelê Kurdistanê ye û dê berdêla van êrîşan jî heta dawî bide."

> Ev çek û tankên DYA ji aliyê rojnamegerên li herêmê dixebitin ve hatin dîtin û ji aliyê Konseya Ewlekariya Kurdistanê ve jî di hesabên medyaya civakî de weke dîmen hatin weşandin.



**The Washington Times: Hêzên Îraqê Humveeyên DYAyê bikartîne**

Di gotara ya bi îmzeya Carlo Munoz a di The Washington Timesê de hatiye weşandin tê gotin Hêzên Îraqê û Haşda Şabî ya ku girêdayî Îranê ye tank û zirxên Amerîkayê bikaranîne. Di nivîsê de herwiha tê diyarkirin ku Pêşmergeyan jî di dema êrîşan de bergiriya 'Dalgayên êrîşkirinê' bi çekên Amerîkayê ku dabû artêşa Îraqê hatiye kirin. Hat diyarkirin ku 10 tankên Humvees û M1 Abramsek hatin rûxandin.

**Tankên Abrams di rojeva cîhanê de ne**

Çek û tankên DYA ku ji bo şerê li hember DAIŞê dabû Îraqê ji aliyê Haşdî Şabî ve di êrîşên li hember Pêşmerge de hatine bikaranîn û ev yek di rojeva cîhanê de cih girt. Di 20 Cotmehê de Washington Times di gotareke bi îmzeya Carlo Munoz de tê gotin ku Îraq sibeha roja Înê êrîş biriye ser qezaya Altun Kopru ku 30 km li bakurê Kerkûkê ye û di vê êrîşê de çek û tankên Amerîkî bikaranî ye. Di nûçeyê de tê gotin ku ji dehan zaftir tankên Humvees û M1 Abrams hatine rûxandin. Di gotarê de tê gotin ku Haşda Şabî girêdayî Îranê ne.

## 'Rojava Kurd bitenê hiştin'

Êrîşa Artêşa Îraqê û Rêxistina Paramîlîter Haşda Şabî ser Kurdan bi koordînasyona Îranê di çapemeniya cîhanê de deng veda. Kurd ku di şerê DAIŞê de demeke dirêj çalak bûn di vî şerî de ji aliyê Rojava ve bitenê man hatin rexnekirin û weke xeletiyeke stratejîk hat nîrxand.

Di gotara malpera Center For Security Policy de bi îmzeya Frank Gaffney hat weşandin de bitenê hiştina Kurdan hat nirxandin û weke xeletiyeke stratejîk hat dîtin. Di nûçeyê de nerînên Serokê Navenda Polîtîkayên Ewlekariyê Frank Gaffney di derbarê têkiliyên Kurdistan û DYAyê de hatin nivîsandin. Gaffney destnîşan kiriye ku bêdengiya Hikûmeta Trump li hember êrîşa Îraq û Haşdî Şabî ya ku Milîsên Paramîlîter ên Îranê ne weke cihê nîgeraniyê dinirxîne. Ev helwest ji aliyê Trump ve xeletiyeke 'Trajîk' û 'Xeletiyeke stratejîk a mezin e' dibîne wisa didomîne: "Dijminên Kurdan bi giştî dijminên me ne jî." Kurd ne tenê ji aliyê dijminên xwe ve herwiha ji aliyê dijminên me ve jî hatine dorpêçkirin. Bi rastî jî helwesta herî rast ew e ku DYA piştgiriya Kurdistanê bike.

Nivîskar û Lêkolînerê navdar Seth J. Frantsman di 21ê Cotmehê de di gotara xwe ya ku di jpost.com ê de weşandiye de dibêje gelek tankên Humvees ji aliyê Artêşa Îraqê ve hatine bikaranîn. Frantsman dibêje ev yek ji aliyê DYA ve cihê şermê ye û wiha didomîne: "Siyasetmedarên DYA karesata li Bakurê Îraqê rû dide temaşe dikin. Îdareya Herêma Kurdistanê serkeftî û bi îstîkrar e. Herêma Kurdistanê ji bo koçberên ji DAIŞê reviyan bû stargeh û bi sala şirîkê DYA yê herêmî bû." Analîst diyar dike ku gelek Kurd ew weke rastî îxanetê hatine di hesibînin û hinek bangî DYAyê kir ku hinek şîretan li Artêşa Îraqê bike. Divê pirsên tund bê pirsîn ku gelo dixwaze alîkariyan bidomîne an nedomîne.

Analîza Seth J. Frantzman ku di nationalreview.com ê de bi navê 'Gelo polîtîkayên Amerîka cenawirekî afirandin' makaleyke din belav kir û tê dibêje ku di êrîşa roja 20ê Cotmehê serê siba Înê Artêşa Îraqê li hember Pêşmergeyan çekên DYAyê M16an, Humvessan bikaranî ev yek cihê şermê ye ji bo DYAyê. Frantzman di heman makaleya xwe de destnîşan dike ku ji bo Îraq careke din vegere Kerkûkê Fermandarê Supaya Qudsê Qasim Suleymanî, Serokê Mîlîsên Şîe Hadî el- Amîrî û Ebu Mehdi el- Muhandis jî alîkarî kirine.

## Kerkûk bajarekî dîrokî yê Kurdan e

Makaleya ji aliyê Ranj Alaaldin ve di 20ê Cotmehê de di Foreignaffairs.com ê de hatiye weşandin de tê gotin ku Kerkûk bajarekî Kurdistanî yê dîrokî ye. Lê belê di dema rejîma BAASê de demografiya wê hatiye guhertin. Di sala 2014an de Artêşa Îraqê ji bajêr vekişiya û gel bê bergirî hişt lê belê bajar ji aliyê Kurdan ve hat parastin û nehiştin DAIŞ zirarê bide hemwelatiyan. Di nivîsê de herwiha binê vê rastiyê jî tê xêzkirin: "Ev qrîza bîreweriyê ne ji bo Kurda ye lê ji bo Îraqê ye."

# Netanyahu ji bo Kurdan xebatên lobiyê dan destpêkirin

Rayederên Îsraîlê bi boneya ku berjewendiyên Îsraîlê li Bakurê Iraqê hene, pêwistiyê pê dibinin ku çekan bidin Kurdan. Rayedarên Îsraîlê diyar kirin ku Netanyahu ji ber êrîşa artêşa Iraqê a li ser Kurdistanê ji bo piştgiriya Kurdan di nav serokên cîhanê de xebatên lobiyê dike.

Rayederên Îsraîlê ku ji ajansa Reutersê re axivîn dibêjin, Serokê Îsraîlê Benyamin Netanyahu ji bo ku erd bêhtir li ser Kurdan teng nebe xebatên lobiyê dikin. Li gorî vê yekê Îsraîl, ji bilî Amerîkayê di têkiliyê xwe de bi Rûsya, Almanya û Fransayê re li ser vê meseleyê axivîye.

**Rayederên Îsraîlê bi Almanya û Rusyayê re hevdîtin kirin**

Rayederên Îsraîlê diyar dikin ku bi vê armancê Netanyahu bi Seroka Almanya Angela Merkel û Serokê Dewleta Rusya Vladimir Putinê re bi riya telefonê hevdîtin kiriye.

Her wiha rayederên Îsraîlê amaje kirin ku di hevdîtina bi Fransayê re ev mesele hatiye axaftin. Her wisa hat ravekirin ku şêwirmendê ewlehî yê netewî yê Îsraîlê Meir Ben-Shabbat jî ev mijar li Washingtonê bi rayederên rêveberiya Trump re nîqaş kiriye.

Wekî din Wezîrê Îstîxbaratê yê Îsraîlê Yisrael Katz, roja înê di daxuyaniya xwe ya li Radyoya Tel Avivê de gotibû, "Em hewl didin ku êrîşên li ser Kurdan bi dawî bibin û Kurd piştgiriyê didin Rojava û hêjayî vê ne."

**Berjewendiyên Israîlê hene**

Rayederekî ji hikûmeta Netanyahuyê ku nexwest navê xwe bide, diyar kir ku berjewendiyên ewlehiyê yê Îsraîlê li Herêma Kurdistanê hene û dibêje, "ev der ciyekî stratejîk e."

**Armanc ew e ku rê li ber zirarên li herêmê bigirin**

Îsrael Katzê Wezîrê Îstîxbarata Netanyahu jî îro di daxuyaniya xwe ya Radyoya 102 FM a ku li Tel Avivê weşanê dike de wiha axivî "Mesele ew e ku rê li ber êrîşên li ser Kurdan, tunekirina wan, zirarên li ser wan, xweseriya wan û herêmê bê girtin. Ev yek daxwaza, Şiayên li Tirkiye, Îran û Iraqê û daxwaza hêzên din û ya perçeyekî Îraqê ye." Kart berdewamiya axaftina xwe de got, "Helbet serokwezîr ji bo ku Kurd zirarê nebînin bi Amerîka, Rûsya û Fransayê re di têkiliyê de ye."



## Ne diyar e ku Îsraîl piştgiriyê çiqas dide Kurdan

Rayederekî din ê Îsraîlê ku ji Reutersê re axivî, destnîşan dike ku hewldanên Netanyahu 'pêwistiyeke exlaqî ye'. Rayeder dibêje, "Kurd vê piştgiriyê heq dikin, gelekî aligirekî jidil ê Rojavayê ye."

Di nûçeya xwe de Reutersê şîroveyek kir û got Îsraîl Kurdan li dijî welatên ku ji xwe re dijber dibîne wek tampon dibîne û Reutersê ev agahî dan, "Îsraîlê ji sala 1960î û heta niha bi Kurdan re di warê leşkerî, îstîxbaratî û di qada kar de bê deng têkiliyan dimeşîne. Ne diyar e ku hewldanên Netantahu çiqas alîkariya Rêveberiya Herêma Kurdistanê dike. Îsraîla ku Rêveberiya Herêma Kurdistanê ji ber metirsiya Erebên ciranê xwe, pê re nakeve têkiliyên aşkere ne diyar e ku çiqas jê re dibe alîkar"

> Wekî din Wezîrê Îstîxbaratê yê Îsraîlê Yisrael Katz, roja înê di daxuyaniya xwe ya li Radyoya Tel Avivê de gotibû, "Em hewl didin ku êrîşên li ser Kurdan bi dawî bibin û Kurd piştgiriyê didin Rojava û hêjayî vê ne."

# Divê Mafên Kurdan bên parastin

Roja Înê Parlamanetoya Fransayê, pêngavên kontrola hikûmeta navendî ya Iraqê ya ji bo parêzgeha Kerkûkê ku ji aliyê neftê ve dewlemend e şermezar kirin û diyar kirin ku divê Bexda li mafên Kurdan miqate be.

**"Kurdan herêm parastiye"**

Di daxuyaniya xwe de berdevkê Wezarata Karên Derve ya Fransayê Agnes Romatet-Espagne got, "Em dixwazin bila ji mafên Kurdan re hurmeteke tam nişan bidin." Agnes Romatet-Espagne diyar kir ku Kerkûk li derveyî sînorên Bexdayê maye û herêm di 2014an de ji aliyê Kurdan ve ji DAÎŞê hatiye rizgarkirin. Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku divê desthilatiya hêzên Kurdan ji nû ve li ser axê pêk were.

> Agnes Romatet-Espagne diyar kir ku Kerkûk li derveyî sînorên Bexdayê maye û herêm di 2014an de ji aliyê Kurdan ve ji DAÎŞê hatiye rizgarkirin. Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku divê desthilatiya hêzên Kurdan ji nû ve li ser axê pêk were.

**Divê diyalog destpê bikin**

Berdevkê Wezareta Karên Derve ragihand ku Netewên Yekbûyî di derbarê metirsiyên li ser Xurmatûyê, bi darê zorê koçkirina xelkê û wêrankirina mal û kargehên Kurdan fikarên xwe aniye ziman û bang li aliyan kiriye ku di çarçoveya Destûrê de dîyalogan bidin destpêkirin.



Li Diyarbekirê cotkariya pembû

# Makîneyên dûrîtinê şûna karkeran girtiye

■ BERFO GILÎDAX



Dema meriv behsa cotkariyê dike cure cure mehsûl tên hişê meriv. Yek jî van mehsûlan pembû ye. Pembû di şert û mercên taybet de digihêje û ji loma tenê li hin bajaran tê avêtin û yek ji van bajaran Diyarbekir e. Cotkar dibêjin her ku diçe pembû li Diyarbekirê ji ber derfetên avdanî û makîneyên dûrîtinê zêde tê avêtin. Cotkar Veysi Çakmak derbarê avêtin û berhevkirina pembû de ji Heftenameya Basê re axivî.

**“Li gor berê pembû zêde tê avêtin”**

Dema ku em bi Veysi Çakmak re diaxivin hîn dibin ku cotkarê Kurd ev 20 sal zêdetir e ku cotkariyê dike. Çakmak diyar dike ku ji malbata xwe hînî vî karî bûye û ev kar ne li dibistanan; li ba kesên zana û di emrekî ciwan de tên hîn kirin. Çakmak derheqê cotkariya Diyarbekirê de jî wiha diaxive, “Ji zû ve ye ku li Diyarbekirê pembû tê çandin. Berê jî pembû dihat çandin, hema em bibêjin ev 40 sal e pembû heye. Lê berê pembû hindik bû li nêzikî çeman ev mehsûl dihat çandin. Ev 10 sal in ku bîr û sondaj derketine, yanî derfetên avê, avdanî zêde bû ji loma zêdetir tê kirin. Wekî din, li her deverên Diyarbekirê pembû tê avêtin. Ger li cihekî av hebe li her deverê pembû jî çêdibe.”

**Payîzê amadekariya çandiniya pembû tê kirin**

Çakmak wiha behsa amadekariya berî ku pembû bê avêtin û rakirin dike; “Em peşî, berî ku pembû biavêjin, erdê xwe amade dikin. Di vê mehê de yanî di cotmehê de em dest bi amadekariyan dikin û divê şilî, berf, li axê bixe. Dema di nisanê de hewa derket pîleya 18-20an û germ bû em pembû diavêjin û di hezìranê de jî diçinin. Karker bi destan kesaxê dikin û zevî tê gubrekirin û pişt re avdana wê tê kirin. Li gor cureyên (hin cure pembû zû hin dereng vedibin) pembû piştî 3,5 û 4 mehan şûn de tê berhevkirin. Heta meha 10-11an jî pembû li ser erdê heye an bi riya karkeran an jî bi riya makîneyên dirûtinê pembû tê çinîn.”

> Diyarbekir her çiqas bi hin mexsûlên xwe yên navdar ên wekî zebeş bê nasîn jî li vî bajarî pembû jî tê avêtin. Cotkar Veysi Çakmak dibêje, “her ku diçe li Diyarbekirê ji ber derfetên avdanî û makîneyên dûrîtinî pembû zêdetir tê avêtin.”

**“Bi rêbazên dilopandin û avreşandinê tê kirin”**

Çakmak di derbarê usûlên avdanî û gubrekirina pembû de van hûrgiliyan dide, “Pembû hefte carekê tê avdan û heta bê çinîn bi temamî dora 8-9 caran tê avdan. Me berê rêbazên kevn avdanî dikir lê niha bi saya derfetên teknolojiyê rêbazên pêşketî bikar tînin. Em rêbaza dilopandin û avreşandinê (fiskiye) bikar tînin. Helbet hemû cotkar van rêbazan bi kar nayînin. Ji ber ku mesrefên van rêbazan zêde ye û ji loma yên ku derfetên wan hene van rêbazan ava dikin. Li ser meselê ez bibêjim 5 hezar donim erdê kesekî hebe ji bo avakirina van rêbazan 20-25 hezar lîre mesref çê dibe. Di gubrekirina pembû de jî tiştek wisa heye. Hin cotkar du caran yên din jî sê caran pembû gubre dikin.”

**“Îsal bihayê kîloya pembû 2,60 lîre ye”**

Cotkar Çakmak dibêje li gorî qelîteyê, bihayê pembûyê jî diguhêre û wiha axaftina xwe berdewam dike, “Îsal bihayê kîloya pembû 2,60 lîre ye û bihayê tonek pembû jî 2 hezar 600 lîre ye. Wekî din her çiqas li Diyarbekirê febrîqe hebin jî dîsa bo firotinê pêwîstî bi bazara derveyî Diyarbekirê heye. Ji bo ku em bikaribin pembûyê xwe bifiroşin, sîmsar dikevin nabeynê û mesrefên sîmsaran jî heye. Ji ber vê sedemê em pembû hinek erzan difiroşin li gor bazara pembû yên deverên din. Li ser meselê, li Aydın û İzmir pembû zêdetir tê çandin û bihayê wê 3 lîre ye. Pembûyê Diyarbekirê, ji ber ku atolyeyên tekstîlê li Aydin û Dîlokê zêde ne zehftir bo van bajaran tên firotin.”

**“Cotkarî zehmet e”**

Çakmak li ser rewşa cotkarên ku pembû diçînin jî wiha diaxive, “Cotkarî karekî zehmet e, çimkî mesrefen vî karî zêde ne û dîsa divê di emrekî piçûk de bikevî nav vî karî. Cotkarên ku perê wan tune be deyn dikin. Ji sedî 90 cotkar deyn dikin û piştî ku pembû hat çinîn mesrefekî zêde derket wê demê hema pembû ji ber deynan ji destê xwe derdixin. Wekî din, cotkarên ku deynê wan tune be, pembû depo dikin. Dema ku di borsayê de bihayê pembû dibe 3 û 3.5 lîre wê demê pembûyê xwe difiroşin. Lê belê cotkarên wisa li herêma me gelekî hindik in.”

Veysi Çakmak herî dawî destnîşan dike ku berê li Çukurovaya Edenê pembû zêde dihat çandin lê paşê ji ber hin sedeman pembû hindik tê avêtin. Lê ji bilî Riha û Dîlok li herêmê li Diyarbekirê pembû zêdetir tê avêtin.



## Li gorî berê di berhevkirina pembû de guherîn çêbûne

Cotkarê pembû diyar dike ku li gorî berê di berhevkirina pembû de guherîn çêbûne û wiha behsa van guhertinan dike, “Berê karker zêdê bûn, pembû bi riya karkeran dihat berhev kirin lê niha ji ber du sedeman dewsa karkeran zêdetir makîneyên dûrîtinê girtiye. Yek, li gorî berê zeviyên pembû mezin in heta 70î an jî 100 hezar donimî zevî hene. İncax makîne dikare di van zeviyên mezin de pembû rake. Sedema duyem jî ew e ku tevî bi destê karkeran pembû paqij bê rakirin jî lê ji ber mesrefên karkeran makîneyên dûrîtinê zêdetir tê tercih kirin.” Veysi Çakmak destnîşan dike piştî ku pembû hat berhevkirin cotkar pembû dişînin febrîqayên pembû yên li Diyarbekirê. Febrîqe jî pembûyê bo firotinê amade dikin û li ba xwe mihefeza dikin û paşê jî febrîqa van pembûyan difiroşin derveyî bajêr. Mihefezeya pembû zehmet e çimkî jê re depoyên mezin divên.”

# Li Rihayê qubaleya ‘Tûj’ a jinê

■ EMINE ÇETIN

Dema dibêjin riha îsotên wê ya tûj tê bîra mirov. Ava bacanan, îsotên hûrkirî û rîçala îsotê, ji Rihayê ber bi bazarên Kurdistan, Tirkiye û Ewropayê ve diçin. Jinên Rihayî bi dirêjahiya mehekê di nav xebateke dijwar de ne. Di bazara cîhanê de berhemeke taybet a Rihayê ye îsot û sedema vê yekê jî qûbaleya jinan a dirêj e. Bi destpêka meha Îlonê li bajêr bêhneke ‘Tûj’ heye. Ew kesên ji tûjahiyê hez dikin ku îsota Rihayê jî yek ji girîngtirîn berhema wan e. Di meha Nîsanê de tê çandin piştî gihandin û nêrîna wê di meha Tebaxê de tê dirîtin. Di meha Îlonê de tê berhevkirin û bi kamyonan diçe bazaran. Ji bo ava îsotê cuda, ji bo îsota hûrkirî cuda cuda tên belavkirin û jinên ku di vî karî de dixebitin roja 5 an jî deh lîrayê Tirkiyeyê kar dikin.

Jin, di ber tûjahiya wê de îsotan paqij dikin û ji bo ava îsotê jî serê îsotan di makîneyan de hûr dikin. Ew îsota tê hûrkirin bi qasî heftiyekî li ser baniyan tê hişkkirin. Koka îsotan jî ji bo îsotê hûrkirî tê bikaranîn. Ji aliyê jinan ve ji bo ku kuf negire û bi sala bê bikaranîn bi ava zeytê tê hunandin û di bazaran de cihê xwe digire. Tovik ji aliyê jinan ve careke din tên amade kirin. Îsotên ji bo ava îsotê hatine bijartin jî bi çendîn baharatan di nav zeyta sor de tên terbiye kirin. Di bin germa Riha û tûjahiya îsotan jin van xebatan dikin û di bazaran de bi 50 lîrayî diçe lê jin tenê 5 – 10 tl kar dikin.

**“Em heqdestên xebata xwe nastînin”**

Jinên ku debara xwe bi saya îsotan dikin, îsotên ku bûne nîşana Rihayê, bêhtir li herêma Sirriyê dixebitin. Jinên ku ji komkirina wê heya bi paqijkirina wê, ji hêrandina wê heya bi rewşa wê ya dawî tevlî hemû serboriya “Tûj”ê dibin, gazinan dikin ko bergîdana xebata xwe nastînin. Rehîme Serçeya ku di tevahiya meha îlonê de îsot paqij kirine dibêje: “Pêşî em ji werzan didine hev. Paşê em dixine kîsan û dişînin bazaran. Îsotên ku li gorî qalîteya wê bûhayê wê di navbera 40-50 lîreyî de digûhere, dîsa li me vedigere. Îcar jî pêşî em hemûyan dişon û pişt re bi destan hûr dikin. Ku tûjbûna îsotê û germahiya Rihayê digihîje hev, hedana mirovî nayê lê ji neçariyê em dikin. Em hûr dikin û di moşenên hûrkirinê de dihêrin û wan ji bo ku hişk bibin datînin ber tavê. Qurmên wê dibin îsota hişkkirî, gewdeya wê dibe ava îsotê. Em wan jî bi cûreyên biharatan û rûnê sor terbiye dikin û dişînin bazarê. Em vî karî tev ji bo 10 lîreyan dikin, bi rojê. Yên ku vî karî li febrîqeyan dikin jî ji bo 20-30 lîreyan dikin. Elbet eger ku tu di febrîqeyan de kar bibînî, siûda te heye. Lê dema tu nebînî jî tu ji neçariyê bi pereyekî kêmtir dixebitî. Her kesek dibêje ku îsota Rihaye merqe ye, lê belê kes zehmetiyên me nabîne. Em heqdestên xwe nastînin.”

> Di bazara cîhanê de berhemeke taybet a Rihayê ye îsot û sedema vê yekê jî qûbaleya jinan a dirêj e. Bi destpêka meha Îlonê li bajêr bêhneke ‘Tûj’ heye. Ew kesên ji tûjahiyê hez dikin ku îsota Rihayê jî yek ji girîngtirîn berhema wan e. Di meha Nîsanê de tê çandin piştî gihandin û nêrîna wê di meha Tebaxê de tê dirîtin.



## “Em meha Îlonê bi awayekî “Tûj” derbas dikin”

Rahîmê Serçeya tevî sê keçên xwe yên ku emrê wan di navbera 14 û 16an de diguhere, vî karî dike. Zarokên wê jî him ji xebata havînê him jî ji ber ku weke hevalên xwe betlaneyan nake û heqdestên xwe jî nastîne, gazinan dikin. Semra Yilmaz a ku ji zarokatiya xwe ve vî karî dike ji Basê re wiha diaxive: “Em meha Îlonê bi awayekî “Tûj” derbas dikin. Em di hemû astan de dixebitin. Pereyên ku em werdigrin ne li gorî karên me ye. Lê dikanên ku em lê dixebitin ji dêvla heqdestên me zêde bikin, girtina kesên din ji bo kar wek tehdîtê derdixin pêşberî me. Ji neçarî û ji ber qûtê xwe em dengê xwe dernaxin û dixebitin. Ji ber ku deverên taybet ji bo paqijkirinê û xebatê tune ye, em li malên xwe vî karî dikin. Ev derd û kulê vî karî ne bes e, di ser de jî em li malên xwe bi rojan vê bêhna “Tûj” dikişînin. Eger ku ji me re tesîsan ava bikin an jî cihê hilberandinê vekin, em ê neçar nemînin ku li malên xwe vî xebatî bikin.”

Riha ew bajar e ku herî zêde penaberên Sûriyeyî lê dijîn. Rihaya ku bajarê sînor e, her roja ku diçe hejmara penaberan lê zêde dibe, ev jî bûye sedema “keda erzan”. Weke hemû qadên kar, di karê îsotan de jî Sûriyeyî bûne kedkarên keda erzan. Zahîde Guneşa ku li gel heqdestê xwe nastîne, gilî û gazindên xwe wiha bilêv dike: “Li gel hemû zehmetiyên xwe, em rojê 10 lîreyan werdigirin. Dema em karê kargehan digirin ji bo ava îsotê û daxwaza zêdekirina heqdestên xwe dikin, ji me re dibêjin ‘Eger ku hûn qîma xwe bi vî pereyî neînin, em ê Sûriyeyiyan bixebitînin.’ Dema wan dixebitînin jî, rojê 5 an jî 7 lîreyan didin wan. Em ne li dijî karkirina Sûriyeyiyan in. Em tenê daxwaza heqdestê xwe dikin. Her sal em li bendê wan in ku heqdestên me zêde bikin, lê belê tenê lîreyekî an du lîreyan zêde dikin.”

# Îslamîyet de Hişmendîya Sîyasetî

**BAWER SÊWREGÎ**

Çekuya sîyasetî, çekuyêna erebkî ya û çekuya seyîsî ra virazeyaya. Manaya sîyasetî ya verên terbîyekerdişê estoran bo zî, manaya ci ya ke ewro ma zanê, hunerê dîzaynkerdişê karanê dewlet o. Yunanijan heruna na çekuye, çekuya "polîtîka" xebitnaya.

Çekuya hişmendî, zanayişê çîyê ke dormeyê kesî de benê, fehmkerdiş, ferqkerdiş û zanayişêno pêroyî îfade kena.

Yanê wexto ke yew merdim, kar û gureyê ke dormeyê ci de benê ferq bikero, nê kar û gureyan fehm bikero û bi zanayişa bişo(bieşko) nê kar û gureyan îdraq bikero ma şênê vajê ke hişmendîya nê merdimî esta.

Fikrê sîyasetî zî tewr kêmî hendê fikrê dewlete kehan o. Ma şênê vajê ke dewlete û sîyaset eynî wext vejîyayê meydan.

Eke ma behsê hişmendîya sîyasetî bikerê ma vînenê ke hişmendîya sîyasetî goreyê fikir û îdeolojîyanê dewletan vurîyena. Ma do nê nuşteyî de na mesela hetê Îslamîyetî ra tehlîl bikerê.

Qurano Kerîm, sûreya Yusufî ayeta 40ine de wina vano:

"...Hukum ancax ê Ellahî yo. Ey emir kerdo ke şima bê ey kesîrê qûl nêbê(îbadet nêkerê). Dîno tewr raşt no yo. Labelê zafê însanan neyî nêzanê.

Eke kes biwazo goreyê îslamî sîyaset bikero di çî estê ke ganî(gerek) nê di çîyan qet xo vîr ra nêkero.

1-Îdarekarî wexto ke hukum danê ganî bi edalet hukum bikerê.

2-Ganî îstîşareyî qet xo vîr ra nêkerê.

Eke nê di esasî orte ra werzê wexto kes nêşeno behsê îdarekerdişê îslamî bikero. Eke nê di esasî orte ra werzê o îdarekerdiş beno seltenat, beno despotîzm, beno îdarekerdişêno cahîlî.

Însan gerek verê heme çî modelê îdarekerdişê îslamî, zerrî ra qebûl bikero. Dima heyatê Hz. Pêxemberî ra (s.a.v) xo rê nimûneyî bivîno. Nê nimûneyan goreyê çarçoweyêno pêroyî tehlîl bikero û şertanê tarîxîyan zî bîyaro xo çiman ver.

Qebûlkerdişê na modele ra tepîya ganî kes seypêyî û cîyayîya modela îslamî û sîstemanê bînan tesbît bikero û nê fikrî sewbîna însanan rê teblîx bikero.

Ma heyatê pêxemberan ra vînenê ke heme pêxemberan qandê îdarekerdişê komarî hereket kerdo. Yanê teblîxkerdişê dînî ra tepîya gama tewr gird tesîskerdişê sîstemêkê îdarekerdişî yo. Mesela pêxemberê ma Hz. Muhemmed (s.a.v) wexto ke hîcretê medîna keno mislimanan rê yew çarşî virazeno, yahûdî û erebanê (ê yê ke hema misliman nêbîyê) Medînaya yew wesîqa keno îmza û şerîetê Îslamî Medîna de keno hakîm.

Ewro mislimanê ke wazenê derheqê sîyasetî de wayîrê fikirî bê, gerek wesîqayê Medîne xo rê sey binge bivînê.

Eke ma hişmendîya sîyasetî ya Îslamî goreyê Quran û sunnetî tehlîl bikerê, ma şênê 4 prensîban tesbît bikerê.

1-Prensîbê Bîat û Azadî

2-Prensîbê Edalet û Ehlyetî

3-Prensîbê Muşawereyî/Îstîşareyî/Şûrayî

4-Prensîbê goreyê hukmê Ellahî îdarekerdişî

### Prensîbê Bîat û Azadî

Bi kilmî bîat pêya qewlkerdiş o. Merdimî yê ke do îdare bibê hemverê pawitişê gan, mal û namûsî îdarekaran rê îteatkerdişî ser ro qewl kenê. Kes eşkeno vajo ke bîat; qewlêko komarî yo. Goreyê Îslamî bîat, bi zora nêbeno û heta ke îdarekarî raya Ellahî de bê bîat beno. Eke îdarekarî raya Ellahî ra bivejîyê û bibê zalim înan rê îteat ney, îsyan ferz o.

### Prensîbê Edalet û Ehlyetî

Nê prensîbî de ayeta bingeyîn Nîsa 58 a. "Ellah şima rê emir keno ke, şima emanetan biqetîyet bidê ehîlanê ci û wexto ke şima mabênê însanan de hukum danê bi edaleta hukum bidê. Biraştî Ellah, bi neya şima rê nesîhetêko çi weş dano. Bêguman Ellah, biheqqa eşnaweno û biheqqa vîneno." (Nîsa-58)

Goreyê na ayet sîyasetê îslamî de gerek qandê heme maqaman lîyaqat esas bo. Bê lîyaqat, bi torpîla kes nêro qedemeyênê dewlete. Ê didin, îdarekarî wexto ke mabênê însanan de hukum danê gerek bi edaleta hukum bidê. No edalet zî edaletêno winîyo ke Ellahû teala sureya Nîsa ayeta 135î de behsê nê edaletî keno.

"Gelê mumînan, aleyhê şima de, yê maye û pîyê şima de û yê merdimandê şima de bo zî, qandê Ellahî bibê şahîd û edaletî pay ra vindarnê. (Ê yê ke şima kenê derheqê ci hukum bidê) wazenê wa maldarî bê wazenê wa feqîrî bê (bê edaletî mekerê). Çunke Ellah hurdinan rê zî hîna nêzdî yo. Eke winî yo wextê caardişê edaletî de nefsê xo dim mekewê. Eke (şima wextê şahîdeyî de raşteyî) bixeripnê yan zî (şahîdey ra) dûrî kewê bizanê ke Ellah çîyo ke şima kerdo bi heqqa zano.(Nîsa-135)

### Prensîbê Mişawereyî/Îstîşareyî/Şûrayî

Ferzîyetê mişawere û şûra zaf cayanê Quranî de esto û Hz. Pêxemberî zî heyatê xo de zaf qîymet dayo nê di çîyan. Nê meseleyan ser ro sûreya Alî-Îmranî ayeta 159î de Ellahû Teâlâ wina vano:

"... eke ti merdimêno qeba bîyayê û zerrîya to zî wişk bîyayê ê do çorşmeyê to ra vilabîyayê. Hinî înan efu ke û înan rê Ellahî ra mexfîret biwaze. Wexto ke ti kenê karên bikerê înana mişawere bike."

Tîya de di çî diqetê ma ancenê. Yew: ganî merdimêno misliman qeba û zerrîwişk nêbo ê didin: wexto ke kes keno karên bikero însanana mişawere bikero. No qaîde heyatê mayê sosyalî de zî sîyasî de zî ganî ma rê bibo binge.

Qaîdeyo ke ma cor ra behsê ci kerd şexsî yo. Wexto ke ma behsê komara îslamî bikerê sûreya Şura vejîyena ma ver. Sûreya Şûra mabênê ayetanê 36 û 39î de Ellahû Teâlâ wina vano:

"(Qandê Dinya) şima rê çi çî deyayo no qandê heyatê na dinî yo. Ê yê Ellahî hete de yê, tewr xeyrin û tewr mendoxî yê. No mukefat (qandê ê kesano ke ê) bawerî kenê, Rebdê xo rê tewekkul kenê gunayanê girdan ra û karanê pîsan ra xo pawenê, wexto ke hêrs bê efkarî yê, goşdanê vengdayişê Rebdê xo, nimazê xo raşteraşt kenê, karê xo bi şûra ya kenê, riziqo ke ma dayo ci ey rayda Ellahî de xerc kenê û wexto ke ci rê hêrişê bêro hetkareya pê kenê.

Nê ayetan de zî ma vînenê ke Ellahû Teala îstîşareyî rê zaf qîymet dano û wazeno ke ma karanê xo bi şûraya bikerê.



Ma heyatê pêxemberan ra vînenê ke heme pêxemberan qandê îdarekerdişê komarî hereket kerdo. Yanê teblîxkerdişê dînî ra tepîya gama tewr gird tesîskerdişê sîstemêkê îdarekerdişî yo. Mesela pêxemberê ma Hz. Muhemmed (s.a.v) wexto ke hîcretê medîna keno mislimanan rê yew çarşî virazeno, yahûdî û erebanê (ê yê ke hema misliman nêbîyê) Medînaya yew wesîqa keno îmza û şerîetê Îslamî Medîna de keno hakîm.

## Prensîbê goreyê hukmê Ellahî îdarekerdişî

Gerek ma Qurano Kerîmî xo rê zey çimeya qebûl bikerê û heme karanê xo Quranî ra perskerê. Otorîteyo ke qaîdeyan keno bellî Ellah o. Resûlellahî zî nê qaîdeyî heyatê xo mîyan de pratîze kerdê. Qandê coy wexto ke jew mesela ser ro kes biwazo hukum bido gerek biewnîyo Quran û Sunnetî ra.

Çunke Ellahû Teala Qurano Kerîm de wina wazeno.

Maîde-44: "Ê yê ke bi hukmê Ellahî ya hukum nêkenê kafîrî yê".

Maîde-45: "Ê yê ke bi hukmê Ellahî ya hukum nêkenê zalimî yê".

Maîde-47: "Ê yê ke bi hukmê Ellahî ya hukum nêkenê fasiqî yê".

Enfal-24: "Gelê mumînan, wexto ke şima dawet kenê çîyo ke şima rê heyat bido, goş bidê vengdayişê Ellah û Resûlê ey û bizanê ke Ellah kewno mabênê însan û zerrîya ci. Fina bizanê ke şima do ey ver ro kom bîbê.

Alî Îmran-132: "Ellahî rê û pêxemberî rê îteat bikerê ke wa şima rê bi merhemeta muamela bibo.

Haşr/7: "Pêxember şima rê çi çî dano ey bigîrê û çi çî ra nehy keno ey ra dûrî kewê.

Seke ayetanê corînan de zî aseno, wexto ke însan keno yew mesela ser ro hukum bido gerek goreyê Quran û Sunnetî hereket bikero. Herçiqas tayê merdimê selefî nê ayetan îstîsmar bikerê zî, eke ma bi çimêko pêroyîya biewnîyê Qurano Kerîm ra, ma vînenê ke; hukmê Ellahî tena edalet o.

Eke kes musluman bo, ganî ziwanê yewna kesî înkar û asîmîle nêkero.

Eke kes musluman bo, ganî seba her kesî bi edalet hukum bido.

Eke kes musluman bo, seba xo çi wazeno ganî seba birayanê xo yê muslumanan zî eynî çî biwazo.

Eke kes musluman bo, ganî bi kuştox û zaliman îtîfaq nêkero û nêşiro muslumanan ser...

Eke kes musluman bo, ganî însanan rê nêvajo; "eke ma berê xo bigîrê şima do bi vêşanî û têşanî ra bimirê."

Eke kes musluman bo, yew welatî nêkeno çar parçeyî û her parçe de zilm û zordarî nêano însanan ser...

Vatena temam ehmaqan rê vajêna... Bi selam û duayan a... Bimanîn weşîye de...

# Reyê Ez Ginaybî Waro

**SEZGÎN FIRAT**

Eke olîmpîyatan de beşê warroginayîşî bibîyêne înan xelata yewîyîye dayêne mi. Ez zên nêkena kes sey mi waro ginayo. Ney birayêne... Şima çimanê xo winî mêverde de. Heq bo xelata yewîyîye yê min a. Şima ra kam sey mi ginayo waro ke xelata tewr pîle yê ey/aye bibo? Bîsîklete ra kewtiş? Tew!... Zafê şima nika vanê "Bira bira, ez winî ginaya waro ke zanîyanê mi ra gonî pijiqîyayêne." Beno ke tayê şima hesûdîye ver mîyan ra raqilaşîyê û vajê ' Par ney perar, serdê zimistanî de ez ginaybî waro, cemed zeliqîyaybî qina mi ra û hezar hekîman nêeşkayî cêr a bikero." Qet xo ser pêser mêkerê birayêne. Warroginayîş sey yê şima nêbeno. Zanîyan ra gonî pijiqiyayiş, qine ra cemed zeliqiyayiş çik o ke ez yê şima sey kewtişê rastî bihesibnê. Warroginayîşo ke ey ra pey pişkanê merdimî ra gonî nêrişiyena qet beno warroginayîş? Heqo bêlom bo. Kelaxê rê leyîrê xo sey helîyê çalî asenê. Hela goş mi ser nê. Warroginayîş senê beno ez şima ra vajî. Vajî ke wa vengê şima bibirîyo.

Vanê ke kemere cayê xo de giran a. Mêvajêne birayêne mêvajêne... Derd û kulanê mi mêzednê. Ma kî dewa xo de kemera girane bîbîme. 'Şit' î ra nat... Vera vayanê qewetinan de ma cuya xo domnayêne. Ma hezar rayî musaybî. Ge ma pişta xo, ge vernîya xo şanayêne vayî ver ke wa o tayê heyfê xo bigêro. Vayî bi xo kî hezar rayî musaybî birayêne. Rojê vayî şewat şanitibî verê xo, kemer û kuç, dar û ber, teyr û tûr, çi ke kewt dest veşnabî û eştibî kuncik. Înanê ke xo ci ra xelisnaybî, amayê nê cayê xerîbî de restê peynîye. Ma kî ê bibextan ra bîbîme. Eke ci ra bibextîye bivajîyo. Ez bîya, xanima mi bîye, lew nanê destanê şima ra di tenê kî leyîrê ma bîy.

Ez o feqir... Dewe de bîyêne hêga ramitêne, pesan çiraynayêne mi ra pers bikerê. La îta de nê karî pere nêkenê birayêne. Bekarîye bîya gonî, zeliqîyaye pêsîrê mi ra. Bêkarîye, birayêne, wext o ke merdim eraqê çareyê xo seba yê bînan birijno, o wext mumkin o. Dewanê sey yê ma de bêkarîye cuye ra visîyayîş o. Merdim ke merd o wext bêkar maneno. La îta? Yew termînê cuye yo û bekarîye bi xo karêko zaf zehmetin o. Ganî merdim roja xo baş eyar bikero ke wa bêhêvîyîye pêşkarê ci mêbo. Merdim heme seatanê roje ser o bifikirîyo ke ê seatan senî ravîyarno. Sewbîna, peynîya xo hêdî-hêdî merden a. Yê mi lêlê şodirî ra dima embazan reyde têlewe amayîş bî. Embaz vana ez, xora ziwan winî musayo, esas cîranê min ê. Ma ra kamî ke koç kerd, leyê cîrananê xo de vejîno mîyan. Derezayî, warezayî, apî, xalî, xalikî... Pêro yew cayî de kom benê. Mi kî keyeyê xo ardibî leyê derezayê xo.

Asmên de hewrî reqesîyayêne. Rojêka serde bîye. Yarenîye, ax û wax kerdiş kewtêne têmîyan.

-Ero Mirad, na pirnika xo tayê bota bere, kes nêaseno...

-Kelmîzo boyîn... Gîye qina xo ra tersena coka ti pirnika mi pilosnena fekê xo ra, ney?

Mirad û Elî winî yewbînan ardêne berdêne, mi dî derezayê mi huyayîş fiştibî rîyê xo ra, ver bi ma amayêne.

-Raurzê, karê ma esto.

-Xeyr o dereza?

Ey ma şanitibî verê xo û raye ra ma rê kare ma qiseykerdibî. Ma do yew banê zafqatinî siwax bikerdêne.

Ney birayêne... Siwax kerdene karê mi nîyo.

-Ero înanê ke nê bonê ke asenê siwax kerdî, no kar mayanê xo ra musayo? Nêmeyê bananê nê bajarî şarê ma viraşto.

Vanê derezayî nêmeyê birayî yê. Ganî merdim vatena înan bikero. Ma şîy birayêne. Ti vana qey banê Heqî yo. Sereyê xo mîyanê hewran de nimitîbî. Merdim ke ewnîyayêne ci ra hişê xo şîyêne.

Axirî ma dest bi karî kerd. Ez û Mirad, ma pîya vejîyayîme yew iskela ser. Mi hetêk ra kilame vatêne hêtek ra ki bi melik dêsî kutêne.

Ez o şîyo Erzînganî

Sûka Erzînganî

Yara xo ra cila beno

Mi ke nê qismê kilame vatêne, melikê xo bi xerç kerdêne pirr, tayê vindertêne û kilame ke qedîyayêne mi xercê melikî zeliqnayêne dêsî ro. Badê cû mi reyna dest bi kilame kerdêne.

Nere di-hîrê naye cêr ra yênê

Pepo pepo



Gula min a tey a

Rindeka min a tey a

Keyfê mi ca de bî. Se nêbo birayêne. Wext ke vîyart, xebîtîyayîşê mi tenêna bî xurt. Endî kes mi pê mêgero. Seke yew qeşmer layî ser o bi xorabawerbîyayîşê bêsînor bero-şoro, mi kî eynî o qayde îskela ser o ge xo eştêne o het, ge eştêne no het. Dumano sîya mi nêgêro. Xorabawerbîyayîşo bêsînor çîyode baş nîyo birayêne. Willay merdimî qineserkî dano ronîştene.

Duştê qinesteyê ma de yew asin verardkî dusnîyaybî îskela ra. Beso, ney?

Xwezila mi a cixare nêfîştêne ta, ci ra bîna xorîne nêgirewtêne, xo nêdusnayêne îskela ra. Pepûg de mi rê biwano. Mi çi zana ke asinê duştê qinesteyê mi winî sist o? Asinî senî ke îskela ra xelisîya ra, senî qayde teq û req kerd mi nêzana. Mîyanê sanîyeyan de asin ver de ez kî pey de ma qelibîyayîme yewbînan ra. Birayêne, mi şima ra nêvat warroginayiş sey yê şima nîyo? Qatê pancêsinî ra kewtîş? Xiziro kal! Ti biresê. Eke herînda mi de şima bibîyêne xof kewtêne zerreyê şima, ney? Se ra se... Beno ke mîza şima, şima ra ver biginayêne erdî ro. Tayê şima kî boye bifiştêne tumananê xo ra?

Mi? Şima wazenê bawer bikê, wazenê bawer mekerê. Mi ancîya kilama xo ya verêne vatêne. Qaydeyê xo eynî la qiseyê xo vurîyaye bîy.

Ero ez û asinî ra cor ra yêmê

Pepo pepo

Emrê min o kilm

Hetanî ke mi tondayîşê erdî pişta xo de hîs kerd mi na kilame vatêne.

-Lawo biremê!.... Bawer gina waro!...

Vengê Miradî bî. Hemîne mi ser o kom bîbî. Kam ke amayêne mi ser, dayêne çokanê xo ra, gamê-di gamî peyser eştêne, reyna xo çarnayêne mi het hela o yo ke înan dîyo raşt o yan ney? Eke înan bawerîya xo bi kewtena mi ardêne, dest eştêne dev-rîyê xo, por-mor serê ra qilaynayêne ra. Hawar, ax, wax, bira, keko, bêbext.... Nê çekuyan asmênî kutêne.

Ganxelasker çi wext ame? Ey ez senî berda nêweşxane? Hekîman ez senî amelîyat kerda? Esteyê min ê şîkîyayeyî reyna senî zeliqîyayê yewbînan ra? Nê persî pero bêcewab bîy.

Perso ke cewabê xo esto wina bî.

-Se bîyo?

Cewab: Bawer kewto la nêmerdo

**MIRAZ BABIJ**

82 Kerkûk 83 Mûsil, 84 Los Angeles..

82 Kerkûk, 83 Musul, 84 Los Angeles, 85 Londra... Xelet fehm mekerê gelê wendoxanê erjeyayeyan, nê merdimî hetê Îraqê yekpareyî yê. Sebrê Baxçelî nêameyo o yo xo rê plakayan humareno. Eke winî nêbo yew merdim vejîyeno û vano; "la oxlim siz toprax bütünlüxi diyisız ama iki deqqada kendinize baxladiz."

Seke şîma zî zanê, 25ê êlûle de Kurdîstanê Başûrî de yew referandum virazeya. No referandum tarîxê kurdan de sey yew rîpelêko pak û newe bi. Ma qerarê referandumî ra tepêşê heta roja referandumî û badê ci xeylê reaksîyonî deyayî û rind xirab referandum virazeya. Reaksîyono tewr pîl zî hetê dewletanê ke erdê kurdan kerdê parçe ra deya. Îran û Tirkîya yê ke meseleya Surîye de yewbînana şer kerdên ameyî pêhet û waşt ke ne referandumî betalkerê. Tîrkîya ya ke heta vizêr dewleta Îraqî sey dewlete qebûl nêkerdên, xo resna Îraq û va ke; "ma nêwazenê ke Îraq parçe bo." Û mîyanê Tirkîya de çi dîndar, çi çepgir, çi raştgir û çi zî sîyasîyê bînî estê heme bî sey pê û sey koroyên, humaritişê plakayan dest pakerd…

82 Kerkûk, 83 Mûsil, 84 Los Angeles, 85 Londra… Xelet fehm mekerê gelê wendoxanê erjeyayeyan, nê merdimî hetê Îraqê yekpareyî yê. Sebrê Baxçelî nêameyo o yo xo rê plakayan humareno. Eke winî nêbo yew merdim vejîyeno û vano; "la oxlim siz toprax bütünlüxi diyisız ama iki deqqada kendinize baxladiz."

Wîna humaritişa rojî ravêrdî û seke şima pêro zî zanê, referandumê xoserîya Kurdîstanî hetê şaranê ke Kurdîstan de ciwênê ra %90 vêşêrî reyî girewtî. Nê şaran mîyan de bêguman tirkî zî erebî zî estbî. Xora pusulayê reyan de çar ziwanî estî bî ke no hal tena renginî ya Kurdîstanî îfade kerdişî rê bes o. Belê Kurdîstan rengin o la çi heyf ke dormeyê ci heme sîya û tarî yo. Reyna masayî ronîyayî û planê ke verê ney se serre virazeyayî bî reyna ameyî tekrarkerdiş.

Haşdî Şabî yo wehşî yo ke sey daeşî gellek merdimî kiştî bî û namusê xeylê merdiman kerd bî payîmal – ke nê kesan mîyan de hezarana turkmenî zî estê- hetê tayê medyayê Tirkîya ra sey qehreman ame lansekerdiş. Nê mensubê medyayê ke ultra musluman, ultra sosyalîst û ultra humanîst bî waştê ke, Haşdî Şabî êrişê Kurdîstanî bikero û "zerrîya înan a faşîst honik bo". Çi heyf ke wina zî bî, leşkerê Îraqî yê ke Tîkrît, Musul û sewbîna cayan de namûsê xo şewê mîyan de teslîmê daêşî kerd bi, bi hetkarîya gellek dewlete û organîzasyonan êrişê Kerkûk kerd û Kerkûk destanê pêşmergeyan ra girewt.

Beno ke heta no nuşte biweşaneyo pêşmerge reyna ser bikewo û pey de zî bigîro, (înşellah) labelê tîya de çîyo enteresan o yo ke; dewletê serdestî nêwazenê ke kurdî yew dewe de daxîl azad bê û tamê xoserî bigîrê. Çi wext îxtîmalê azadîya kurdan beno, nê dewletî sey verganê vêşanan arê benê pêser û wazenê ke nefesê kurdan bipeysnê. Û wexto ke mewzuyê behsî kurdî benê heme fikir, îdeolojî û fraksîyonî xo kenê vindî, heme prensîbanê xo xo vîr ra kenê û pêro benê faşîst.

Mesela; 28ê Sibatê 1997î de derbeyêk ra tepîya muslumanî yê ke sîstemî ra derbî werdên û ci rê vajeyayên; " Yallah Arabîstan'a" nika kurdanê Tirkîya rê vanê; "Yallah Erbîl'e"… Mesela; çepgirê ke wextê "Gezî" sîstemî ra derbî werdên û ci rê vajeyayên; "Alkolîk Çapulcular" nika Kurdîstanê Başûrî rê rê vanê; "Kabîle Devletî"… Mesela Baxçelî yo ke heta vizêr bi behsê "Püskevit"î cîya henekî ameyên kerdiş nika sey qehremanêko milî hesibîyeno…

No rîyê însana o nimite xora ma zanayên labelê nê prosesî xeyle maskeyî zî rîyanê merdiman ra tayê maskeyî zî fînayî. Eke ma de tayê vîr bibo ma hinî kesîya nêxapeyenê û çi dîn çi zî îdeolojîyê xo nê sextekaran ra nêmusenê… Eke vîrê ma çin bo zî ma xora rezîl ê, na rezîlî heta torinanê ma dewam kena…

Kesê ke na rayîr de tayê çîyan ra tersenê zî cewabê xo wa mi ra nêpawê, Baba Tahir cewabê înan dano…

"Her o yo ke aşiq o gan ra nêterseno
Aşiq zincîre û zîndan ra nêterseno
Zerrîya aşiqî sey vergê vêşanî ya
Ke o heyheya şiwanî ra neterseno."

Kam o ke heyheya şiwanan ra terseno yan o aşiq nîyo yan zî eşqê ey eşqêko zurayî yo. Zerrîya xo rê, eşqê xo rê û vîrê xo rê wayîr bivejîyê… Weş û war bimanê…

# Beyi Se Bena?

SELMA DOGU

Beyi Se Bena? nameyê kitabê J. İhsan Esparî yo. Na hikaye, tewr verî kovara Vateyî de hûmara 2, 3, û 4. de hîrê qisim de weşanîyaya. Badê cû na hîkaye bi eynî nameyî 2004 de, Îstanbul de, hetê Weşanxaneyê Vateyî ra sey kitabêk neşr bîya. No kitab de tena yew hîkaye esta. Kitab, 62 rîpelî yo.

Hîkaye de mewzû qerhremana ma ya Beyi ser o dest pêkeno û uca ra vila beno. Beyi, veyva Hesen Axayî ya. Mêrdeyê Beyi Serdar şono esker. Badê xebere yena ke Serdarî kewto laser û vîndî bîyo. Tu kes meyîtê Serdarî nêvîneno. Heme dewe Serdarî ra hêvîya xo birnenê û vanê o miheqeq merdo. Hesen Axa, Beyi lajê xo yê bînî Bengî rê dano mare kerdiş. Bengî zewejnaye yo. Beyi zaf xemgîn bena. No semed ra Beyi wazena ke xo axur de bixeniqna. Feqet vistewrîya Beyi aye xeniqnayîş ra xelisnena.

Beyntarî ra çend rojî vîyarenê. Rojêk cendermeyî yenê dewe û yew cenderme Beyî serê ortmeyî de vîneno û aye rê çîm şikneno. Bengî zî na rewşa cendermeyî vîneno û ey kuweno. Na hedîse ra dima Başçawuş yeno û Bengî dekeweno hepis. Seba ke di lajê Hesen Axayî wîna bene, dewe de derheqê Beyi de zaf qalê nêbaş vajîyenê. Keyeyê Hesen Axayî de huzur nêmaneno. Badê wextanêk ra xebere yena ke Serdarî nêmerdo. Hîkaye bi na xebere qedîyena.

Na hîkaye heme hetanî ra nimûneyêk zaf baş a. Çunke hem hetê ziwanî ra hem zî hetê babete ra zaf bi îtîna nusîyaya. Ma na hîkaye de rewşa kurdan zaf weş vînenê. Ciwîyayîşê kurdan, edetê kurdan, ziwanê kurdan, kemanîya kurdan mîyanê hîkaye de cayê xo zaf baş girewtê.

Hetê ziwanî ra hîkaye zaf standard nîya. Çunke na hîkaye wexto ke weşanîyaybî derheqê kirmanckî de tayê çîyê standardî hema tespît nêbîbîy. La wexto ke ma na hîkaye wanenê ma hîkaye bi rehetî fehm kenê. Hîkaye de tayê çekuyî ke ganî pîya binusîyê, cîya nusîyayê. Nimûne: dim a (r. 40), ver a (r. 25), te de (r. 19)


Nuştoxî zemîrê îşaretî, tayê edat û bestoxî goreyê mintiqaya xo şuxulnayê. Mavajî, herinda edatê "bi" de "ebi" , herinda zemîrê îşaretî "a" de "aw" , herinda bestoxî "ke" de "ki" şuxulnayê.

Nuştoxî, tayê çekuyî goreyê formê mintiqaya xo şuxulnayê, nînan ra çend nimûney: tetun (r. 9), çimkî (r. 29), xu (r. 29), sibhay (r. 30)

Nuştoxî, zaf cayan de zewtî, duayî, çekuyê diletey î, îdyomî û vateyê verênan şuxulnayê. Ma ziwanê nuştoxî de dewlemendîya ziwanê kirmanckî zaf asan vînenê. Hîkaye de çekuyê diletey î gelek cayan de vîyarenî. Nimûne: seki-seke (r. 25), hilç û hilça (r. 25), hazir û nazir (r. 30), karm û kez (r. 30), taket- naket (r. 32), qure-murey (r. 40), naşt-daşta (r. 55), kerr û lal (r. 48)

Ma şênê zewtan ra çend nimûneyan bida: "Hesê, mela kerm û kêzî bikewî gandê to! Mela awka sîyay bikewa çimanê to! Mela ti qendîla xo di biqerefîya cenêkî!"

Goreyê mi Beyi Se Bena? mîyanê hîkayeyanê kirmanckî yê modernî de zaf nimûneyêka muhîm a. Cunke hîkayeyêka realîst a û bi ziwanê şarî nusîyaya. Îfadekerdişê nuştoxî, babeta hîkaye û şuxulnayîşê ziwanî ganî ma rê bibo model.




Na hîkaye hetê şuxulnayîşê îdyoman ra gelek muhîm a. Çunke nuştoxî hîkayeya xo de vernî ra heta peynî îdyomê ke mîyanê şarî de yenê vatiş şuxulnayê û no tercîh zî hikaye hîna zedê erjayê keno. Ez wazena ke îdyomê ke kitab de mîyanê cumleyan de kamcîn rîpelî de senî vîyarenê bi çend nimûneyan nişan bida:

Porê sipî kerdene: Heyana ki tetun erînaynî çend muyê porê rotoxî sipî kerdinî. (r. 9)

Fek ci ra veradayene: Hesenî hinî fek zewacî ra verra dayo. (r. 11)

Telîyan ser o ronîştene: Herçiqas ki Hesen nêano xo ser zî seki teluyan ser o ronîşte bo. (r. 15)

Zîr û zeberê çî vetene: Ti çirê endi heme çî meraq kenî, wazenî zîr û zeberê heme çî vejî. (r. 25)

Kewçika kesî de vejîyayene: Ti çi rê kewçika mi di vejîyêna? (r. 38)

Qeseba çizayene: Beyi ra ewnîyay, qesebay aye çizay. (r. 56)

Ez wazena ke teşbîhkerdişî nuştoxî ra yew nimûne bida: Qisey qirika ey di bîbîy se yew gira û ewca mendbî. (r. 36)

# Kêmasîya Ziwanê Ma

LORÎN DEMÎREL

Zaf manayê ziwanî estê. Organê ma yo ke ma bi ey çîyanê werdişan tehm kenê. Manaya xo ya bîne kî mîyanê merdîman de bi wasitayê komunîkasyonî yo. Oyo ke ez nika wazena ser o vinderî hetê ey yo ziwannasî yo. Her komel wayîrê edet û toreyan o. Bingeyê xezinaya kulturê miletî ziwan bi xo yo ke tede çekuyî, îdyomî, sanikî meseleyi ûêb. estê. Kokê înan reseno bi seyan serranê verê cû. Naye ra yo ke kes nêeşkeno edet, tore, mesel, Mîsal Dêrsim de vanê "zonê ma zonê Xizirî yo." Kam besekeno naye bivurno û destê kamî ra yeno ke na vatena fekê şarê Dêrsimî bivurno? Dua û zewtê her ziwanî qiseykeredoxanê ziwanê ê ziwanî rê tehmêko weş danê. Ma ke doman bîme, dewe de maya ma, ma rê sanikî vatêne. Ê sanikî sey awa zelale heriqîyayêne mezgê ma. ê lawikê (deyîrê) ke ameyêne vatene, manaya înan de efsaneyê hezar serran estbîy. Merdim û Heq estbîy. Ez zanena nika şima vane "yaw ti se vana ?" La henî nîyo. Yew deqa cayê xo de vinderê. Qisey kerdena maya xo, bav û kalikanê xo bîyarî xo vîrî înan çitur/senî qisey kerdene? Kamcîn çekuye fekê înan de kamcîn mana girewtêne? Ma, nesle nê dewrî çitur qisey kenîme? Hîşê ma bîyo bîyo têmîyan ro. M fehm nêkenîme ke çi bîyo û çi beno. Ma çitur verê înan kerd ra? Nê ke dormeyê ma de sey verganê yabanan fetelînê/gêrenê, ma ziwanê xo çitur verdamê destê înan. Her kes yew hetî ra ziwanê ma girewto sey yew domano saye. Eke nîya şoro ziwanê ma zerar vîneno û xeripîyeno. O wext ma ganî sê bikerîme? Eke nîyadewam bikero şima teyna ney domanê şima kî bê ziwan manenê. Ma no ziwan mayan û pîyanê xo ra musayîme. Peyra şaristanê pîlan de nuştîş û wendişê ey mamostayanê erjayan ra musayîme. Her kes kî zaneno ke barê şaristananê pîlan sey înan pîl o. La nê mamostayan seba ke ziwanê ma, ma rê bimusne kar û barê xo caverday. Ganî her ca de kam beno wa bibo û hes bikero yan nêkero heqê nê mamostayan teslîm bikero. Çunke vate vîndî beno la nuşte cayê xo de maneno.



> Şima bizanê ke ma kurdî sey yew lape genim îme kamcîn het ra wila bibîme kî serê nê erdê dewrêşî de gil danîme û benîme zêde. Ma bilasebeb hende zehmet nêwenîme, derde ma no yo ke a roje nêro û ma nêvajîme ke "Welê sereyê ma rê bivoro! Ziwanê ma merdo!'.

Ney ra vîst serrî verê cû tena Ewropa de kitab, rojname û kovarî ameyêne weşanayene. Nika Îstanbul, Amed, Mêrdîn, Çewlîg, Dersîm û cayanê bînan de rojname û kovarî axir qasê serranê verênan nêbê kî vejînê. Her serrî neşrbîyayene kitaban beno zêde. Ganî ma ney bivînîme. Nînan de keda pîle esta. Her kes bi rastîya xo no rayîrê çetinî ra şono. No rayîr ke dormeyê xo de têlî, mar û milawûnî estê. No rayîr, rayîrê nuştîş, edebîyat û gramerê kirmanckî yo. O ziwano ke bi seyan serran îmaknê nuştişî ra apey mendo. Zulm ê zexto ke qewmê ey ser o bîyo ver ey zî zerra dîyo. Wextanê verênan de bi ey tek-tûk çî nusîyayo. Tesîrê înan zî maneno wehayanê çolan. Axir teşanîya ma yê nêçaran rê derman beno la çol û çolistanê ma rê çare çîn o.

Naye ra serran ver çend mamosta, rayber û pîrê ma dest pêkerdo û şîîrî, romanî û hîkayeyê ma nuştê. Înan ra dima çend kesê bînî zî rêça înan ra şîyê. Çend kitab û nuşteyê ke înan kerd nuştî, bi sayeyê înan dêsê kirmanckî bineyna bî berz. Nika kî destê kamî ra çi ke yeno, her kes keno ke no dês hîna berz bo. Hende kes seba aye kede wenê no hal de kirmanckî çitur beno vînd? Mi ra vajê çitur?

Ez ê kesanê ke vanê kirmanckî beno vîndî û bi Unesco dewam kenê yanî rastîya ci heskerdoxanê kirmankî yê lafazanan rê vana ke şima rind bizanê eke şima keda mamostayan, rayberan û pîranê ma nêvîne Heq vîneno. Şima bizanê ke ma kurdî sey yew lape genim mîme kamcîn het ra wila bibîme kî serê nê erdê dewrêşî de gil danîme û benîme zêde. Ma bilasebeb hende zehmet nêwenîme derde ma no yo ke a roje nêro û ma nêvajîme ke "Welê sereyê ma rê bivoro! Ziwanê ma merdo!'.


Naye ra hewt serrî verê cû, unîversîteya Mêrdînî de kursê wanebêjanê (okutmanlık) rabibî. Mi bawer nêkerdêne ke no welat de îmtîhanê kirmanckî bibo û ez kî beşdarê ey bibîne û peynîye de serfiraz bîyêne. Dime ra kî mi uca de lîsanso berz qedena. Merdînî ra dima Dêrsim, Çewlîg de û Mûş de beşê kirmanckî û kurmanckî bîy ra.

Unîversîteya Merdînî de 2010î ra hetanî ewro belkî 2-3 hêzarî ra zêdeyêr wendoxî no qedena. Ninan ra kurmancî, kirmanckî musayî, kirmancî/zazayî zî kurmanckî musayî. Ez derheqê beşê kirmanckî de naye vajî mi bi xo kirmanckî bi fekê/şîweya Dêrsimî qisey kerdene û embazê mi ra tayîne fekê Sêwregi, Çewlîg, Amed qisey kerdene. La ma qiseykerdîşê yewbînan ra fehm kerdene. Kes kesî ra nêvatene ê mi rast o ê to xelet o. Ma fehm kerdene ke ê ma perûne kî rast bî. Qet nêbo ma ganî nuştiş de berîme têduşt, o bîle ma rê bes o. Nika ma vîneme ke nuştiş de serre bi serre yeme têduşt. Heya kemasîyê ma perûnî esta. Kemasîya kamî çîn a ke. La nika derdê ma ganî halê ziwanê ma bo. Binusîme, biwanîme û qisey bikerîme. Xora ma peynî de gurayîşê xo ra netîce gênîme. Ewro ney meşte ma do qezencê nê gurayîşî fekê domananê xo de bivînê. Kam rast o kam çewt o nika çimê mi de no zaf muhîm nîyo. Ez bi xo vana ke meyle şima çi beno wa bibo binusê, fealîyetê xo yê kirmanckî biramnê.

Rastî û çewtîye rê domanê ma do qerar bidê. No qerar wa înan rê bimano. Embazê erjayeyî nika kêmasîya ziwanê ma, tena ma yîme. Zerrî ra xebitîyayene; kemasîya ziwanê ma tena no yo.

# Dewro Klasîk de Kitabê "Tarîxê Kurdan -II-"

ŞÎRKÛH AMEDÎ



**Mîrnameya Hekarîyan:**

Mîrnameya Hekarîyan bi terza Mesnewî û bi Fariskî nusîyaya. Eserî de 10.578 beyîtî û di vervateyî ke dima ra îlaweyê eserî bîyê, estê. Nustoxê eserî Temerxano Yazicî yo ke katibê Mîrê Hekarî Yahya El Kiramî bîyo. Vervateyo verên mergê Temerxanî ra hewt serrî dima, hetê merdimê ey Mîrza Mihemed Yazicî ra nusîyayo. Vervateyo dîyin zî hetê Muhammed Teyyarî ra ke tornêkê Temerxanî bîyo, 1914an de nusîyayo. Eserî de dewrê Mîr Êzdîn Şêrî (Îzzedîn Mucella) ra heta dewrê Mîr Silêmanî nusîyayo. Yanî ê mîran ke mabênê serranê 1300 û 1849an de Hekarî de mîrîtîye kerda, nusîyayê. Temerxan derheqê nuştişê kitabê xo de wina vano: "Ez pancas serrî ya. Sey Fîrdewsî û şaîranê bînan ê pîlan, mi zî nîyet kerdo ke tarîxê mîr û padîşahanê xo binusa. Çike padîşahê ma zî naye heq kenê. Mi bi nê nîyetî dest bi nê kitabî kerdo." Girîzgahî ra dima, eserî de behsê şerê mîyanê gedeyanê Mîr Zeynel Abîdînî, Zekerîya Xan Beg û Zahîd Begî beno. Serkewtişê Zekerîya Begî, bidestvistişê kelayanê Çelê û Bêtenûre û serebûtê hetanê serra 1639an na beşe de nusîyayê. Beşa ke hetê Mîrza Mihemed Yazicî ra nusîyaya de, heme mîr û begê Hekarî ke destpêk ra hetanê 1742an hukm kerdo ca genê. Eser hetê Mazhar Dûderî ra ameyo vînayîş. Nê eserî ser o cigêrayîşê Xalid Sadînî zî dewam kenê.

**Terceme-i Tevârîh-i Şeref Hân:**

Nuştoxê nê eserî Şem o. Şem, Koşka Hikumdarê Palî Yansûr Begî de katîb bîyo. Eser 1682an de bi Osmankî nusîyayo û îlaweyê Şerefnameyî bîyo. Şemî na xebate seba Yansûr Begî kerda, hêverî dest bi açarnayîşê Şerefnameyî kerdo; badê serebûtê mabênê serranê 1587 û 1682an zî îlawe kerdê. Şemî, badê seba mîrê Mîrdasîyan Mistefa Begî ke hikumdarê Gêlî bi, nûshayêko newe nuşto. Nê îlaweyê xo de, hetanê 1684an tarîxê Mîrdasîyan nuşto. Dr. Adnan Oktayî no açarnayîş kerdo babeta cigêrayîşê xo. (Weşanê Nûbiharî, 2016)

**Tarixu Kurdistan:**

No eser hetê Muhammed Efendî eş-Şehrezorî (m. 1667) ra nusîyayo û 1701an de çape bîyo. Kitan 540 rîpel o. Texmînan gore, bajarê Samerra Kitabxaneyê Askerîyyîn de yo.

**Tewarîxî Cedîdî Kurdistan/ Tarîxo Modern yê Kurdistanî**

Mele Mehmûdê Bazîdî (1797 – 1867) Şerefnameyê Şerefxanê Bîtlîsî açarnayo Kurdkî. Sewbîna zî Mele Mehmûdê Bazîdî mîyanê serranê 1857 û 18758an de kitabêk bi nameyê "Tewarîxî Cedîdî Kurdistan" nuşto. Labelê no esero ke hezar rîpelan ra yeno pê, hetanê nika peyda nêbîyo.

A.Jaba 30ê Adara 1867î de Îzmîr ra seba P. Lerchî mektubêk erşaweno Rusya. Na mektube de vervateyê "Tewarîxî Cedîdî Kurdistan" seba Fransizkî ameyo açarnayîş. 1997an de E. Î. Vasîlîyeva nê qismî Fransizkî ra açernena Kurdkî û weşanena. Jaba 13ê Hezîrana 1867an de mektubêk erşaweno Dorne û na mektuba xo de zî qala muhtewayê nê kitabî keno. Kitabê Tarîxo Modern yê Kurdistanî yewendes beşan ra yeno pê û nuştoxî serebûtê ke mabênê serranê 1785-1858an de Kurdistan de qewimîyayî, nuştê. A. Jaba 22ê Çeleyê 1881an de Justî rê mektubêk erşaweno û na mektube de beşa "Gewrê û Lawikê Aye" yê kitabê Mele Mehmûdê Bazîdî açarnaya Fransizkê. No açarnayîş 1881an de kovara Bullettin de l'Athenee Oriental (H.3/1881 r.145-158) de weşanîyayo.

**Tarîhu'l Neseb/ Tarîxê Mîranê Şêrwanî**

Salîh Begê Şêrwî ke mabênê serranê 1787 û 1821an de Şêrwan de hikumdarîye kerda, Tarîxê Mîranê Şêrwanî bi Erebkî nuşto. Eserî de vervateyêk, hewt beşî û netîceyêk ca gênê. Salîh Begî wexto kitabê xo nuşto, kitabanê tarîxî (Şerefname, Tarîxê Teberî, Cîhannuma) û tapuyan ra zî îstîfade kerdo. Şêrwanî 1200an de Misir ra yenê. Eserî de nê tarîxî ra hetanê dewrê Salîg Begî, serebûtê muhîmî nusîyayê. Sewbîna mucadeleyê mabênê mîranê Şêrwan, Botan, Hizan, Rojkan, Xerzan, Gurgul, Spayêrt, Mikis, Zirkan, Hezzo, Karkar û Axkîs zî nusîyayo. Kerem Soyluyî, no eser Erebkî ra açarnayo Kurmancî: 'Tarîxê Nesebê Şêrwanî/Tarîxê Mîranê Şêrwanî)', Enstîtuya Kurd a Îstanbulî, 2005.

**Tarîhî Ekrad:**

No eser hetê Nazîrî ra, 1882an de bi Fariskî nusîyayo. Eser 75 rîpelî yo û her rîpelî de zî nêzdîyê des rêzî estê. Nûshayo orjînal bajarê Qûmî yê Îranî de yo. Eser derheqê mucadeleyê xoserîye yê "Şêx Ubeydulahê Nehrî" de nusîyayo.

**Şuûn-i Kurdistan:**

Goreyê Îbnul Emîn Mehmut Kemalî ( Şaîrêko Tirk yê seserra 20.), Emîn Feyzî Begî bi Tirkî derheqê Tarîxê Babanîyan de "Şuûn-i Kurdistan" nuşto.

**Terîxa Caf:**

No eser hetê Kerîm Begê Cafî ra (1889-1949) nusîyayo û tede vervateyêk û 13 beşî estê. Eser bi Soranki nusîyayo. Nifûs û şerê Eşîra Cafî, Iraq û Îran de vilabîyayîşê înan û şerê ke tarîx de kerdî babetê nê kitabî yê. Dr. Hesen Cafî no eser 1995î de Bexda de çape kerdo.


**Hukmatê Kurdanê Ezîzîye:**

Celadet û Kamîran Elî Bedîrxan eserê "Edirne Sukutunun İç Yüzü" de qala nê eserî kenî û vanê do bêro weşanayîş. Heto bîn ra belgeyê xo estê ke no eser hetê Surreya û Kamîran Bedîrxanî ra nusîyayo; labelê ancîya zî no kitab hetanê ewro peyda nêbîyo. Bedîrxanî, hem Şerefname de hem zî hetanê seserra 19-20. bi nameyê Ezîzîyan derbaz benê.

**Tarixî Erdelan:**

Hetê Mah Şeref Xanim Kurdistanî (1804 – 1847) ra bi Fariskî nusîyayo. Nuştoxe, çîyo ke babî û mêrdeyê xo ra eşnawito, sey "Tarîxê Mîrîtîya Erdelanî" nuşto. Eserî de awanbîyayîş ra heta vilabîyayîşê mîrîtîye, nêzdîyê hezar serrî nusîyayo. Eser 1920an de hetê Nasir Azadpûrî ra Sîne de çape bîyo. 1990î de hetê E. Î. Vasîleva ra açarîyayo rûskî û weşanîyayo.

Kurmanckî ra çarnayox: Lewend Paliyîj



# Êzdî û serxwebûn-dewletbûna Kurdistanê



ESKERÊ BOYÎK



Herêma Kurdistanê, deshilatdariya wê û temamê gelê Kurd niha di pêvajoyeke pir dijwar re derbas dibin, wezîfeyeke dîrokî ya giran lê bi şeref û rûmet ketiye para wan.

Gelê Kurd îro berê xwe daye hukumdarên cihana bêwîjdan, cîranên dagirkerên zalim, ol û bawariyên bê rehm û bê amin azadiya xwe dixwaze, ku ew jî wek her gelekê cihanê, di welatê kal-bavê xwe, mala xwe de serbest bijî, zimanê xwe biaxive, ji vê xezeba dagerkiran a dewrana koletî, hebs û zindanên wan rizgar bibe, bi xwe pirsgirêka bext û qedera xwe çareser bike...

Gelê Kurd û welatê wan nû nîn in, nû pêş de nehatine, dîroka wan di dema Fariza, Byûzandyayê, Cuhiyan da dest pê dibe. Wê demê di derheqê gelek cîranên Kurdan û ev navên van dewletan ku Kurd îro nikarin xwe ji koletiya wan xilas bikin qet axaftin tune bû. Kurdan tim ji bo azadiya xwe şer kirine. Van sê-çar sedsalên dawiyê serhildanên Kurdan tim pey hev berdewan bûne. Ewropiyan ji bo berjewendiyên xwe,100 sal pêş de welatê Kurdan par-par kirin, kirine kole dane Tirk, Ereb, Eceman û iro jî nahêlin Kurd ji nîrê wan ê xezeb azad bibin.

Kurd ji esmanan nehatine vî erdî, bi hezaran salan ev erd, welat ê Kurdan bûye û gelê bi wî navî li ser vê erdnigariyê, bi van hidûdan jiyan kiriye. Bi hezaran salan dagerkir û olên deshilatdar çiqas xwestine li dewsa navê Kurdistanê navê xwe li ser vî welatî binivîsin jî heta roja îro ji kesî re li hev nehatiye û ez bawar im di pêşîrojê de jî wê bi kesî re li hev neyên.

Xwestina Kurdan xwezayî ye û weke zilekî biçûk jî zirara kesî tê de nîn e

Siyaseteke dijayetiyê ya ne paqij li dora vê xwesteka Kurdan a helal heye. Bi astengiyan, qirkirin û xirabkirina rewşa gelê Kurd, bi zilm û zorên nû, hebs û zindanên xezeb Kurdan ditirsînin. Ez bawer nakim hikumdariya Kurdan bitirsin û ji xwestina xwe paş de biçin, ji bo vê xezeba ku niha dewletên Tirk, Ereb û Ecem di Kurdistanê de dimeşînin wêdetir êdî dijwar e zilma ji wan zilmtir hebe.

Mixabin dijayetî him li derve û him jî di hindur de bi xurtî heye. Di derheqê wan dijayetiyan de pir hatiye nivîsandin û xeberdan.

Ez dixwazim di derheqa helwesta Êzdiyan a di derbarê serxwebûn-dewletbûna Kurdistanê da hinek fikran binivîsim.

Bi vê nivîsê xwesteka min nîn e ku bo hinek hukumdaran xweş bêm, an bibim berdevkê hinek grûbên êzdiyên hişk. Na, çiqas li min bê, ez ê yek rastiyê binivîsim, ew çiqas jî tehl be û li hinekan xweş neyê jî.

Kî çi bêje, nebêje Êzdi civakeke Kurdistanî ne, pareke gelê Kurd in, Kurdistan welatê wan û kal-bavê wan e, nikarin li hember vê biryara serxwebûn û dewletbûna welatê xwe bêxem û bêhelwest bimînin. Ji bo wê jî tiştekî ecêbmayînê nîne ku 90-92% êzdiyan rêfêrandûmê de dengê erênî bikar anîn û bawar kin temamê Kurdê Başûr ra pêşhengî kirin.

Di nava dewranan de vê civakê çiqas qirbir, zulm û zor, rev û bez dîtiye, "heftê û du" fermanên weke ya 3ê Tebaxê ya Şingalê jî dîtiye, nenihîrî destê hinek oldar, axa, beg, serokeşîrên Kurdên musulman jî li wê zulm û xwîna êzdiyan de hebûye, lê dîsa jî vê civakê xwe ji netewa xwe neqetandiye, xwe ji Kurdîtiya xwe der nedîtiye.

Rast gerek e bê gotin ku niha êzdî dudil in, amintî û baweriya wan, bi gelê wan nemaye. Giliyên min di derheqê wan kom û şexsiyetan de nîne yên hinek partiyên Kurdan ên dij û neyarên gelê Kurd ve girêdayî ne, giliyên min di derheqê civaka êzdiyên sade, evdên dilsax de ne.

Ji min re name dinivîsin, bi têlêfonê diaxivin, çawa dişînin:

"Dewleta Kurdan hebe, nebe çî mera ne, yek e tiştekî me tê nîne".

"Mamoste Esker, bila dewlet çêbe...ma qey paşê wê fermanên nû çênebin?"

"Pêşmerge hîştin çûn, xelkê Şengalê devê guran de destevala hiştin"...

"Tim ji devê hinek oldarên Kurdên misulman li dijî Êzdiyan agir dibare, TVyên Kurdan yên Başûr axavtinên wan bi firehî diweşînin, oldariya tûnd dixwaze jenosîdeke din jî bi ser Êzdiyan de bînin... lêbelê hikûmraniya heremê li hemberî wan oldaran bêdeng dimîne..."

"Di Kurdistanê de hukumdaran kengî qedir dane Êzdiyan ku dema dewlet çêbû bidin".

"Ka êzdîxanên Bakûr, Rojava, êzdiyên Serhedê?"

"Xêncî hinek peyvên vala yên rengkirî, me tiştekî pak di Kurdistana te de ji devê serok û rayedaran nebihîstiye",

" Ka li Şengaliyan bûn xwedî ku li me bibin xwedî", û tiştên din...

Evan tev rast in.

Baweriya wan nemaye. Aminya wan nemaye.

Di vê kêşeyê de sûcê rayedar û çînovnîkên heremê, rewşenbîr, oldar, mediyaya heremê pir e.

Di nava van sê salan de gelo nikaribûn hinek birînên êzdiyan derman bikin? Hinek jî bi dilê wan biaxiviyana. Xêncî êzdiyên "xwe" ji êzdiyên "din" re jî biketana diyalogê, fikira wan jî bipirsiyana, ew ji xwe dûr nexistana.

Ji sê salan zêdetir e ku Şingal bûye birîneke bi jan, derdekî kûr ketiye dilê hemû □zdiyên cihanê.

Hûn ji min çêtir dizanin çi hate serê Şingalê û ev pêvajo sê salan çawa derbas bû.

Sê sal derbas bûne êzdî ji wê derba giran nikarin bi ser xwe ve bên, nikarin, hesten xwe, êşa xwe, hêsirên xwe, giriyên xwe zevt bikin.

□zdî xeyîdîne. Xeyîdîne ji xwe, ku çima ji bo ewlekariya xwe nefikirîn, gumana parastina xwe nedane li ser xwe, neyarê dewr û zemanan hat, gihîşt ber deriyê wan, jiyana wan wêran kir, bi namûsa wan lîst, keç, bûk, zarok, dayik wan hêsîr bir, zilam kuştin, xeyîdîne ji serok, rêvebir, oldar, rewşenbîrên xwe ku di roja teng de bi wan re nebûn pêşîkar, rê nîşanî wan nedan, xeyîdîne, bigazin in ji rayedarên Herema Kurdistanê li hember bêxemiya wan li hindava êzdiyan û Şengalê de, bigazin in ji pêşmergeyan /hêza kîjana bawer dikirin/, dema neyarê hov êrişî wan kir ew neparastin, tirsiyan, destevala ew di nav xezeba hov de hiştin, ne li deynê xwe yê leşkerî, ne yê netewî, ne jî yê wîjdanî xwedî derneketin, xeyîdîne ji qedera xwe ya giran, ji dîroka xwe ya wêran û bi xwînê nivîsî, ku her 50-60 sal carekê wan liv ber karesateke malwêran dide sekinandin.

Ya herî bi êş ew bû ku vê carê ev zilm di dema deshilatdariya netewa wan; di ya Kurdan da pêk hat. □zdiyan ji vê yekê qet bawer nedikirin, di fikra kesî re derbas nedibû. Sedsala 21ê û komkujiya ewqas zilm? Vê yekê di nav êzdiyan da tifaq û yekîtiya gel wêran kir. Baweriya êzdiyan li hindava netewa wan de kuşt.

Di dema hukumraniya Kurdan, têrora herî mezin di goveka □reqê û Kurdistanê de, li gund û warê □zdiyan hat kirin.

Em van çendan jî bi bîrbînin: Bûyarên li Şêxanê, çîroka keça □zdî ku bû bela serê □zdiyan, 24 karkerên □zdî birin li ber derê mizgefta Mûsilê bi hovîtî kuştin, bûyarê Zaxoyê, qetliyama Gire Zêr û Siba Şêx Xidirê ya 14 Tebaxa 2007an û dawiyê jî ev xezeba Şingalê ya herî mezin.

Loma jî bawari nemaye ...

Baweriya □zidyan bi wan, bi axa kalbavê wan, serok, oldar, rêvabir, şêx û pîr û bi rewşenbîriya wan jî nemaye, bawer nakin, ji gotin û sozên kesî bawer nakin. Ji gund û şûnwarên xwe, ji axa pêşiyên xwe, ji goristanê kal û bavên xwe direvin, ji netewa xwe direvin, ji Kurden misulman direvin ji bo dewrana bi nave misulmanya birayê wan. Kurdên misulman jî tevî ereb, tirk û eceman ew qir kirine.

Kî di vî halî de wê baweriya xwe winda neke? Biguman û bêhêvî nebe?

Kî wê amîntiya xwe bi der û dorê bîne?

Di ser de jî Şingal niha destê hêzên Kurdî de bûye lîstok, ciyê meydana şerkariya siyasetê. Her yek dixwaze Şingal bibe malê wî, guhera "pezê" wî... Çima heremeke Kurdistanê ya din nebûye meydana şerkariya hêzan û çima Şingal?

Werin, em demekê xwe deynin şûna Êzdiyên, bêteref û bêalî bifikirin...

Bi ser wê zulmê de ji sê salan zêdetir derbas bûye hê jî pirsgirêkên Êzdiyan yên mirin –jiyanê, hebûn -nebûnê çareser nebûne. Guman û pilaneke esil bo pêşîroja Şingalê nîn e. Gelo Şingalê wek Êzdîxane wê bimîne yan ewê jî destê Êzdiyan here... Eger Kurdistan, gelê Kurd, rewşenbîriya Kurd îro jî li pişta Êzdiyan nesekine wê kî bisekine?

Hê tu pirsgirêk çareser nebûne... Yên wek kolê di nava xezeba DAIŞê de hê dinalin. Yên di bin çadirên naylon de tazîbirçî, bêhêvî rojên xwe dimeşînin, yên serê rê-dirbên ber bi Ewropayê ve nizanin ka wê bigihijine cî yan na... Malbat di rêya ber bi Ewropayê de di deryayan de difetisin..

Bi ku derê de herin, bi ku derê birevin, ku ji wî bextê reş xilasbin, ku sibê –dusibê ev malwêranî careke din dubare nebe?

Ez dizanim ku destê neyar û nexwazên Kurdan û Kurdên neyar di vê tirajêdiyê û di vê dutîretiyê de heye. Ev hemû di destê neyar û xêrnexwezan de bûne çek li dijî herêma Kurdistanê û Kurdayetî, Serxwebûn û Dewletbûnê. Ew bi mîdiya xwe ya zane û bi mirovên xwe yên hazirkirî û şe'reza nava komên êzdiyan da karekî aktîv dikin. "Rewşenbîrekî" Kurdên Başûr (Kurdê misulman), ku serokatiyê dezgehekeke Kurdewarî li Başûr dike, çend roj pêş ji min re dinivîse: "Tu çawa dikarî li aliyê referandûm û serxwebûnê bî? Şingal nakeve bîra te?"

Ev hal dilê min diêşîne

Lê tevî van hemûyan ez dizanim û bawer im ku Dewleta Kurdistanê ya destûrî û qanûnî, ya demokratîk a dûrî dogmên şerîetê wê rê li ber fermanên îslamê ya 1400 salan bigire, ewlekariya Êzdiyan wê bê garantîkirin û pirsgirêkên Êzdiyan wê çareser bibin, Êzdî jî wê wek hemû Kurdan xwe xwediyê Kurdistana xwe, dewleta xwe bibînin, tu cudatî wê tune be.

Van rojan destûra dewletê jî gerek e Kurdistana Başûr re hazir bibe.

Serxwebûn û dewletbûn jî divê bi destûrî hêviyên êzdiyan bînin sêrî, ku êzdî jî xwe weke xwediyê welatê xwe, dewleta xwe bibînin.

Xwestinên Êzdiyan ne tiştên dijwar in, xwestekên xwezayî ne, pirsên ewlekariyê ne: Bi kurtî êzdî dixwazin li ciyê bê sebeb "hinek" neyên wan qir nekin, cî û warê wan neşewitînin, hebûna wan talan nekin, zarokên wan nekujin û bi namûsa wan nelîzin...

Êzdî ji dewleta Kurdistanê, ji gelê xwe dixwazin:

-Ewlekariya xelkên Êzdî bê garantîkirin. Pirsgirêk ne bi soz, gotinan lê bi parlamênto, bi destûr-qanûnên dewletê bi beşdariya saziyên navnetewî bê garantîkirin.

-Rêvabirî û parastina Êzdîxanê divê bispêrin Êzdiyan, ku xwe biparêzin..

-Cudatî û propaganda cudaxweziyê di navbera olên Kurdistanî de bi destûrî-qanûnî bê qedexekirin. Şexsiyet û saziyên ku wê piropagandayê bikin, bi giranî bên cezakirin.

-Ola Êzdîtiyê wek oleke Mêzopotamî, Kurdistanî ya pîroz bi destûra dewletê, parlamêntê bê naskirin.

-Cihên Êzdiyan ên pîroz bikevin bin parastina dewletê.

-Êzdî wek hesabê xwe beşdarî rêveberî û parastina Dewleta Kurdistanê bibin.

-Ji bo hinek xisûsiyên vê civakê, mecal bên sazkirin bo perwerde, lêkolînên çandî, dîrokî û serbestiya derbaskirina mêrasîmên olî eyd-erefatên Êzdiyan.

-Mecal bên sazkirin ku Êzdiyên li cihanê bi welatê xwe Kurdistanê ve bên girêdan.

-Li Kurdistanê li dewsa perwerda olî perwerda esil bê bicihkirin.

-Dewlet û ol ji hev cuda bin.

Em bawer in, di dewleta Kurdî da Şêxan û Şingal bi hev re bibin parêzgeheke dewleta Kurdistana fêdêral a herî xweş, herî şên. Kurdên Êzdî wê ji cudatiyê, komkujî, qir û bira dewranan xilas bin. Êzdî wê xwe weke her Kurdekî, xwe weke xwediyên dewleta xwe bibînin.

Dewletbûna Kurdistanê wê xewn û xiyalên civaka êzdiyan ya dewrana miyaser bike.

Ez bawar im civaka Êzdî çawa di referandûmê de deynê xwe yê netewî pêkanî wê wisa jî wek mirovekî li SERXWEBÛN û DEWLETBÛNA welatê xwe xwedî derkeve.

Di vê roja êzdiyan a teng de gelê Kurd jî gerek e wek deynekî netewî ji xwe re hesab bike û li Êzdiyan, ÊZDÎXANÊ xwedî derkevin, birînên êzdiyan ên kur di demeke zû de derman bikin.

Ez bangî temamê civaka Êzdî dikim li ku bin û li ku derê bijîn xwedî li SERXWEBÛN û DEWLETBÛNA welatê xwe derkevin!

> Xwestekên Êzdiyan ne tiştên dijwar in, xwestekên xwezayî ne, pirsên ewlekariyê ne: Bi kurtî Êzdî dixwazin li ciyê bê sebeb "hinek" neyên wan qir nekin, cî û warê wan newitînin, hebûna wan talan nekin, zarokên wan nekujin û bi namûsa wan nelîzin...

# Êş, Binhiş, Lîbîdo û Xeyb



AHMED KANI

Romannûsiya Kurdî jî wek gelek karên nûjen ên Kurdan, gelek dereng dest bi bêşdariya karwanên wê rê kiriye. Wek her destpêkê, romanên destpêkê yên Kurdî jî lawaz û kêmber bûn. Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de li ser serencama romannûsiya Kurmancî rawestim û bi nirxandina romana Şener Özmen a bi navê "Xeyb"ê, balê bikişînim ser ceribandinên nû yên romanên ku binhiş/derhiş vedibêjin.

Digel gelek nîqaş û gengeşiyên ku li ser hene jî bi piranî romana Erebê Şemo ya bi navê "Şivanê Kurmanca" wek romana yekem a Kurmancî tê qebûl kirin. Ev roman romanek otobiyorafîk e an rasterast otobiyografiya Erebê Şemo ye, li ser vê mijarê jî gelek nirxandinên hêja hene. Di destpêka sedsala bîst û yekem de nîqaşa gelo ji romanên Kurdî re dikare roman bê gotin an na, dihat kirin. Hinek nivîskaran behsa bîra netewî ya Kurdan ku dê bi saya romana Kurdî bê avakirin, dikirin. Hinekan jî digot ti bîra netewî bi van romanên beredayî nayê avakirin.

Di nava van gengeşiyan de karên hêja jî dihatin kirin wek tezên master û doktorayê yên li ser wêje û romana Kurdî bi zimanên biyanî dihatin nivîsîn. Wek mînak Haşîm Ahmedzade li zanîngeha Uppsalayê, Emîn Abdulqadir li Exeterê û hin kesên din tezên xwe yên doktorayê li ser van mijaran kirin. Di dawiya sedsala bîstan de romannûsiya Kurmancî ket nava geşepêdaneke xweş. Di roja me ya îroyîn de bi tevî hemû astengî û pêşîlêgirtinan jî di qada wêje û romana Kurdî da hewildanên nivîsîna romana Kurmancî ya bi her cureyî tê dîtin.Wek mînak romana Şener Özmen a bi navê "Xeyb"ê jî yek ji wan hewildanan e. Gelek romanên ku bi soranî, bi tîpên aramî hatine nivîsîn jî bo Kurmancî têne latînîzekirin.

**Êş**

Dema meriv behsa êşê dike, yek ji wan kesên ku dê bê hişê meriv jî wek nivîskarê vê mijarê Şener Özmen e. Lewma di hejmara çaran a kovara Wêje û Rexneyê de hevpeyvînek kûr û dirêj bi wî re hatiye kirin. Meriv kare bibêje, nivîsîna romana ku êşê ji xwe re kiriye navend li nivîskarê Xeybê hatiye. Di hevoka yekem a romana Xeybê de, wiha hatiye nivîsîn: "Bêyî ku çîrokeke min hebe, sê ribên jiyana min bi kul û derdên bêwariyê fût çû." Divê meriv bi kurtiya vê hevokê nexape. Hevok çiqasî kurt e, ewqasî jî wateya wê zêde ye. Wek mînak di "kul û derdên bêwariyê" de felsefeyek kûr a êşê heye. Piştî vê hevoka kurt jî berevajiyê wê, hevokeke dirêj wek nîv rûpelî, rengê naveroka romanê ya ku ji lîbîdoyên binhişî pêk tê, der dibire. Nivîskar bi devê kesê yekem, serlehengê xwe, êşa takekesî û civakî dide berhev û wiha dinivîse: "Min ji xwe re got: 'Divê welatekî te hebe lawê min û ayidê te be, mirovin hene ji nêza dimirin, mirovin hene ji çikûsiyê, ên fena te jî reng e ji bêwariyê bimirin, tu nikarî heta dawiya emrê xwe bi çîrokên xelkê bijî...', erê, çîrokên xelkê, çîrokên Kurdan, xwe ne giştik ên min bûn? Min ji kengî ve hest bi êşên vî gelê bêsiûd ê têrbobelat kiribû wekî ku ew êşên han di heman demê de êşên min bin jî? Ev nexweşiya han kengî dest pê kiribû? Ma çima min tim û dayîm xwe di ser êşên vî gelî re pênase dikir, heçku ez tunebim?..."

**Binhiş, lîbîdo û Xeyb**

Ev romana ku ji çar paran (gelo dibe ku ev jî wek balkişandina ser çar parîbûna welatê nivîskar be?) pêk hatiye, bi piranî vegotina karakterê sereke, Kendal Cizreli (Cûdî Semager) ye. Di para yekem de, wek me li jorê nivîsî bi hevokên watedar dest pê kiribû û ev par bi pazdeh beşan hatiye nivîsîn.Dîsa di rûpela yekem de wiha nivîsiye: " ...û azweriya binûnavkirina şeytanê kor ê lîbîdoyê yê ku xwe di kûrahiyên hiş û hoşeyên min de telandibû, bûbû sedem ku ez vê rêya hat û nehatê bidim ber xwe, bêyî ku ez zanibim wekî ev rê, rêyeke rast e yan na." Bi vê hevokê meriv têdigihîje ku ev roman dikare wek derketina rêyeke dûr û dirêj jî bê nirxandin. Serlehengê romanê bi qasî vegotina pêwendiyên xwe yên seksê, pêwendiyên hevalên xwe jî vedibêje. Di vegotinên seksî yên hevalê xwe de bêhtir gumana derewkariya wan dide xwendevan. Di nava van beşan de ya balkêş beşa 4 an e ku çîroka Serleheng Kendal Cizreli bi çîroka Joseph Wanderkayî re pêwendîdar dike û çîroka Joseph Wanderkayî vedibêje. Di beşa dawîn a vê parê, beşa 15an de, ji Kendal re ji aliyê Cassiopeiayiyan ve tê gotin ku "Va em dikin te verêbikin, helbet em ê Gulperiya te şanî te nedin, tu dê henga kuştina xwe, jiyana xwe ya berî mirinê û ya piştî mirinê jî bibînî." (r.98)

Di para duyem de ku ji heşt beşan pêk hatiye, bi piranî derketiye rêyan. Geh diçe deryaçeya Hezarê, geh di xewnereşkan de bi balafirê diçe Stenbolê. Êdî em pê dihesin ku hevjîna Kendal Gulsîmayê terka wî kiriye. Di vê parê de Qedera ku hevala wî ya xortaniyê ye, navê xwe guhartiye, kiriye Gulperî lê rast tê. Kalê Derwêş ku bi qasî Kendal serlehengê romanê ye, di vê parê da dertê hember xwendevan. Romanê jî navê xwe yê Xeybê ji nepenîtiya Kalê Derwêş girtiye.

> Di destpêka sedsala bîst û yekem de nîqaşa 'gelo romana Kurdî heye/tune?' dihat kirin. Hinek nivîskaran behsa bîra netewî ya Kurdan ku dê bi saya romana Kurdî bê avakirin, dikirin. Hinekan jî digot ti bîra netewî bi van romanên beredayî nayê avakirin.




Meriv kare bibêje ku para sêyem bi tena serê xwe karibû bibûya roman. Di vê parê de rêwîtiya di xewnereşkan de gihîştiye lûtkeya vegotinê. Di beşa pêncan de li xwe mikurhatina şeytanbûna Kalê Derwêş û pêwendiyên wî bi Gulperiyê re balkêş in. Di beşa şeşan de navê romanê wiha derbas bûye. "Êmekî bi şûn de, deriyê cîhaneke din li min vebû, şewqa wê da nav çavên min, pariyekî tirsetirs bi pêş de çûm, dengek ji xeybê hat, got kerem bike bi pêş de were, min got tu kî yî, got ez im, xwedawenda Kurdan, min got ez çi xwedawendan nas nakim, tew a Kurdan, got va ji te re delîveyek, were, netirse, welê weha di wê derwazeya ripûronî re derbasî mezeleke ku binê wê bi ferşên kevir ên çilîqerqaş hatibû qerifandin, bûm." (r.220-221) Di beşa şazdehan da Nangfrosa keça Kalê Derwêş, bi navekî din Gulsîma, Kendal dikuje. Ji virê bi şûn da pêwendî bi dirêjkirina romanê namîne.

Di para çarem da bi awayî filaşbekê nivîskar, zaroktiya Kendal a ku bi devê Kendal jî daye gotin, "zaroktîya min tune bû..." nivîsiye. Ez jî dibêjim ji xeynî dirêjkirina romanê para çarem, li romanê tişkî zêde nekiriye.

Nasnavê Kendal ê Cûdî Semager bi jiyana wî ya bi biyaniyan re gelek li hev hatiye. Ji ber ku jiyana Kendal bi piranî li ser pêwendiyên wî bi kesên ji Cassîopeiayê re hatiye honandin. Meriv dibêje qey nivîskar, bi mînandina xewnereşkên xwe bi yên James Joyce re hinekî xwestiye hêla binheşiya romanê bi xwendevan re parve bike.

Perîzadeyên sor ên Erziromê:

# Perîbacayên Narmanê

MEHMET ALÎ AYDIN

Dema qala perîbacayan tê kirin Perîbacayên Nevşehirê tê bîra mirov. Her sal bi bernameyên Wezareta Çandiniyê bi hezaran geştiyarên Tirkiye û derveyî Tirkiyeyê diçin Nevşehîrê. Bi danasînên Wezareta Çandî yên taybet perîbacayên Nevşehirê êdî ji aliyê hemû cîhanê ve tên zanîn.

Bes di keviya Erziromê de ku Erziromî jî gelek pê nizanin Perîbacayên Sor ên Narmanê hene ku li seranserê cîhanê bê mînak in

Perîbacayên Sor ji aliyê Komîsyona Netewî ya UNESCO ya Tirkiyeyê ve di sala 2012an de di rêjeya 27an de kete nav Lîsteya Derbasdar a Mîrasên Cîhanê. Ev Perîbacayên Sor ku li keviya Erziromê dimînin dîtineke bêhempa didin mirov û ji ber rengên xwe jî ji hemû perîbacayên din cuda ne. Tekane yên dişibin van perîbacayan li Eyaleta Arîzona ya Amerîka hene.

Perîbacayên Narmanê ji 62 kîlometreçargoşe û 3 deştên cuda pêk tên. Heta niha baş nayên zanîn. Ji bo di raya cîhanê de bê nasîn divê danasînên taybet bên kirin. Ji bo ji aliyê geştiyaran ve jî bibe warekî xwedî cazibe divê veberhinandinên dewletê bên kirin.

**Çêbûna Perîbacayan**

Di çêbûna perîbacayan de faktorên sereke lehî û ba ne. Lê belê ji bo ev perîbaca pêk werin divê taybetmendiyeke axa wê hebe. Ev jî xweliya bi tufê ye. Axa bi tufê avê derbas nake, kils û xweliya kîlê tune be, kapasîteya girtina avê dê kêm be. Li Tirkiyeyê bi taybetî li Ürgüp, Nevşehir û deverên Avanosê tê dîtin û li deverên Erziromê jî heye.

Ev axa bi vî cûreyî ji quntarên çiyayan bi rêya lehî û bayê tên mehandin û yên ji tufê hişktir jî nayên mehandin û dimînin. Bi vî awayî yên ku tên mehandin bi şeklên xwe yên taybet dibin perîbaca.

> Perîbacayên Cîhanbeylî bi demê re bi kaşbûna deştê derketine holê. Beriya demekê ew dever daristanî bûn, bi tesîra erozyonê û ba û baranê perîbaca derketinê holê. Ev perîbacayên ku dişibin perîbacayên Kapadokyayê dema kes lê digerin dibêjin 'Evder Ürgüp e' gelo.

Ava lehiyê ku bi demê re axê ligel xwe kaş dike, ji quntarên dîk ji xwe re rê dibîne û di nav tatên hişk de derbas dibe û dibe sedema qetandina wan tatan. Ew alavên di bin wan tatan de ne bi hêsanî tên mehandin ji ber vê yekê jî dever berfireh dibe. Di encama ve qewirînê de jî deşt vedizele. Ev vezilîna li quntarê ye ligel kumikên li jor nayên hemandin şiklekî konîk derdixîne holê. Ew şiklên derdikevin holê parîbaca ne. Di çêbûna perîbacayan de ava baranê ji bayê gelekî bi hêztir e. Hemandina bayê ligel ava lehiyê gelekî kêm e. Sedema tesîra ava lehiyê jî ewê ku axa bi tufê avê derbas nake û di binê perîbacayan de nahêle hemandin çêbibe. Herwiha tunebûna nebatan jî tesîrê li vê yekê dike.

Dema mirov perîbacayan dinêre tişta derdikeve pêşberî mirov kumikê wan in. Li gor axê ev kumik gelekî hişk in û nayên hemandin di pêkhatina perîbacayan de xwedî roleke girîng in. Tatên hişk ên di serî de jî lahar û ignimbirit di xwe de dihewînin. Tatê ku di kumik de ye ji kombûnên tatan hişktir û zeximtir e. Ev rewş ji bo pêkhatina perîbacayan gava yekem derdixîne holê. Dîsa

## Perîbacayên din

Perîbacayên din, li herêma Kapadokya, Wan, Erzirom, Konya, Manîsa û Afyonê ne.

**WANADOKYA (Perîbacayên Wanê)**

Wanadokya li Gundê Yavuzlar ê navçeya Başkaleya Wanê dimînin. Ji ber ku çêbûna wan dişibin perîbacayên Kapadokyayê navê wê bûye Wanadokya.

**KULADOKYA (Perîbacayên Kula)**

Perîbacayên Kula li ser rêya İzmir-Ankarayê, dikevin kîlometreya 156an. Li gundê Burgazê yê navçeya Kulayê ye ku 16 km dûr dimîne. Perîbacayên Kula bi avahiya volkanîk pêk hatiye û bi tesîra erozyona baranê pêk hatiye.

**Perîbacayên Konyayê**

Perîbacayên Cîhanbeylî bi demê re bi kaşbûna deştê derketine holê. Beriya demekê ew dever daristanî bûn, bi tesîra erozyonê û ba û baranê perîbaca derketinê holê. Ev perîbacayên ku dişibin perîbacayên Kapadokyayê dema kes lê digerin dibêjin 'Evder Ürgüp e' gelo.

**Perîbacayên Afyonê**

Ji ber taybetmendiya jeolojîk a Afyonê, navçeyên Îhsaniye, Îscehisar, Bayat û Bolvadînê xwedî gelek cûre perîbacayên bi kumik û bê kumik in. Ji van perîbacayan a ku li navçeya Bolvadînê li çemê Minarelî li gor perîbacayên herêmên din bi cudahiyên xwe balê dikşînin ser xwe. Herwiha li quntara çiyayên Eyerlî ku di navbera Înpazarcik û Zozana Mekanê dikeve jî perîbacayên bi nêrîna xwe xwedî taybetmendiyeke cuda hene.

tatê di kumikan de ye emrê perîbacayan diyar dike. Yanê tişta emrê perîbacayan diyar dike tatê di kumikê wan de ye.

Çapên Perîbacayan diguherin.

Ev guherîna wan di navbera 1 metre û heta 15 metreyî ye. Eger çap ji metreyekî biçûk an jî ji 15 metreyî mezintir be wê demê perîbaca pêk nayên. Cûreyên cuda yên perîbacayan hene. Perîbacayên li Kapadokyayê ne bi erozyonê pêk hatine û di nava cûreyên perîbacayan de kumik, konî, stûnî, tatên tûj û bi karok in. Perîbaca herî zêde li Tirkiyeyê Avanos, Ürgüp, Üçhisarê, li deşta Soğanlı ya Kayserî û li der û dora bajeroka Çatê ya Nevşehirê tên dîtin.

Di nav cûreyên perîbacayan de yên herî cuda yên Erziromê ne. Perîbacayên Narman ên Erziromê bi kaşbûna axê û erozyonê derketine holê. Piştre jî bi erozyona bayê şiklê xwe yê herî dawî girtiye.

Perîbacayên Narmanê li gor lêkolînan beriya 2 – 3 milyon sal berê dest bi çêbûnê kirine. Perîbacayên Narmanê li navçeya Narmanê ya Erziromê ne. Him bi rengên xwe him jî bi nêrîna xwe ji perîbacayên din gelekî cuda ne. Bi taybetî jî bi rengên xwe yên sor dîtineke bêhempa didin.

Sedema rengê sor elementa hesin ê di axê de ye. Di korta Narmanê de kevirê qûmê Neojen, kevirê xîjik, kevirê milê û kanyonên li ser vê zeviyê ne. Rengê sor ê tortuyan jî ji sedema hesinê ku $Fe_2O_3$ oksîtî dibe ye.

**Derfetên mayînê**

Cihên herî nêzîk ji bo mayînê mala mamosteyan a li naçeyê ye. Ji bilî vê jî li navçeyê cihên ji bo mayînê otelên li navçeya Pasînî ne. Di navebra Pasînî û Narmanê de 60 km dûrahî heye.

•Mala Mamosteyan li Narmanê (0442 741 24 80)

•Pasinler Kale Hotel (0442 661 49 92)

•Mama Mamosteyan li Pasinê (0442 661 31 53)

Perîbacayên Narmanê li kû ne, çawa dikarin biçin?

Perîbacayên Narmanê 7 km dûrî navçeyê ne û dikevin Rojhilata Başûrê wê navçeyê. Nêzîkî gundê Yaniktaşê ne. Dikeve kêleka rêya Narman û Pasinê. Devereke 6300 hektarî di hundirê xwe de dihewîne. Ji ber ku li ser vê rêyê ye hatûçûna wê gelekî hêsan e. Narman a ku navçeya Erziromê ye 90 km ji navenda bajêr dûr e. Dikeve Rojhilata Bakurê Erziromê. Perîbacayên Narmanê jî bi qasî 7 km ji navçeyê dûr in. Ji bo mirov biçe perîbacayan divê bi rêya E 80ê Erzirom–Pasinî–Narmanê de hûn dikarin bi hêsanî biçin. Ji bo zanyariyên zêdetir hûn dikarin li nexşeyê binêrin.

> Ava lehiyê ku bi demê re axê ligel xwe kaş dike, ji quntarên dîk ji xwe re rê dibîne û di nav tatên hişk de derbas dibe û dibe sedema qetandina wan tatan. Ew alavên di bin wan tatan de ne bi hêsanî tên mehandin ji ber vê yekê jî dever berfireh dibe. Di encama ve qewirînê de jî deşt vedizele.

